



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstituya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

axa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

**Teza Lîsansa Bilind**

**ÇÎROKÊN KURDÎ LI GORÎ MOTÎF ÎNDEKSA**

**STITH THOMPSON**

**(BI NIMÛNEYÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED)**

Bünyamin DEMİR

13711004

**Mêrdîn – 2016**



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstituya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

axa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

**Teza Lîsansa Bilind**

**ÇÎROKÊN KURDÎ LI GORÎ MOTÎF ÎNDEKSA**

**STITH THOMPSON**

**(BI NIMÛNEYÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED)**

Bünyamin DEMİR

13711004

êwirmend

Hnd. Pwd. Ramazan PERTEV

**Mêrdîn – 2016**

## TÜRK YE'DE YA AYAN D LLER ENST TÜSÜ MÜDÜRLÜ Ü'NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü E itim ve Ö retim Yönetmeli ine göre hazırlamı oldu um “Çîrokên Kurdî Li gorî Motîf Îndeksa Stith Thompson – Bi Nimûneyên Çîrokên Mîrze Mihemed” adlı tezin tamamen kendi çalı mam oldu unu ve her alıntıya kaynak gösterdi imi taahhüt eder, tezimin ka ıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Ya ayan Diller Enstitüsü ar ivlerinde a a ıda belirtti im ko ullarda saklanmasına izin verdi imi onaylarım.

Lisansüstü E itim-Ö retim yönetmeli inin ilgili maddeleri uyarınca gere inin yapılmasını arz ederim.

Tezimin/Projemin tamamı her yerden eri ime açılabilir.

Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerle kelerinden eri ime açılabilir.

Tezimin/Projemin ..... yıl süreyle eri ime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için ba vuruda bulunmadı ım takdirde, tezimin/raporumun tamamı her yerden eri ime açılabilir.

**13.05.2016**

**Bünyamin DEM R**

JI BO RÊVEBERIYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI  
TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di axa Makezanista Ziman û Çandê de wekî Teza  
Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

(îmze)

Serok: Doc. Dr. Alk. Mustafa ASLAN

(Nasnavê Akademîk, Nav-Pa nav)

(îmze)

Endam: Hnd. Pwd. Ramazan PERTEV

(Nasnavê Akademîk, Nav-Pa nav)

(îmze)

Endam: Doc. Dr. Alk. Necat KESK N

(Nasnavê Akademîk, Nav-Pa nav)

(îmze)

Endam: Doc. Dr. Alk. Zahir ERTEK N

(Nasnavê Akademîk, Nav-Pa nav)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmze

Doc. Dr. Alk. Mustafa ÖZTÜRK

Wekîlê Rêveber Enstitûyê

(Mor)

## NAVEROK

<b>NAVEROK</b> .....	<b>I</b>
<b>PÊ GOTIN</b> .....	<b>IV</b>
<b>KURTE</b> .....	<b>VI</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>VII</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>IX</b>
<b>LÎSTEYA TABLOYAN</b> .....	<b>X</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>XI</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>
<b>BE A YEKEM</b> .....	<b>5</b>
<b>MOTÎF Û XEBATÊN LI SER MOTÎFAN</b> .....	<b>5</b>
1.1. Motîf Wekî Têgeh di Edebiyata Gelêrî de .....	6
1.2. Xebatên LiSer Motîfên Kurdî yên LiGorî Rêbaza Thompson .....	10
1.3. Xebatên Girîng ên Derbarê Motîf û Polînkirina Çîrokan de .....	12
1.3.1. Veselovsky û Pênaseya Motîfê .....	12
1.3.2. Polînkirina Tîpên Çîrokan a Anti Aarne û Stith Thompson.....	14
1.3.3. Vladimir Propp û Morfolojiya Çîrokan.....	17
1.3.4. Stith Thompson û Motîfên Çîrokan .....	24
1.3.5. Kataloga Tîpên Çîrokên Tirkî ya Eberhard-Boratav.....	25
<b>BE A DUYEM</b> .....	<b>28</b>
<b>ÎNDEKSA MOTÎFAN A EDEBIYATA GELÊRÎ (<i>THE MOTIF INDEX OF FOLK LITERATURE</i>)</b> .....	<b>28</b>
2.1. Danasîna Motîf Îndeksê.....	29
2.2. Sazkirina Motîf Îndeksê .....	35
2.3. Lîsteya Motîfan .....	35
<b>BE A SÊYEM</b> .....	<b>46</b>
<b>TETBÎQKIRINA MOTÎFÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED LI SER THE MOTIF INDEKS OF FOLK LITERATURE</b> .....	<b>46</b>

3.1.Tetbîqkirina Motîfan Li Ser The Motif Index of Folk Literature.....	47
A. MOTÎFÊN MÎTOLOJÎK .....	48
B. AJEL.....	49
C. QEDEXE .....	54
D. SÊHR.....	57
E. MIRÎ.....	64
F. DERASAYÎ.....	65
G. HÛT .....	70
H. EZMÛN .....	73
J. ZANE Û BALE .....	79
K. XAPANDIN .....	80
L. BERÊVAJÎBÛNA ÇARÊNÛSÊ .....	84
M. DIYARKIRINA DAHATÛYÊ.....	86
N. ANS Û BEXT.....	88
P. CIVAK .....	91
Q. XELAT Û CEZA.....	94
R. GIRTÎ Û FIRAR .....	97
S. ZILMÊN NEASAYÎ.....	99
T. ZAYEND .....	101
U. XWEZAYA JIYANÊ.....	104
V. AYÎN .....	105
W. TAYBETIYÊN KARAKTERÎ.....	106
X. PÊKENÎ.....	107
Z. KOMÊN MOTÎFAN ÊN CURBICUR .....	108
<b>ENCAM.....</b>	<b>113</b>
<b>ÇAVKANÎ.....</b>	<b>115</b>
<b>PEVEK 1.....</b>	<b>120</b>
<b>ÇÎROKÊN MÎRZE M HEMED.....</b>	<b>120</b>
1. ÇÎROKA YEKEMÎN .....	121
2. ÇÎROKA DUYEMÎN .....	156
3. ÇÎROKA SÊYEMÎN.....	170
4. ÇÎROKA ÇAREMÎN .....	181

5. ÇÎROKA PËNCEMÎN .....	187
6. Ç ROKA E EM N .....	194
7. ÇÎROKA HEFTEMÎN .....	200
8. ÇÎROKA HE TEMÎN .....	215
<b>PEVEK 2.....</b>	<b>224</b>
<b>SERENAVËN MOTÎF ÎNDEKSA STITH THOMPSON.....</b>	<b>224</b>



## PÊ GOTIN

Berî ku li Bakurê Kurdistanê enstîtuyên li ser çand û zimanê kurdî vebin, xebatên li ser folklorê kurdî bi piranî bi hewldanên exsî û bi awayê berhevkarîyê bi rê ve diçû. Hin xebatên ku li zanîngehên Tirkiyeyê hatine encamdan, ji etîka zanistî dûr in û folklorê kurdî wek a tirkî dihesibînin. Gava ku berhevkarî dikirin, keresteyên kurdî werdigêrandin tirkî û tezên xwe li ser dinivîsandin. Îro di ar îvên zanîngehên wek Atatürk û Fîratê bi dehan tezên wisa hene ku bi motîvasyonên îdeolojiya fermî ya dewletê hatine nivîsîn. Îro cihê kêfxwe iyê ye ku bi vebûna be ên li ser çand, edebiyat û zimanê kurdî wekî warên din ên kurdolojiyê di folklorê de jî xebatên akademîk û zanistî bi pê ketin. Me jî bi vê xebatê xwest ku kêma be jî zêdehiyekê li vê ge edanê bikin.

Me di vê xebata xwe de hewl da ku dewlemendiya çîrokên kurdî bi rêya motîfan derbixin holê. Ji bo vê yekê jî me çîrokên Mîrze Mihemed ji xwe re wekî nimûne girtin. Wekî tê zanîn xebatên bi vî awayî li gor rêbaza Stith Thompson a motîfan tên kirin. Stith Thompson rêbaza xwe li ser bîngeha hezaran çîrokên deverên curbicur ên dinyayê kiriye. Me jî ev çîrokên Mîrze Mihemed li gor vî rêbazê yek bi yek analîz kirin û motîfên di wan de tespît kirin. Bi vê jî me xwest nîrx û dewlemendiya çîrokên kurdî diyar bikin û xebateke xwerû kurdî di vî warî de encam bidin. Ji bo ku ji xebatkar û lêkolînerên siberojê re bibe çavkanî û rêxwe kerek, me hemûserenavên motîf îndeksa Stith Thompson wergerandin kurdî û wekî pêvek me di dawîya xebata xwe de bi cih kir.

Ez dixwazim spasîyên xwe yê taybet pê kê î ewirmendê xwe birêz Ramazan PERTEV bikim ku wî ji hîlbijartina mijara tezê heya qedandina nivîsina tezê her dem arîkarî, ewirmendî û pi tîgriya min kir. Ji ber pê niyaz û îrovêyên wan ên hêja, spasî endamê juriyê birêz Mustafa ASLAN, Necat KESK N û Zahir ERTEK N dikim. Ji bo arîkariya wan a wergerandinê spasî ehmus KURT û Hamdi KAYA dikim. Spasî hemkarê xwe Ümran ARAN, Mehmet İrin F L Z û Ferhat YILMAZ dikim ku wan di sererastkirina nivîsê de arîkariya min kirin. Herî dawî spasî mamosteyên xwe yê Polonî Joanna BOCHENSKA û Anna



KRASNOWOLSKA dikim ku dema ez li Polonyayê bûm, pê niyaz û iroveyên xwe ji min kêr nekirin.

**Bünyamin DEM R**

**Mêrdîn - 2016**



## KURTE

### ÇÎROKÊN KURDÎ LI GORÎ MOTÎF ÎNDEKSA STITH THOMPSON (BI NIMÛNEYÊN MÎRZE MIHEMED)

#### Bünyamin DEM R

Di qada folklorê de ji bo analîzkirin û polînkirina çîrokan çend rêbazên sereke hene. Di nav wan de rêbaza Stith Thompson a motîfan yek ji yên herî navdar û girîng e. Thompson di çîrokan de li motîfan digere û li gorî wî motîf, di çîrokê de be a herî biçûk e û xwedî qabîliyeta domdariyê ye. Thompson ji bo pêkanîna vê armanca xwe di xebata xwe ya bi navê *The Motif Index of Folk Literature* (Îndeksa Motîfên Edebiyata Gelêrî) de nêzî 45000 motîf kom kirine. Bi saya vê rêbaza Thompson, mirov dikare hêmanên hevpar ên çîrokan ligel hev derxe û çîrokan ba tir fam bike. Me jî di vê xebatê de xwest ku motîfên çîrokên kurdî li gorî motîf îndeksa Stith Thompson tesbît bikin û bi vî awayî hêmanên hevpar ên çîrokên kurdî ligel ên çîrokên çandên din derbixin holê. Ji ber ku ji aliyê hêmanên folklorîk ve çîrokên Mîrze Mihemed gelekî guncav bûn, me ew ji xwe re esas girtin.

Em di nav he t çîrokên Mîrze Mihemed de li motîfan geriyan ku hemû jîbi xebatên meydanî hatibûn berhevkin. Ew motîfên ku me di wan çîrokan de tesbît kirin, me di îndeksa motîfan a Stith Thompson de li gorî rêza wan bi cî kirin. Ji bilî bicîkirina motîfan, em bi gi tî li ser xebatên polînkirin û analîzkirina çîrokan jî sekinîn.

Di encama vê xebatê de, derdikeve holê ku çîrokên kurdî ji aliyê motîfan ve gelekî dewlemend in. Motîfên ku herî zêde peyda dibin jî sêhr, derasayî, ajel, jimar, ezmûn û hwd. in. Ev dewlemendbûn jî nî aneyeke hevpariya çîrokên kurdî ligel ên çandên din e. Yanî çîrokên kurdî û çîrokên çandên din ji gelek aliyan ve di ibin hev û dibe ku ji çavkaniyeke hevpar derketibin.

**Peyvên Sereke:** Motîf, Motîf Îndeksa Stith Thompson, motîfên kurdî, çîrok, çîrokên Mîrze Mihemed.

## ÖZET

### STITH THOMPSON'UN MOTİF İNDEKSİNE GÖRE KÜRT MASALLARINDA MOTİFLER

(MİRZE MIHEMED MASALLARI ÖRNEĞİ)

#### Bünyamin DEMİR

Masalların analizi ve sınıflandırılması için halk bilimi alanında Propp Yöntemi, Aarne'nin Tip Sınıflandırması ve Thompson'un Motif İndeksi gibi birkaç önemli yöntem vardır. Stith Thompson'un yöntemi bunlar arasında en çok öne çıkanlardan biridir. Thompson masalarda motif analizi yaparak motifi, masalın devamlılık kabiliyeti gösteren en küçük unsur olarak tanımlamıştır. Thompson bu amacını ve yöntemini geliştirmek için *The Motif Index Of Folk Literature* (Halk Edebiyatı Motif İndeksi) adlı eserinde yaklaşık 45000 motife yer vermiştir. Thompson'un bu yöntemi ile masalların ortak yanları motifler sayesinde ortaya konulabilir. Ayrıca motif çalışmaları masalların daha iyi anlaşılması için de gerekli bir çalışmadır. Biz de bu çalışmamızda Kürt masalları arasında önemli bir yeri olduğunu inandığımız Mîrze Mihemed masallarında yer alan motifleri Stith Thompson'un motif indeksine göre belirlemeye çalıştık. Bununla da Kürt masallarının, dünya masalları ile ortak yanlarını ortaya çıkarmayı amaçladık. Kürt masallarının içinden folklorik açıdan çalışmaya uygun bulduğumuz Mîrze Mihemed masallarını, çalışmamız açısından esas aldık.

Sahadan derlenen sekiz adet Mîrze Mihemed masalı üzerinde motif araştırması yaptığımız bu çalışmada, tespit ettiğimiz motifleri Stith Thompson'un motif indeksindeki sıralamasına göre teker teker dizdik. Bunun dışında çalışmamızla ilgili olarak masalların analizi ve sınıflandırılması çalışmalarından da bahsettik.

Çalışmamızdan elde ettiğimiz tespitlere göre, Kürt masalları halk edebiyatı motifleri açısından çok zengin masallardır. En çok görülen motifler ise: Sihir, olağanüstülükler, hayvanlar, formel sayılar, sınavlar vs.dir. Bu zenginlik ayrıca Kürt masallarının diğer dünya masalları ile olan ortaklığının da bir göstergesidir. Yani Kürt

masalları birçok yönden dünya masalları ile benzerlikler ta ımaktadırlar ve ortak bir kaynaktan çıkmı olabilirler.

**Anahtar Sözcükler:** Motif, Stith Thompson'un Motif ndeksi, kürt motifleri, masal, Mirze Mihemed masalları.



## ABSTRACT

### MOTIFS IN KURDISH TALES ACCORDING TO STITH THOMPSON'S MOTIF INDEX

#### (EXAMPLES OF MÎRZE MIHEMED FAIRY TALES)

#### BÜNYAM N DEM R

There are several important methods in the field of folklore for analysis and classification of the tales. Stith Thompson's method is one of the most prominent among them. By analyzing motif in tales, Thompson has described it as the smallest element of the tale that shows capability of continuity. To improve this aim and method Thompson has featured approximately 45,000 motifs in his work the *Motif-Index Of The Folk Literature* under favour of Thompson's this method common sides of tales can be demonstrated through the tale motifs. In addition, studying motifs is a necessary way to understand the tales better.

In this study we tried to determine the motifs take place in Kurdish tales according to Stith Thompson's motif index. In this way we aimed to reveal the common sides of the Kurdish tales and the tales of the world. In Kurdish tales we have grounded on Mîrze Mihemed's tales which we found suitable for our study in terms of folkloric. We made a motif research on Mirza Mihemed's eight tales compiled before. In this study, we drew up the motifs we identified one by one according to Stith Thompson's motif index. In addition we referred to analysis and classification of the tales

According to the data we got from our research , Kurdish tales are very rich in terms of folk literature motifs . The most common motifs: Magic, marvels, animals and formalistic numbers etc. This richness also indicates that Kurdish tales have common parts with tales of world . That is, Kurdish tales have similarities with the tales of the world in many ways and may have come from a common source.

**Key words:** motif, Motif Index of Stith Thompson, kurdish motifs, fairy tale, Mîrze Mihemed fairy tales

## LÎSTEYA TABLOYAN

<b>Tablo 1</b> : 7 Karakterên Propp.....	22
<b>Tablo 2</b> : Sazkirina Motîfan .....	31
<b>Tablo 3</b> : Jimareya motîfan li gorî be an.....	32
<b>Tablo 4</b> : Jimareya motîfan li gorî zayenda wan.....	33
<b>Tablo 5</b> : Bi nimûneyekê ni andana motifan di îndeksê de.....	34
<b>Tablo 6</b> : Nî andana motîfan di nav îndeksê de.....	46

## **KURTEBÊJE**

**MIFL.** : The Motif Index of Folk Literature

**AT** : Aarne-Thompson

**hwd.** : her wekî dî

**j.** : jimare

**r.** : rûpel

**vgz.** : veguhêzer

**wer.** : wergêr

**we .** : we anxane

**bnr.** : binerin

## DESTPÊK

Ev tez li ser danasîna *The Motif Indeks of Folk Literature*<sup>1</sup> (Îndeksa Motîfan a Edebiyata Gelêrî) û herwiha cîbîcîkirina wê ya li ser be eke çîrokên kurdî hatiye amadekirin.

Çîrok di nav vegotinên kurdî yê gelêrî de xwedî cihekî taybet in. Wekî her vegotineke gelêrî, ew jî di nava xwe de tradîsyonan diparêzin û wan bi xwe re derbasî nif ên dahatûyê dikin. Yanî em dikarin di deqên çîrokan de tradîsyon, adet, toreyên çanda xwe bibînin. Her çî motîf in, ew jî binemayên çîrokan in. Wate çîrok li ser pi ta motîfan ava dibin. Lewma ji bo xebatên li ser çîrokan vekolîna motîfan gelekî girîng e. Xebatên li ser çîrokan, karekî bingeîn e bofolklornasên kurd. Me jî bi vê baweriyê hewl da ku li gorî MIFLê motîfên di çîrokên kurdî de vekolin.

Qasî ku em dibînin di warê berhevkarî û tomarkariya çîrokên kurdî de gelek xebat hene. Lê belê digel ku çend berhevkerin û xebatên folklorî hebin jî, ji aliyê motîfan ve di qada kurdnasiyê de xebatên tekûz û berfireh nehatine kirin. Ev li gorî me kêmasiyeke pir mezin e. Bêguman, “berhevkerin” karekî pir girîng e lê divê xebatên zanistî jî li ser van çîrokan werin encamdan. Ji aliyekî din ve, di îndeksa Stith Thompson de jî motîfên hemû gelên cîhanê peyda dibin, lê motîfên kurdî di nav wan de peyda nabin. Ji ber van her du sedemên sereke, me biryar da ku ji aliyê motîfan ve li ser hin çîrokên kurdî bixebitin. Jixwe xebatên motîfan arîkariya me dikin ku em karibin çîrokan jî ba tir fêm bikin. Ev jî ji bo me sedemeke din bû.

Ev teza me jî li ser pirsê gelo ji aliyên motîfan ve hevpariyên çîrokên kurdî (çîrokên Mîrze Mihemed) bi yê dinyayê re hene an nînin û ev yek bi îndeksa Thompson çawa dikare were nî andan hatiye amadekirin.

Me ev xebata xwe li ser tehlîlkirina çîrokên Mîrze Mihemedli gorî rêbaza Stith Thompson kir. Ji ber ku dê pir tevlihev bûya û mimkûn jî nebû, me ev xebata xwe li ser hemû çîrokên kurdî nekir. Lê me tenê çîrokên Mîrze Mihemed (Mîrza

---

<sup>1</sup>Ji vir pê de dê wekî MIFL were nî andan.



Mihemed, Mîr Miheme) esas girtin ku ew li Kurdistanê pir berbelav in û di çanda kurdî de çîrokine pir girîng in. Me xebata xwe bi gi tî li ser he t çîrokan kiriye. He t çîrok ji bo xebatek wisa kêr were xuyakirin jî, ji ber ku du heb ji van çîrokan rêzeçîrok û her he t çîrok jî çîrokên rasteqîn bûn, me hêjayî xebatê dîtîn. Jixwe ji aliyê hêmanên folklorîk ve jî ev çîrok têra xwe tijî bûn. Berhevkirina çîrokan ji aliyê me ve nehatiye kirin. Me ev çîrok, ji projeyên mastira bêtez ên xwendekarên be a Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê girtin (Ku çu, 2013), (Temtek, 2013), (Yıldırım, 2013), ( zci, 2013). Mixabin çend çîrok hebûn ku çavkaniyên wan ne diyar bûn. Lewma me jî ew çîrok bêyî çavkanî nivîsîn.

Di warê akademîk de, ji bo polînkirin û berawirdkirina çîrokan çend rêbazên sereke hene. Rêbaza Propp, Îndeksa Tîpan a Aarne-Thompson û Îndeksa Motîfan a Stith Thompson, ên herî navdar in. Ev her sê rêbaz di bin bandora hev de mane û heta em dikarin bibêjin li ser hev ava bûne. Jixwe çiqasî ji hev cuda bin jî armanca wan hema hema yek e. Lêkolîner jî çîrokên di destê xwe de li gorî armancên xwe li ser van rêbazan tetbîq dikin. Me jî bi rêya çîrokên Mîrze Mihemed rêbaza Thompson a motîfan, li ser çîrokên kurdî tetbîq kir. Ji bo ku em karibin aliyên hevpar ên çîrokên kurdî digel çîrokên din ên dinyayê derxin holê, me ev rêbaz bikaranî. Herwiha xebateke wisa, ji ber xwe ve dibe polînkirineke hêmanên çîrokan jî. Ji bo ku em karibin çîrokan li gorî vê rêbazê tetbîq bikin, me pê î hemû motîfên di çîrokan de yek bi yek tespît kirin û ew motîf di îndeksa Thompson de bi cih kirin.

Armanca me ya sereke ev bû ku em bi rêya rêbaza Thompson nixê çîrokên kurdî ligel çîrokên din ên cîhanê nî an bidin. Herwiha di proseya nivîsîna tezê de çend armancên têkildar jî derketin holê. Jixwe Thompson bixwe jî ev rêbaza xwe li ser pa xaneyekê avakiribû. Ji bo ku em zanibin bê Thompson ev bingeha xwe ji ku girtiyê, em li ser wan xebatên girîng ku ew di bin bandora wan de maye jî sekînin. Ji bo ronîkirina wan me di be a yekem de agahî û raweyên teorîk ên girîng dan. Ji bilî vê jî ji bo ku di dahatûyê de ji bo folklorê kurdî karibe bibe mînak, em li ser nimûneyeke polînkirina çîrokan jî sekînin. Ew nimûne jî polînkirina çîrokên tirkî bû ku ji aliyê Eberhard û Boratav ve hatibû amadekirin.

Di nivîsîna teza xwe de em rastî çend arî eyan hatin:

- 1- Herwekî tê zanîn li ser vê mijarê û bi vê rêbazê xebat gelekî kê m in. Lewma diviyabû hemû ti t ji nû ve bihata amadekirin.
- 2- Wekî di gelek warên kurdnasiyê de, di vê mijarê de jî çavkaniyên kurdî kê m bûn.
- 3- Ji ber ku xebata resen bi îngilîzî bû û bi hezaran têgeh hebûn ku kurdiya wan tunebûn, pirsgirêka peydakirina peyv an jî derket holê. Di vê mijarê de heta ji destê me hat, me ji peyvên heyî sûd wergirtin. Yanî armanca me ya wisa nebû ku em peyv û têgehên nû çêbikin.

Ji bilî zêdebûna termên nû gelek gotinên mîna hev jî hebûn ku di kurdî de bêhtir bi heman gotinan tên gotin. Ev jî bûn sedema pirsgirêkeke din. Bonimûne, di îngilîzî de gotinên “giant, ogre, monster” ji bo te eya “mirov an ti tên pir mezin” tên bikaranîn. Lê di nava van gotinan de nuansên biçûk hene. Di kurdî de mixabin termên rûni tî yek bi yek ji bo van gotinan tunene. Di vir de jî heya ji me hat me ji bo her gotinê, bi kurdî peyveke cuda bikaranî.

- 4- Peydakirina motîfan ji nav îndekseke ewqas mezin, pirsgirêka demê derxist pê iya me. Heya ji me hat, me bi saya çend amûrên kompîterê xwest vê pirsgirêkê ji holê rakin. Lê wekî ku me di nav teze de jî behs kiriye, di nav 6 cildên îndeksê de ji 45000an zêdetir motîf hene û peydakirina motîfa jêder<sup>2</sup> demeke dirêj girt.

Ev xebat û vekolîna ku me li ser çîrokên Mîrze Mihemed ji aliyê motîfan ve kiriye ji destpêk, sê be ên sereke, metnên çîrokan, lîsteya serenavên îndeksa motîfan û encamekê pêk tê.

Di be a yekem de em li ser têgeha motîfê û xebatên li ser polînkirina çîrokan sekînin. Me têgeha motîfê ji gelek aliyan ve rave kir û heya ji me hat me çarçoveyeke wê ya folklorî danî. Ji bilî vê me xebatên motîfan ên li ser folklorê kurdî jî danasandin. Herwiha têkilî têgeha motîfê, em li ser xebatên polînkirina çîrokan bi awayekî kronolojîk sekînin. Me ev xebat û lêkolîner bi gi tî dan nasîn û têkilahiya wan a bi hev re jî me derxist holê.

Ji ber ku armanca xebata me tehlîlkirin û tetbîqkirina Çîrokên Mîrze Mihemed ya li gorî motîf îndeksa Stith Thompson bû, me di be a duyem de xebata

<sup>2</sup>Mebesta me ji “motîfa jêder” ew e ku di nav motîfên be a xwe de ya herî taybet e.

Stith Thompson a bi navê *Motif Index of Folk Literature* (Îndeksa Motîfên Edebiyata Gelêrî) da nasîn. Em bi gi tî li ser armancên nivîsîna wê, naveroka wê, plana wê sekînin. Ji ber ku ev berhem ne tenê pirtûkek e lê wekî rêbazeke polînkirinê ye jî, em li ser vê rêbazê û tetbîqkirina vê rêbazê ya di çîrokan de jî sekînin.

Be a sêyem, be a tetbîqkirina motîfên Çîrokên Mîrze Mihemed a li ser îndeksa motîfan e. Ev be li gorî sernavên be ên sereke yê motîfan ji 23 binbe an pêk tê. Di vê be ê de, me her motîfeke çîrokên Mîrze Mihemed di nav îndeksa motîfan de li gorî rêbaza Thompson bi cî kirin.

Du pêvekên pêwîst ku yek jê metnên çîrokan, a din jî lîsteya motîfan jî di nava tezê de cî digirin. Teza me bi encamekê û bi lîsteya çavkaniyan diqede.

**BE A YEKEM**

**MOTÎF Û XEBATÊN LI SER MOTÎFAN**



## 1.1.MOTÎFWEKÎ TÊGEH DI EDEB YATA GELÊRÎ DE

Têgeha “motîf”ê bi taybetî di edebiyat û folklorê de lê bi gi tî di hemû huneran de tê bikaranîn. Bêguman di her qadê de bi wateyek din tê bikaranîn. Gotina ‘motîf’ ji destpêka sedsala 19. pê de wekî têgeh hatiye bikaranîn. Pi tî ku Veselovsky di sala 1913an de motîf wekî têgeh pênase kiriye xebatên li ser ‘motîf’ an zêde bûne (bnr. Veselovsky,1913).

“Beriya Propp nûnerên nêrîna atomîstîk, motîf an babet wekî yekeya sereke ya çîrokê didîtin. Veselovsky jî motîf, ji teoriya xwe re xistibû bîngêh. Li gorî wî babet (plot) ji rêzkirina motîfan pêk tê û ew zêdebûna motîfên ku pir tî dubarekirin jî bi belavbûna wan ve girêdide. Pi tî wî Karl Spiess (1924), Friedrich Von Der Leyen (1925) û hin kesên din jî motîf wekî hêmana sereke yê çîrokê dîtine.” (Meletinski, 2016: 20).

Kesê ku li ser vê têgehê bi taybetî û berfireh xebitiye Stith Thompson e. Xebata wî bi navê ‘*The Motif Index of Folk-Literature*’ (Îndeksa Motîfên Edebiyata Gelêrî) li ser motîfan birêkûpêk û berfireh hatiye nivîsandin.

Em ê jî bi gi tî li ser wateya têgeha “motîf”ê di edebiyata gelêrî de bisekinin. Beriya ku raveyên xwe bikin em ê fikrên girîng ên derbarê motîf û pênaseya wê de bidin: Li gor ansîklopediyeke edebiyatê motîf:

“Be a ku di heman berhemê an jî di berhemên curbicur de bi cudatîyên biçûk tê dubarekirin.” (Edebiyat Ansiklopedisi, 1991: 216)

Li gorî Luthi, motîf xwedî hêza xwe parastinê ye di tradîsyonê de û be a herî biçûk a çîrok avakirinê ye (vgz. Sakao lu, 1980: 24).

Li gorî pênaseya Veselovsky motîf ew te eya vegotine ye ku nikare were parçekirin. Li gorî wî mijar jî ji rêzkirina motîfan pêk tê. Lê di vegotinekê de motîf berî mijarê jî tê (Mathuna, 2016:33).

Li gorî Shklovsky motîf, parçeya herî biçûk a vegotinê ye ku di nava xwe de pêdiviyên kevnar ên curbicur û feraseta asayî dihewîne. Ji ber ku ert û mercên pê veçûna mirovan a di demên kevnar de di ibîyan e hev, her çiqas ev motîf mimkûn

bû ku bi serê xwe jî peyde bibin, herwiha di heman demê de motîfên ku gelekî di ibin hev jî mimkûn bû ku derkevin holê. (Murphy, 2015: 30)

Li gorî Thompson jî motîf xwedî qabîliyeta domdariyê ye û be a herî biçûk a çîrokê ye. Ji bo pêwistiyên vê qabîliyetê motîf divê xwedî taybetîne balkê û derasayî be. Ji bo vê Thompson li ser sê be ên sereke disekine:

“Be a yekemîn kes in: xweda, ajelên derasayî, afirindeyên derasayî (sêhrbaz, dêw, perî, ferî te...) ûhw. Duyemîn ti tên ku li pa bûyeran de dimînin: e yayên derasayî, adetên ecêb, baweriyên ecêb ûhw. Ya sêyem jî bûyerên serbixwe ne.” (vgz. Sakao lu 1980: 24)

Li gorî Thompson hemû rêgezên di çîrokê de ne motîf in û ji bo ku hêmanek bikare bibe motîf divê xwedî taybetiyên cuda be. Bonimûne di çîrokekê de dayikbûn ne motîf e lê “dêmariya xayîn” ji ber ku wekî ti tekî nayê dîtîna tê hizirkirin motîf e. An jî dema ku em bibêjin “John cilê xwe li xwe kirin û çû bajêr.” tu motîfan nahewîne. Lê ku em bibêjin “Leheng kumê xwe nedîbariyê li xwe kir, li mafûra xwe ya efsûnî siwar bû û çû welatê rojhilatê rojê û rojavayê heyvê.” herî kêma çar motîfan dihewîne: kum, mafûr, rêwîtiya derasayî ya hewayî û welatê derasa.” (vgz. Garry û El-Shamy 2005: XV). Her çiqas Thompson ev îzah kiribe jî ji ber xumambûna têgehê yekeyên ku ne motîf in jî xistine nav berhema xwe *Motif Indeksê*.

Arvas di gotara xwe de bo têgeha motîfê raveyêke wisa kiriye:

“Motîf, îfadeyên qalipgirtî ne û mirov dikare wan ji aliyê naverok û binyadê ve binirxîne. Ew her çiqas têkilî hev jî bibin di kontekstên cuda de kirasê cuda li xwe dikin. Herwiha ew dubareya bûyerên rojane ne. Em dikarin vê bi nimûneya îndeksa dawîya pirtûkekê a keretir bikin. Bonimûne armanca sereke ya amadekirina îndeksa navên kes û cihên erdnîgarî û têgehan di dawîya pirtûkekê de ew e ku dema xwendevan li wê îndeksêbinerederbarê naveroka pirtûkê de bibe xwedî zanyarî. Yanî îndeksa pirtûkekê, kurteya wê ya di van gotinan de ve artî ye. Belê fonksiyona herî girîng û taybet a xebatên motîfan di folklorê de, a kerekirina babet û peyamên ve artî di motîfên berhemên gelêrî de ye” (Arvas, 2013: 221-2).

Her çiqas heman motîf di çandên curbicur de peyda bibin jî dibe ku wateyên pir cuda bidin. Dallapiccola (2002) vê fikrê wisa ênber dike:

“Bonimûne mar di mîtolojî û çîrokên gelek çandan de hene. Di cihutî û xirîstiyaniyê de mar sembola eytan e, lê li Hindistanê mar afirindeyeke pîroz e û ew xwedî roleke girîng e di folklor û efsaneyên Budîst, Jaina û Hindûyan de. Li ba urê Hindistanê bi taybetî jî li qeraxa rojava, di qurçikên bexçeyên gelek malan de perestgeh an rêla maran peyde dibin.” (Garry û El-Shamy 2005: XVII).

Ligel van pênase û raveyan em dikarin motîfan bi gi tî di bin sê be an de kom bikin:

- 1) Lehengên çîrokan: xweda, ajelên derasayî, afirendeyên eceb, dêw, cadû, ferî te, perî, mirov, zarokên bêguneh, demariyên xedar û hwd.
- 2) Mijarên di nava tevgeran de: heyberên sêhrî, kevne opên derasayî, baweriyên eceb û hwd.
- 3) Koma motîfan ku di nava xwe de gelek motîfan dihewîne û tenê ji bûyerekê pêk tê. (Seyido lu, 1975: 83)

Pi tî van agahiyên çend taybetiyên motîfan bi vî awayî em dikarin rêz bikin:

- 1) Motîf xwedî qabiliyeta domdariyê ne
- 2) Motîf be a herî biçûk a vegotinê ne, lewma nikarin werin parçekirin
- 3) Ji motîfan mijar pêk tên
- 4) Ti tî balkê û ecêb dikarin bibin motîf
- 5) Ew di nava xwe de wateyên ve artî dicivînin.
- 6) Di çandên curbicur de xwedî heman wate an di wateyan in.
- 7) Dibe ku bi serê xwe li deverên cuda an li devereke diyar peyda bûbin û belav bûbin.

Ji bilî van taybetiyên xwe motîf, di çanda devkî de xwedî taybetiya bîranînê ye. Yanî dengbêj an çîrokbêj çîrokên xwe li ser van motîfan ava dikin û deverên ku jibîrdikin bi van motîfan dadigirin. Motîf ji wan re wekî keviran in ku rêya xwe bi wan ava dikin. Aslan derbarê vê mijarê de wisa dibêje:

“Motîf di demên kevnar de ku hê nivîs nebû, ji bo vegotinên estetîk hêmanin bingehîn bûn. Ew ji bo çandan jî wekî parastin, embar an bîrek bûn ku dikaribûn wan

vegotinên estetîk wekî efsane, çîrok, destan û hwd. kûrtir bikin. Ev hêmanen bingehîn ku em ji wan re dikarin ‘qalip’ jî bibêjin di hemû çandan de xwedî heman fonksiyonê ne. Herwiha motîf her çiqas ji aliyê kûrkirina vegotinên estetîk ve navneteweyî bin jî ji aliyê simgekirinên taybet ê çandan ve jî netewî ne.”(vgz. Arvas, 2013: 220)

Ji bo lêkolînerên ku li ser berawirdkirina çandên curbicur dixebitin vekolîna li ser motîfan rêyeke girîng û balkê e. Carinan ev ramanên wekhev ku li deverên cuda yê dinyayê têne dîtin ji ber xwe ve û ne bi awayekî zanistî derdikevin holê. Carinan jî ev hevbe î dibe nî aneya jêderkeke hevpar. Ji bo pêkanîna vê armancê xebatên motîfan ji xebatên tîpan bikêrhatîtir in. Jixwe xebatên li ser tîpan ji aliyê erdnîgarî ve jî wekî yê motîfan berfireh nînin. Bonimûne polînkirina çîrokan li gorî tîpan a Aarne-Thompson tenê ji tîpên bijarte û yê pir têne dubarekirin pêk tê û tenê tîpên ku tenê di erdnîgariya ji Îrlanda heya Hindistanê tê de peyda dibin. Lêbelê çî motîfên dinyayê hebin ên ku Thompson tespît kirine di MIFL de peyda dibin. Ev jî dibe nî aneya girîngiya wê ji aliyê berawirdkirinê û li hember polînkirina li gorî tîpan derfeteke zanistîtir dide kesên ku bixwazin li ser çîrokan bixebitin.



## 1.2.XEBATÊN LI SER MOTÎFÊN KURDÎ YÊN LI GORÎ RÊBAZA THOMPSON

Di vê be ê de em ê xebatên li ser motifên kurdî û bi taybetî jî yên li gorî rêbaza Thompson hatine kirin, bidin nasîn. Em ê bi awayekî kronolojîk van xebatan rêz bikin.

Qasî ku me tespît kiriye cara yekem Yona Sabar di çîrokên kurdî de li ser motîfa li gorîrêbaza Thompson xebitiye. Sabar di xebata xwe ya bi navê “*Antolojiya Edebiyata Gelêrî a Cihûyên Kurdistanî*” de motifên wan çîrokên ku berhevkirine tespît kirine û di be eke xebata xwe de ew ligel tîpên çîrokan rêz kirine. Wî tenê motîf li gorî îndeksa Thompson rêz kirine lê nimûneyên wan motîfan nî an nedane. Motîfên ku di îndeksa Thompson de peyda nekirine jî li gorî îndeksa Dov Noy a motîfên çanda cihûyan nî an dane (Sabar, 1965).

Hikmettin Attî, di teza xwe ya mastirê ya bi navê “Lêkolîneke Zargotinî li ser Destana Mem û Zînê” de be ek ji bo motîfan veqetandiye. Ev be di bin 21 serenavan de dabe kiriye. Di her be ê de li ser motîfeke girîng, bi berfirehî hem ji aliyê zargotinî hem jî ji aliyê ku di destana Mem û Zînê de hatiye bikaranîn sekiniye. Bonimûne, be a “2.1 Xewn”ê xistiye du binbe , ew jî wekî “2.1.1 Di Zargotinê de Motîfa Xewnê” û “2.1.2 Di Mem û Zînê de Motîfa Xewnê” diyar kiriye. Ji bilî jimareya wan motîfan a li gorî MIFLÊ, raveya wan û mînakên wan ji destanê jî dane. (Attî, 2013)

Mehmet irin Filiz, di be eke teza xwe ya mastirê ya bi navê “Xebatek li ser Destana Dewrê ê Evdî” de, li ser motîfan sekiniye. Wî motîfên ku di destanê de peyda dibin, di bin 15 serenavan de dabe kirine. Ev serenav ne li gorî Thompson lê tenê li gorî motîfên girîng bi nav kirine. Bonimûne navê binbe ekê “Di Destana Dewrê ê Evdî de Motîfa Ajalê Alîkar (Hesp)” e. Lê dîsa jî wî di ravekirina motîfan de, jimareya motîfên ku tespît kirine li gorî îndeksa Thompson dane. Taybetiyeke din a vê xebatê îrovekirina motîfan e. Filiz di xebata xwe de ew motîfên ku dîtine bi gi tî îrove kirine, pa ê jî nimûneyên wan motîfan ji destana Dewrê ê Evdî dane (Filiz, 2014).

Hayrettin Kızıl û Veysel Tanrıkulu di gotara xwe ya bi navê “*Berawirdkirina çîroka Hedlîlik Bedlîlik a bi Kurdî bi Gur û Heft Karikan a Birayên Grimm re*” de xebatek berawirdî dîkin. Wan jî ev xebata xwe li gorî rêbaza Thompson a motîfan kiriye. Kızıl û Tanrıkulu, motîfên hevbe û ên ji hev cuda di her du çîrokan de tespît dîkin û wan berawird dîkin. Yanî ev xebata wan berawirdkirina du çîrokên cuda li gorî motîfan e (Kızıl û Tanrıkulu, 2015).

Ramazan Perteve, di jimareya sêyema kovara *Bingöl Üniversitesi - Ya ayan Diller Enstitüsü* de gotarak bi navê “*Xebateke Girîng di Dîroka Folklorê Kurdî de: Kemal Fewzî û Berhevkariya Çîrokên Kurdî*” nivîsiye. Di vê gotara xwe de Perteve, bi gi tî li ser Kemal Fewzî û du çîrokên ku wêberhevkirinê disekine. Herwiha wan her du çîrokan ji aliyên motîfan jî analîz dîke û di vê analîza xwe de rêbaza Thompson ji xwe re bîngeh digire (Perteve, 2016).

### 1.3.XEBATÊN GIRÎNG ÊN DERBARÊ MOTÎF Û POLÎNKIRINA ÇÎROKAN DE

#### 1.3.1. Veselovsky û Pênaseya Motîfê

Em ê di vê be ê de hewl bidin ku bi gi tî fikrên Veselovsky derbarê motîfê de bidin. Herwiha armanceke me ya din jî ew e ku em bandora wî ya li ser xebatên polînkirin û analîzkirina çîrokan jî vekolin. Ji ber ku:

“Theodor Benfey û Alexander Nikolayevich Veselovskyê, damezrênerê poetîkaya dîrokî a rusî, bawer dikirin ku gelek babet, çîrok ji Hindistanê bi rêya Bîzansê derbasî Avropa bûne. Lê Veselovsky bêhtir dixwest bizanibe gelo heman motîf dikare gelek caran bi serê xwe derkeve holê an na.” (Murphy, 2015: 29). Herwiha wan dixwest ku têkiliya di navbera babet(*plot*)<sup>3</sup> û motîfan de derxin holê.

Kesê ku yekem car li ser têgeha motîfê ji aliyên folklorî ve sekiniye Veselovsky e. Wî di pirtûka xwe bi navê *Poetika Syuzhetov* (Poetîkaya Dîrokî) ku di navbera salên 1897 û 1906an de amade kiriye û pi tî mirina wî di sala 1913an de hatiye we andin de li ser vê têgehê û nîqa ên derbarê wê û terma babetê bi awayekî zanistî sekiniye. Armanca wî di vê xebatê de nî andana binyada çîrokê û babetê û têkiliyên wan bi motîfan re bû (Mathuna, 2016: 33). Propp jî ji Veselovsky bandor girtiye û xebata xwe li ser bingeha wî amade kiriye. Yanî Propp jî bi awayekî binyadî çîrok analîz kirine.

Armanca sereke ya Veselovsky ew bû ku pîrsgirêka motîf û babetê ji hev veqetîne. Ji ber ku heya wî ev fikrên xwe a kere kirine jî “motîf” û “babet” dihat tevîhevkirin. Ji bilî vê armanceke Veselovsky ya polînkirina çîrokan li gorî motîfan tune bû. Jixwe li gorî wî çîrokek tenê ji motîfekê pêk naye lê ji rêzeke motîfan pêk tê. Propp jî vê raveyê dike û fikrên xwe wisa dibêje:

“Veselovsky derbarê taswîrkirina çîrokan de kêmtî t gotine lê ew ti tî tenê ku gotine jî pîr hêja ne. Ew çîrokê ji babetan bêhtir wekî sercema motîfan dibîne. Motîfekê dibê ku bi gelek babetan ve were girêdan. Babet guherbar in. Dema ku ez dibê “babet” qesta min ew tema ye ku ji motîfan hatiye avakirin. Babet karekî afirandin û

---

<sup>3</sup>Veselovsky têgeha ‘*plot*’ di wateya babet, tema, tîp de bikaranîbû. Me jî ji bo tevlihevî çênebe di vê nivîsê de ji bédela ‘*plot*’a Veselovsky têgeha ‘*babet*’ bikaranî.

hûnandinê ye. Yanî divê em vekolîna xwe ewil ne li ser babetan lê li ser motîfan bikin.” (Propp, 2008: 16)

Fikrên Veselovsky derbarê motîfan de bi gi tî em dikarin wisa kurte bikin: li gorî wî motîf ti ta sereke ye, babet a duyem e. Herwiha motîf yekeya herî basît a vegotinê ye û ev yeke nikarin werin parçekirin. Dibe ku motîf di serdemên pê î yên pê veçûna mirovan de bi tesadufî li deverên cuda bi serê xwe hatibin afirandin. Lê dibe ku ev motîf ji deverê barkiribin deverêke din jî.

Her çiqas Veselovsky pênaseya motîfê kiribe jî ev ne pênaseyek zelal e, lê opînerê wî Shklovsky pênasekirina motîfê û cudahiya navbera babetû motîfê zelaltir rave dike:

A) Ez bi têgeha motîfê yekeya herî basît a vegotinê qest dikim. Ewzarvekirinên xeyal û fikrên kevnar û xwestekên asayî yên têgîhanê ne. Ji ber lêçûn an wekhevîna van keresteyên ku di demên kevnar ên pê veçûna mirovahiyê de derketine holê, em dikarin bibêjin, motîf dibe ku ji hev dûr û her yek bi serê xwe peyda bûbe; lê dîsa jî dibe ku xwedî heman taybetmendiya bin û di heman demê de ava bûbin. Bi nimûneyên jêrîn em dikarin motîfan ênber bikin:

1. Efsaneyên jêderkê, kenê çav/rojê, nirxandina rojê(bira an mêr)/heyvê(xwi k an jin), mîten rojava û rojhilatê, mîten derbarê te eyên heyvê, tarîbûna heyv û rojê û hwd.
  2. Rew ên her rojî: revandina keçikekê (daweteke gelêrî), revandina ‘Rostan’(di nava çîrokan de) û hwd.
- B) Bi babetê qesta min tema ye. Ew jî ew rêzebûyer e ku ji motîfên curbicur hatiye avakirin. Bonimûne:
1. Çîrokên rojê û dayika wê (Efsaneyên Grekî û Malezyayî yên roja merivxwir).
  2. Çîrokên revandinê(Bremond, Landy û Pavel, 1995: 22).

Veselovsky babet ji motîfê tevlihevtir fikiriye lê di rastiyê de pênaseya wî ya motîfê tevlihevtir e. Di encamê de diyar e ku hê jî gelek lêçûn/wekhevî di navbera tema (babet) û motîfê de hene û gelek caran ji bedêla hev ve jî tînen bikaranîn. Lê ji ber ku Veselovsky cara yekem bi awayekî zanistî li ser vê mijarê sekiniye cihekî wî girîng di xebatên li ser motîf û vegotinan de heye. Gelek kesên ku pê yê wî re hatine xebatên xwe li ser bîngeha fikrên wî pê xistine.

### 1.3.2. Polînkirina Tîpên Çîrokan a Anti Aarne û Stith Thompson

Annti Amatus Aarne (1867 - 1925) li bajarê Pori, Fînlandiyayê ji dayik bûye. Ew agirtê Kaarle Krohnê ku lawê folklornas Julius Krohn bû. Wî rêbaza erdnîgarî-dîrokî a li ser folklora berawirdî ava kiriye. Herwiha beriya ku bibe “Pergala Polînkirina Çîrokan a Aarne-Thompson” polînkirina xwe ya çîrokan kiriye. Aarne ji sala 1911an heya mirina xwe ya di sala 1925an li Zanîngeha Helsinkî wekî mamoste, pi tî sala 1922an jî wekî ordînaryus xebitiye. (Wikipedia, Aanti Aarne: 2016)

Folklornasê fînî Antti Aarne, xebata xwe ya girîng a li ser polînkirina çîrokan bi navê *Verzeichnis der Märchentypen* (Îndeksa Tîpên Çîrokan) di sala 1910an de bi zimanê elmanî we and. Girîngiya vê xebatê ji navneteweyîbûn û rêkûpêkbûna wê tê. Wî xebata xwe li ser çîrokên fînî û danîmarkî (Berhevoka Grundtvig) û çîrokên almanî (Berhevoka Grimm) tetbîq kiriye û bi zimanê almanî amade kiriye (Luthi 1997: 70). Ji bilî van berhevokan Aarne çîrokin din jî xistine nav xebata xwe. Dîsa jî wî dizanîbû ku xebata wî hemû cîhanê nagire nav xwe ew tenê çîrokên Avrupa Bakur dicivîne. Wî ba dizanîbû di dahatûyê de ew ê berferetir bibe û ji ber vê jî gelek jimareyên tîpan vala hi tine. Her çiqas îndeksa wî ji 540 xalan pêk tê jî jimareya xalan digihe 1940î (Thompson 1946: 417). Pa î folklornas Stith Thompson jî kêmasîbûna vê tesnîfê dibîne û bi servekirinan xebata Aarne pê dixê û di sala 1928an de ji nû ve diwe îne. Pi tî vê lêzêdekirinê ew wekî *Polînkirina Aarne-Thompson* hatiye naskirin.

Ev xebata Aarne ji bo folklornasan bûye mînak û pi tî wî gelek kesan<sup>4</sup> xebatên wekî ya wî an xebatên li ser rêbaza wî kirine. Gelek lêkolîneran jî çîrokên welatên xwe li gorî rêbaza wî polînkirine û li ser wan xebitîne. Wekî ku Kiefer jî dibêje: “Gelek ji xebatên cidî yê çaryeka dawî ya vê sedsalê ku derbarê folklora berawirdî de ne, an li ser pê xistina xebata rêbaza Aarnê ne an jî bi wê re tîkildar in.” (Kiefer 1947:12).

Wekî ku me li jor jî behs kiribû Antti Aarne çîrok li gorî *tîpan* (*type*) polînkirine. Qesta wî ji tîgeha “tîpê”ne “tîpa”ku di be ên din ên zanistê de tê

---

<sup>4</sup>Uther Hans-Jörg(2004), IFA (Ar îva Çîrokên Israîlê), Eberhard-Boratav ( Îndeksa Tîpên Çîrokên Tirkî) û hwd.

zanîn e. Em bi kurtî dikarin bibêjin qesta wî ji “tîpê” kurtiya babeta çîrokê ye. Zanayên folklorê derheqê tîpê de çend rave kirine.

Stith Thompsonê hemkarê Aarne di xebata xwê bi navê *The Folktale* de têgeha tîpê wisa rave dike:

“Tîp (type), çîrokeke dêrîn e ku bi serê xwe xwedî qabiliyeteke hebûnê ye. Em dikarin vê jî bibêjin ku tîp vegotineke hevgerî ye û xwe naspêre çîrokeke din. Dibe ku ew digel çîrokeke din bê vegotin, lê rastiya ‘derketina holê’ ya bi tena serê xwe taybetiya serxwebûnê dide wê. Naxwe tîpên çîrokan metnên serbixwe yên çîrokê ne ku bi serê xwe dikare bijîn. Ew dikare ji yek an jî gelek motîfan pêk were.”(Thompson 1946: 415).

Dîsa di ferhengeke ansîklopedîk de têgeha “tîp”wisa tê pênasekirin:

“Ev têgeha ku ji aliyê xebatkarên edebiyata gelêrî ve tê bikaranîn tê wateya vegotina ku dikare di nav çandê de bi serê xwe hebe û xwedî qabiliyeta domdariyê be. Her yek çîroka serbixwe her çiqas tevlihev be an basît be jî wekî tîpekî tê dîtin. Hin tîp wekî yên çîrokên dirêj ên berhevoka Grimm dibe ku di nava xwe de gelek motîfan bihewînin lê pêkenok an jî çîrokên ajelan dibe ku tenê ji yek motîfê pêk werin. Naxwe di encamê de em dikarin bibêjin *tîp* û *motîf* di ibin hev heta wekî hev in. Ku birastî jî tîp vegotinên serbixwe bin wê demê a kere ye ku jimareke diyar a wan heye di hemû çandan de. An ku mirov dikare bibêje tespîtîkirina hemû tîpan mimkûn e” (Leach 1984: 1137).

Propp vê xebata Aarne pir serkeftî dibîne lê li gorî wî kêmasiyê wê jî hene. Li gorî Propp serkeftina herî mezin a Aarne rêzîkirina çîrokan a li gorî jimareyan e. Ji bilî wê jî binbe kirina li gorî cins, cure, bincureyan serkeftina Aarne ye û bêrî wî tu kesî wisa nekiribû.

“Aarne bi rastî jî polînkirineke zanistî nekiriye, lê fîhrîsta wî weke pirtûkeke serlêdanê bîkêrhatî ye û ji aliyê karanînê wê ve jî pir girîng e. Ligel vê di nava xwe de çend metirsiyan jî dihewîne. Derbarê cewhera mijarê de fikrên a dide. Di rastiya de polînkirineke teqez a çîrokan li gorî tîpan ne pêkan e û xebatên bi vî awayî herdem wekî xeyalekê dimînin. Herçend tîpên çîrokan hebin jî ew ne wekî polînkirina Antti Aarne ne. Lê ew tenê dikarin li gorî taybetiyên binyada çîrokên ku di ibin hev hebin. Ji ber nêzbûna mijaran û nepêkanbûna veqetîneke teqez di navberan wan de ev encam derdikeve holê: Dema ku em bixwazin metnekê bi tîpekê ve girêbidin em gelek çar nizanin kîjan jimarê

hilibijêrin. Gelekî caran ev hilibijartin ne li gorî ahengdariyeke teqez, lê li gorî hilibijartinekeleetexmînî ye” (Propp 2008:15).

Pi tî Aarne, Stith Thompson ev polînkirin bi lêzêdekirinan pê ve biriyê. Lê ev xebat ji Thompson hatiye xwestin ne ku wî xwestiyê bike. Pi tî ku Aarne polînkirina xwe we and, Krohnê mamosteyê wî dîtiye ku gelek çîrokên din hatine berhevkirin û divê ew xebat were revîzekirin. Lê ji ber ku Aarne wê demê wefat kiriye, Krohn ev kar ji Thompson xwestiyê. Wî ji ev xebat wergerandiye ingilîzî û li xebata ku tenê ji keresteyên Avrupa Bakur pêkhatibû, keresteyên Avrupa Ba ûr û Rojhilat, Brîtanîya û Hindistanê zêde kirine (Martin 1979:14).

Aarne di xebata xwe de çîrok di sê be ên sereke de tesnîf kiribûn: çîrokên ajelan, çîrokên eslî û pêkenok. Thompson pi tî lêzêdekirinên keresteyî du be ên din jî li tesnîfê zêde kirine. Yanî wî çîrok li gorî tîpên wan di pênc be an de tesnîf kirine: çîrokên ajelan, çîrokên eslî û pêkenok, çîrokên zincîreyî û çîrokên curbicur.

Aarne jî polînkirina xwe li gorî tîpan kiriye. Wî çîrokên xwe wisa polînkirine:

## **1. Çîrokên Ajelan: 1-299**

- 1-99 ajelên hov
- 100-149 ajelên hov û ajelên kedî
- 150-199 ajelên hov û mirov
- 200-219 ajelên kedî
- 220-249 çûk
- 250-274 masî
- 275-299 ajel û ti ten din

## **2. Çîrokên Eslî: 300-1199**

### **A. Çîrokên sêhrî: (300-749)**

- 300-399 reqîbên derasayî
- 400-459 nasên derasayî an sêhrî
- 460-499 peywira derasayî
- 500-559 arîkarê derasayî

- 560-649 alavên derasayî
- 650-699 zanîn an hêza derasayî
- 700-749 çîrokên din ên derasayî
  - B. Çîrokên efsaneyî (750-849)
  - C. Çîrokên bi awayê kurteçîrokan (850-999)
  - D. Çîrokên hûtên balê (1000-1199)

### 3. Pêkenok : 1200-1999

- 1200-1349 bêedebî
- 1350-1439 henekên derbarê kesên zewicandî
- 1440-1524 henekên ku lehenga wan sereke jin e
- 1525-1874 henekên ku lehengê wan sereke mêr e
  - 1525-1639 mêrê qurnaz
  - 1640-1674 ens û siûd
  - 1675-1724 bale
  - 1725-1874 henekên derbarê ke eyan
- 1875-1999 çîrokên derew û derewînan(Aarne, 2016)

#### 1.3.3. Vladimir Propp û Morfolojiya Çîrokan

Vladîmîr Yakovlevîç Propp (1895-1970), St. Petersbûrgê ji dayîk bûye. Li be a Fîlolojiya Elmanî û Rûsî Zanîngeha St. Petersbûrgê xwendiyê û mamostetiya wan zimanan kiriye. Di sala 1932yan de derbasî Zanîngeha Lenîngradê bûye û wî serokatiya be a folklorê kiriye.

“Rêbaza “Tehlîla Binyadgerî ya Çîrokan” a Propp di warê tehlîla çîrokan de gelek navdar e. Ev rêbaz wek “Rêbaza Morfolojîk” jî tê binavkirin. Propp lêkolînên xwe yê li ser çîrokan bi navê *Morfologiya Skazkî* (Te ezanista(Morfolojiya) Çîrokê) di sala 1928an de li Lenîngradê wekî pirtûk çap kiriye. Ev xebat hem xebatek tê eyî hem jî razberî ye” (Pertev, 2013-2014: 1).

Propp ev xebata xwe li ser 100 çîrokên derasayî yê rûsî ji berhevoka Afanasev kiriye. Wî ev çîrok li gorî taybetiyên wan ên binyadî analîz kirine û



hêmanên wan ên guherbar û neguherbar tespît kirine. Rêbaza xwe jî li ser van hêmanan ava kiriye.

Propp, di destpêka xebata xwe de kêmasiyên polînkirina çîrokan a li gorî motîf û tîpan dide nî andan. Ji ber ku gelek varyant û versiyonên çîrokan hene, mirov ne bi motîfan ne jî tîpan tesnîfeke serkeftî ya çîrokan nikare pêk bîne û divê xebateke nû derbarê tesnîfê de were kirin. Pi tî van nêrînên xwe Propp dest bi xebata xwe dike bo ku cihê wan tesnîfên din bigire. “Demekê motîf, tema û babet hebû. Pa î Vladimir Propp hat û her ti t guherand”(Bremond, Landy û Pavel 1995: 21). Yanî em dikarin bibêjin Propp di polînkirina çîrokan de ore ek pêk aniye. Wî hemû a iyên xebatên beriya xwe rexne kirine, kêmasiyên wan derxistine holê û bêtî ku van kêmasî û a iyan dubare bike rêbaza xwe ya binyadî ava kiriye.

Propp di çîrokê de li hêmanên ku nayên guherîn digere û li ser kirinên kesan disekine. Li gorî wî her çiqas kes werin guherîn jî tevger nayên guherîn. Ji ber vê jî dabe kirineke zanistî ya çîrokên derasayî li gorî tevgerên karakteran dikare were çêkirin. Di çîrokan de çiqas mijar û karakter werin guherîn jî fonksiyonên wan naguherin û mirov li gorî van fonksiyonan dikare vekolînan li ser çîrokan bike.

Herwiha Propp amaje bi wê jî dikir ku têtîliya çîrokan a ligel hev diyar bike. Bi vê jî dixwest nî an bide ku hemû çîrok li ser te eyekê hatine avakirin. Dündar vê anga têtî wisa rave dike:

“Propp jî li ser têtîliya çîrokekê ya ligel çîrokên din sekiniye. Li gorî nêrîna wî her çiqas çîrokên derasayî curbicur û pir reng bin jî di eslê xwe de ew ‘yektê eyî’ ne û xebata xwe li gorî vê anga têtî li ser çîrokên rûsî kiriye. Bi vê jî xwestiye ku yekeyên fonksiyonî derbixwe holê ku ew dikarin ji bo hezaran çîrokan bibin mînak. Herwiha li gorî Propp ev yekeyên fonksiyonî rêzikên neguherbar in ku têtî eya çîrokê saz dikin. Fonksiyon jî tevgera leheng e ku li gorî wateya di nava derçûna bûyerê de têtî diyarkirin.”(Dündar, 2002: 116).

Wekî ku Pertev jî behs dike, li gorî Propp, kok û dîroka çîrokê zêde ne girîng e. Yanî ne girîng e ku em bizanin ka çîrokek li kuderê, kengî û ji aliyê kîjan civakê ve hatiye afirandin û veguhastin (Pertev 2013-2014: 1). Lê Propp her çiqas dîroka

çîrokê girîng nedîtibe jî, li gorî wî bêyî lêgerîneke binyadî mirov nikare dîroka rasteqîn a çîrokê derbixe hole. Dündar ji wiha difikire:

“Ji bo lêkolîneke dîrokî ya çîrokê, beriya her ti tî divê lêkolîneke berfireh û birêkûpêk a binyadî li ser çîrokê were kirin. Yanî li gorî Propp bêyî ku lêkolîneke ba a morfolojîk bê kirin, mirov nikare lêkolîneke ba a dîrokî jî bike. Ji bo derxistina têkiliya çîrok û dîn, mît û dîrokê divê çîrok yek bi yek werin berawirdkirin. Ev yek jî girêdayî bi têkilkirina be ên sereke bi tevahiya çîrokê pêk tê” (Dündar, 2002: 116).

Rêbaza Propp li ser du bingehan ava bûye. Yek jê “fonksiyon”, ya din “rol” e. Li gorî wî fonksiyon perçeyên bingehe yê çîrokê ne. Di warê fonksiyonan de Propp giha tiye van encaman:

“1. Fonksiyonên kesan ji aliyê kê ve û çawa tên kirin bila bîn kirin, ew regezên neguherbar û dewamî yê çîrokê ne.

2. Di çîrokan de jimareyên fonksiyonan bisînor in.

3. Rêzbûna fonksiyonan her dem wekhev e.

4. Hemû çîrokên derasayî li gorî binyadên xwe aîdê tîpekê ne.

Jimareya fonksiyonên di çîrokan de sî û yek in û ji vê zêdetir nabin”(Propp, 2008: 24-26 ).

Propp di çîrokan de 31 fonksiyon tespît kirine. Dema ku ev fonksiyon li pêy hev tên rezkirin, tê dîtîn ku her fonksiyon bi ya berî xwe ve ji aliyê mantiqî û estetîkî ve girêdayî ye.

“Di çîrokan de fonksiyon ji cotên wekî “qedexe-binpêkirina qedexeyê”, “lêpîrsîn-berhevkirina agahiyên”, “pevçûn-serkeftin”, “karê zehmet-pêkanîna karê zehmet”, “ opandin-arîkarî(rizgarbûn)” û hwd. pêk tên. Tevgerên “xerabî, rêkirin, ketina tevgerê ji aliyê leheng ve û çûna wî” di komekê de tên civandin. Di dawiya çîrokê de jî “cezakirin û zewac” cih digire û wekî encameke asayî ya fonksiyonên din derdikeve holê” (Çıblak, 2005: 133).

Di çîrokekê de ne pêwîst e ku her 31 fonksiyon hebin lê rêza fonksiyona tu carî nayê guherîn.

Propp li gorî van çend qaîdeyan lîsteya fonksiyonan amade kiriye:

-Kurteya naveroka fonksiyonê

-Pênaseyeke bi yek peyvî ya fonksiyonê

-Nî aneyeke li gorî rewê.

31 fonksiyonên Propp ev in:

1. Kesek ji malê dûr dikeve. (Pênase: *dûrketin*, sembol  $\beta$ )
2. Leheng rastî qedexeyekê tê. (Pênase: *qedexekirin*, sembol )
3. Qedexe tê bînpêkirin. (Pênase: *bînpêkirina qedexeyê*, sembol )
4. Êrî ker dixwaze agahiyên bi dest bixe. (Pênase: *lêpirsîn*, sembol )
5. Êrî ker derheqê qurbanê xwe de agahiyên bi dest dixê. (Pênase: *berhevkirina agahiyên*, sembol )
6. Êrî ker ji bo ku qurbanê xwe an jî serweta wî dest bixe rêya xapandinê diceribîne. (Pênase: *xapandin*, sembol )
7. Qurbanê tê xapandin û bêhemdê xwe arîkariya dijminê xwe dike. (Pênase: *tevlîbûna tawanê*, sembol )
8. Êrî ker zîyanê dide yekî ji malbatê. (Pênase: *xerabî*, sembol A)

“Ev fonksiyon pir girîng e. Bi saya vê berdewamiya çîrokê tê. Her heft fonksiyonên pê î be a amadekariyê ya çîrokê pêk tînin. Rêzebûyer di be a xerabiyê de tevlihev dibe. Hemû çîrok bi xerabiyekê dest pê nakin. Destpêkirinên din jî hene. Ew çîrokên xwedî van destpêkan jî wekî çîrokên ku bi fonksiyona xerabiyê dest pê dikin, pê ve diçin û diqewimin” (Bars, 2014: 260).
- 8a. Kêmasiyeke yekî/yekê ji malbatê heye, yekî/yeka ji malbatê dixwaze ti tekî dest bixe. (Pênase: *kêmasî*, sembol )
9. Nûçeya xerabî an kêmaniyê belav dibe; bi daxwaz an jî bi fermanê serî li lehengê tê dayîn, lehengê tê rêkirin an jî izna çûyina wî tê dan. (Pênase: *navbeynkarî, dema derbasbûnê*, sembol B)
10. Leheng peywirê qabul dike an jî biryara destpêkirina tevgerê dike. (Pênase: *destpêkirina tevgera dijber*, sembol C )
11. Leheng ji mal vediqete. (Pênase: *çûyin*, sembol )

12. Leheng ji bo ku amûreke sêhrî an jî arîkarekî dest bixe rastî serboriyekê (ezmûn, lêpirsîn, êrî ...û hwd.) tê. (Pênase: *fonksiyona pê î ya bex îner*, sembol D )
13. Leheng ji bo tevgerên kesê ku wê di dahatûyê de bex ekê bidê (bex îner) bertekê nî an dide. (pênase: *berteka leheng*, sembol E)
14. Heybera efsûnî didin leheng. (pênase: *stendina heybera efsûnî*, sembol F)
15. Leheng digihînin cihê ku li wê heyberê digere, rêbertiyê jê re dikin an jî rê nî anî wî didin. (pênase: *rêwîtiya di navbera du qraliyetan de, rêwîtiya bi rêberekîre*, sembol G)
16. Leheng û êri kar di pevçûnekê de tên li dijî hev. (pênase: *pevçûn*, sembol H)
17. Leheng nî aneke taybet peyde dike. (pênase: *nî ana taybet*, sembol I)
18. Êri kar têk diçe. (pênase: *serkeftin*, sembol J)
19. Xerabiya ku di serî de pêk hatibû ji holê tê rakirin an jî kêmanî tê dabînkirin. (pênase: *dabînkirin*, sembol K)
20. Leheng vedigere. (pênase: *veger*, sembol )
21. Leheng tê opandin. (pênase: *opandin*, sembol Pr)
22. Diçin alikariya leheng. (pênase: *alîkarî*, sembol Rs)
- Gelek çîrok dema ku leheng ji kesên li pêy rizgar dibe, diqedin. Lê rew her dem ne wisa ye. Lehengê çîrokê carinan bi xerabiyên nû re rûbirû dimîne. Êrî ker careke din derdikeve holê, heybera ku leheng bi dest xistibû jê didize, wî dikûje û hwd. Xerabiya ku di nava rêzebûyerê de cih girtiye, carinan bi heman awayî carinan jî bi awayekî din dubare dibe. Ev jî dibe destpêkirina vegotîneke din. Her ti t wekî destpêkê ji nû ve dest pê dike. Yanî xerabiyek nû dibe sedema rêzebûyereke nû. (Bars, 2014: 261-262),
23. Leheng nasnameya xwe vedi êre vedigere welatê xwe an jî diçe welatekî din. (pênase: *nasnameya xwe ve artin û hatin*, sembol O)

24. Lehengekî derewîn anga tèn bêbinyad dike. (pênase: *anga tèn bêbintar*, sembol L)
25. Karekî dijwar ji bo leheng tê pê niyazkirin. (pênase: *karê dijwar*, sembol M)
26. Karê dijwar tê pêkanîn. (pênase: *pêkanîna karê dijwar*, sembol N)
27. Leheng tê naskirin. (pênase: *nasîn/nasbûn*, sembol Q)
28. Nasnameya rast ya lehengê derewîn, êrî kêr an jî xerab e kere dibe.(pênase: *e kerekirin*, sembol Ex)
29. Leheng dibe xwedî dirûvekî nû. (pênase: *dirûv guhertin*, sembol T)
30. Lehengê/a derewîn an jî êri kar tê cezakirin. (pênase: *cezakirin*, sembol U)
31. Leheng dizewice û diçe ser text. (pênase: *zewac*, sembol W<sub>0</sub>)”(Propp, 2008)

Dîsa li gorî Propp heft karakterên sereke van fonksiyonan pêk tînin û her yek ji wan karakteran di nav fonksiyonan de fonksiyonên li gorî xwe bi cih tînin.



**Tablo 1: 7 Karakterên Propp**

#### 1.3.4. Stith Thompson û Motîfên Çîrokan

Stith Thompson (1885 – 1976) folklornasekî Amerîkî bû. Ew li Bloomfield, Kentucky hatiye dinê. Lisansa xwe li Zanîngeha Wisconsinê qedandiyê. Mastira xwe li ser Edebiyata Ingilîzî li Zanîngeha California, Berkeley di sala 1912an qedandiyê. Pa ê di navbera sala 1912 û 1914an de li Zanîngeha Harvardê doktora xwe kiriye. (Wikipedia, Stith Thompson: 2016)

Pi tî doktorayê li Zanîngeha Teksasê wekî mamoste xebitiye. Ji wir jî wekî profesor derbasî be a ingilîzî ya Zanîngeha Indiana bûye. Wî gelek cureyên folklorê wekî stran, çîrok, gotinên pê iyan, zûgotinok, çîrçîrok û hwd. berhev kirine.

Thompson gelek pirtûk û gotar nivîsîne, werger kirine, arîkariya gelek xebatan kiriye. Lê bêguman ew bêhtir bi polînkirina xwe ya li gorî motîfan hatiye naskirin (Martin, 1979).

Çend xebatên wî yên girîng:

- 1- *The Folktale* (Çîroka Gelêrî)
- 2- *The Motif Index of Folk Literature* ( 6 Cild) ( Motîf Îndeksa Edebiyata Gelêrî)
- 3- *Aarne – Thompson The Types of Folktale* (Îndeksa Tîpên Çîrokan a Aarne-Thompson)
- 4- *The Indexes of Indic Tale* (Îndeksa Çîrokên Çermsoran)
- 5- *Folktales of the North American Indian* (Çîrokên Çermsorên Bakurê Amerîka)
- 6- *One Hundred Favorite Folktales* (Sed Çîrokên Bijarte)
- 7- *Our Heritage of Folk Literature* (Kelepora Me ya Edebiyata Gelêrî)

Em ê di be a *Motîf: Pênase û Çarçove* û *Motîf Îndeksa Stith Thompson* de bi berfirehî behsa terma motîfê û raveyên Thompson û xebatên wî bikin.

### 1.3.5. Kataloga Tîpên Çîrokên Tirkî ya Eberhard-Boratav

Di çarçoveya polînkirina çîrokan de xebateke din jî bi navê *Typen Türkischer Volksmarchen* (Tîpên Çîrokên Tirkî) e ku polînkirina çîrokan li gorî tîpên wan a li ser çîrokên tirkî ye. Ev xebat ji aliyê folklornasê elman William Eberhard û yê tirk Pertev Naili Boratav ve hatiye amadekirin.

Pertev Naili Boratav û William Eberhard hîn dema ku di Zanîngeha Ankara, Fakulteya Ziman, Dîrok û Erdnîgarî de dîxebitîn çîrokên tirkî berhev kirine. Pi tî ku her du jî derketine derveyî welêt, ew kêmasiya kataloga tîpan a çîrokên tirkî dîtine û biryar dane ku xebateke wiha pêk bînin. Wan ev xebata xwe li Elmanyayê, li bajarê Weisbaden, Stuttgartê di sala 1953an de we andine.

Her çiqas 2500 çîrok ji bo karekî wisa kêm bin jî wan xebata xwe bi vî awayî kirine. Eberhard bi xwe jî di destpêka berhema xwe de li ser vê kemasiyê û sedemên wê sekiniye.

Wekî ku Eberhard di destpêka xebatê de diyar dike ev xebat her çiqas li ser bingeha pergala ekola gelêrî ya finî jî hatibe avakirin yek û yek ew ne wekî hev in. Ji pergala finî qesta me polînkirina çîrokan a Aarne ye. Ev polînkirin bixwe jî di nava xwe de kêmasiya dihevine û herwiha di nava vê polînkirinê de tenê çîrokên avrupî û hindî hene; lê çîrokên tirkî wekî kereste di vir de cî negirtine. Lewra Eberhard û Boratav nikarîbûn xebata xwe teqez li ser a Aarne amade bikira. Jason û Schnitzler jî pabendî vê wiha dibêjin:

“Cînedana çîrokên tirkî di kataloga AT(Aarne-Thompson) a çapa yekem de sedema sereke ya amadekirina kataloga EB(Eberhard-Boratav) e. Eger rojavayiyên AT ne tenê ji bo çîrokên xwe amade bikira û çîrokên tirkî jî tevî çapa yekem bikira pêdivî bi kataloga EB nedima. Lê ji ber ku rojavayiyên tenê li gorî çanda xwe, yanî ji ber neteweperestiya xwe AT amade kirine; mecbûriyeta amadekirina EB derketiye holê.”( Jason û Schnitzler, 2000: 24).

Derbarê naveroka xebatê de Cafero lu kurteyêke ba dike:

“Pi tî destpêka xebatê çîrok li gorî tîpan hatine polînkirin û 374 tîp hatine tespît kirin. Ji bilî çîrokên ku berhev kirine, li ser wan çîrokên ji çandên evrupî tevî çanda tirkî bûne û herwiha 17 çîrokên gelêrî jî sekinîne. Çavkaniyên xebatên çîrokan û



îndeksa motîfan jî ji bo lêkolîneran wekî pêvek di dawiya xebatê de hatiye dayîn”  
(Cafero lu, 1953: 155).

Eberhard û Boratav ew tîpên ku tespît kirine di bin 23 serenavan de polîn kirine. Ev 23 serenav û jimarên tîpan ên di bin serenavan de ev in:

- A. Çîrokên Ajelan : 1-22
- B. Ajel-Mirov: 22-33
- C. Ajel an ruhek arîkariya mirov dike: 34-82
- D. Zewaca bi ruh an ajêl re: 83-109
- E. Jiyana bi ewliya û ruhên ba re: 10-122
- F. Desthilatdariya çarenûsê: 123-142
- G. Xewn: 143-145
- H. Jiyana bi ruhê xerab re: 146-168
- . Sêhrbaz: 169-184
- J. Keçika ku ji xwe re yarekî dibîne: 185-196
- K. Lawikê ku ji xwe re yareke dibîne: 197-222
- L. Keçika hêjar bi dewlemendekî re dizewice: 223-238
- M. Hesûdî û bêbextî: 239-255
- N. Lehengê biçûkxistî: 256-258
- O. Zinê û ji rê derxistin: 259-280
- P. Bûyer û karên ecêb: 281-289
- Q. Dozên ecêb: 290-301
- R. Çîrokên rasteqîn: 302-310
- S. Tesadufên ecêb: 311-316
- T. Çîrokên pêkenokî: 317-322
- U. Zilam û jinên bale û tiral
- V. Diz û dedektîf
- W. Fenekorê/a jîr, mêr an jina qesîs (Sakao lu, 2002: 57-58)

Wekî ku ji navê xebata wan jî tê femkirin, ev xebat li ser çîrokên tirkî ye. Di vê xebatê de ji bilî çîrokan û çend çîrokên gelêrî wekî ku Eberhard jî behs kiriye tu cureyên din ên vegotên gelêrî nehatine polînkirin.

Nehi tina valahiyan kêmasiyek din a vê katalogê ye. Aarne û Thompson dizanîbûn ku dibe tîpên nû werin dîtin û ji ber vê di kataloga xwe de di nava rêzan de

valahî ji bo tîpên nû hi tine. Her çiqas Eberhard û Boratav ev dizanîbûn jî wan ev kar nekirine. Ev jî ji bo karên dahatûyê arî eyan çêdike. Sakaoglu jî vê kemasî dipejirîne û pê niyara xwe jî dike:

“ Ji çî alî ve *Typen Türkischer Volksmarchen* dihate rexnekirin? Hema 378 tîp hatine rêzêkirin bêyî ku di navbera wan de valahî werin dayîn. Divê ev bihata kirin lewra dibe ku di dahatûyê de tîpên nû werin dîtin. Di nimûneyên ku beriya wê li Rojava hatine we andin ev valahî hatine dayîn. Li gorî me divê ev 378 tîp di navbera 999 jimareyan de hatiba parvekirin.” (Sakaoglu, 2010: 47-48)



**BE A DUYEM**

**ÎNDEKSA MOTÎFAN A EDEBIYATA GELÊRÎ (*THE  
MOTIF INDEX OF FOLK L TERATURE*)**



## 2.1. DANASÎNA MOTÎF ÎNDEKSÊ

Em ê di vê be ê de bi awayakî berfireh li ser xebata Stith Thompson bisekinin. *The Motif-Index of Folk Literature* (Îndeksa Motîfên Edebiyata Gelêrî) û *The Types of Folktale* (Îndeksa Tîpên Çîrokên) a Aarne-Thompson du xebatên herî girîng in ji bo folklornasên profesiyonel ku bixwazin li ser analîzê bixebitin. Wekî ku tê zanîn di van her du xebatan de jî navê Stith Thompson derbas dibe.

Thompson ev xebata xwe cara yekem di navbera 1932-36an de çap kiriye. Pa î tevî lêzêdekirinan û revîzekirinê di navbera 1955-58an de wekî 6 cild cara duyem çap kiriye.

Peggy Martinê ku li ser jîyan û xebatên Thompson xebitiye derbarê *Motif Indeksê* dewisa dibêje:

“*Motif Indeks* xebata herî girîng a Thompson e ku bi kêmasî çil salî li ser xebitiye. Ev we an e ku Thompson di gotarên xwe de herî zêde behsa wê kiriye. Thompson di bin karîgeriya lêçûnên navneteweyî yê motîfên folklorê de maye. *The Motif Index* listeyeke praktîkî ya motîfan e ku lêkolîner dikarin di xebatên xwe yê derbarê jêderk û belavbûna çîrokên de kar bin. Çawa biyolojîst pergaleke zanistî bi kar tînin, ev jî polînkirineke zanistî ye. Her çiqas berî vê jî çend xebatên mîna wê (von Hahn, J. Jacobs, Kohler) hebin jî wekî wê berfireh nînin” (Martin, 1976: 15-16).

Stith Thompson di destpêka cilda yekem a xebata xwe de behsa naverok, sedem û armanca nivîsîna wê dike. Ew xebatê xwe ji bo folklorê ti tekî pêwîst dibîne, ji ber ku keresteyên folklorê roj bi roj zêde dibin, divê bi awayekî werin polînkirin.

“Pêdiviya polînkirinekê berfireh a keresteyên hemû cureyên vegotinên çandî her diçe xwe bêhtir dide xuyakirin. Berhevokên gewre ên folklorê, dewlemendkirina wan ji aliyê xebatên karker û zanayên wê qadê ve roj bi roj berfirehtirbûn her diçe ke fkirina wan vegotinan zehmetir dikin. Armanca wê xebatê polînkirineke basît a mantiqî ye ji bo hêmanên edebiyata vegotinên gelêrî” (Thompson, 1955: 9-11).

Her çiqas berî wî çend karên polînkirinê hatibin encamdan jî, li gorî wî ew ne bes bû bo folklornasan. Karsdorp û yê din di vê mijarê de wiha dibêjin:

“Ew difikirî ku îndeksa tîpan a Antti Aarne ya ku berî wî hatibû kirin û pa î wî bi pê xistibû ji bo çîrokên derveyî Avrupa têr nedikir. Ji ber vê jî wî ev bar xist ser milê xwe û tesnifkirineke li gorî motîfan kir. Ev xabata xwe jî wekî berhem pê î di salên 1930î de û pi tre bi berfirehkirina wê di salên 1950î de bi navê *The Motif Index of Folk Literature we and*” (Karsdorp û yên din, 2015 : 37).

Thompson sedemaheerî girîng a amadekirina vê xebata xwe, wekî hêsankirina karên lêkolîneran dibîne. Herwiha dixwaze li ser vê mijara gewre û tevlihev rêzîkine hêsan peyde bike û li gorî van rêzîkan polînkirinekê bike.

Di vê xebatê de tenê motîf li gorî mijarên xwe hatine polînkirin. Ji ber tevliheviyên nû dernekevin, Thompson ji bilî vê nexwestiye ti tekî din bike:

“Ev kar hewildaneke ji bo polînkirinê ye. Dema ku min ev amade kir, min xwest bi rêzîkên basît pêdiviyên a kere bikim û ti tekî ku kêrî hemû kesî were amade bikim. Li gorî vê planê her çiqas carinan ti tin sedî sed rûneni tîbin jî, motîfên li ser mijarekê bi hev re hatin komkirin. Tu hewildanê tespîtîkirina bîngeha psîkolojîk a motîfan an nîrxên wan ên binyadî di nav vegotinan da nehatiye kirin. Min tenê xwest pergalekê ava bikim ku bi kêrî praktîzekirin û rêzîkirina çîrok û mîtan were” (Thompson, 1955:10).

Thompson ev xebata xwe ne tenê li ser çîrokan lê li ser hemû vegotinên gelêrî kiriye. Herwiha ne tenê ti tînan navdar ti tînan herêmî jî xistine nav xebata xwe.


“Çi nivîskî bin çî devkî bin hemû çîrokên di nava çandê de hene di vir de cî digirin. Çîrokên gelêrî, mît, efsane, fabl, romansên serdema navîn, pêkenok, çîrokên dîdaktîk û çanda herêmî hemû di nav xebatê de cih digirin. Ne girîng bû ku ew navdar an belavbûyî be tenê ku tînkîliya wê bi çandê re hebe û bi awayekî çandî hatibe afirandin min hemû vegotin bikaranîn” (Thompson, 1955:11)

Her çiqas hemû vegotinên gelêrî xistibin nav xebata xwe jî Thompson hinek ti tînan li derve hi tine. Lewra dê îndeksa wî pir mezin bûba û dîsa dê tevlihevî çêbûya.

“Me di nava xebatê de cih nedaye çend cureyên diyar ên folklorê. Heta ku di nav cureyên din ên vegotinên gelêrî de cih negirtibin, ez li ser xurafe, kevne opî, baweriyên olî, mamik û gotinên pê îyan nesekinîm. Min wisa nekiriba wê îndeks du caran ji halê heyî mezintir bibûya” (Thompson, 1955:11).

Di nava pênc cildên *MIFL* de ji çil û pênc hezaran zêdetir motîf hene. Wî ev motîfên xwe him ji çavkaniyên devkî him jî ji yên nivîskî girtine. Ev motîf bi awayekî rêkûpêk hatine polînkirin. Bîst û sê be ên sereke ji ‘A.Motîfên Mîtolojîk’ heya ‘Z.Komên Motîfan ên Curbicur’ li gorî rêza alfabetîk hatine rêzkerin. Lê çend tîpên wekî “I, O û Y” ji bo tevlihevî dernekevin bikarneanîne. Herwiha her be a sereke jî di nava xwe de hatiye dabe kirin. Bonimûne, di bin be a “D.Sêhr” de binbe ên wekî “D0-D699.Veguherîn” û “D800-D1699.Heyberên Sêhrî” hene ku ew jî di nava xwe de hatine dabe kirin. Bi tabloyekê em dikarin vê sazkerinê ba tir bibînin:






**Tablo 2: Sazkirina Motifan(Momfer.ml, 2016)**

Ji ber gewrebûn û pêvajoya dîrûdirêj a Motîf Îndeksê, Thompson nikarîbû xebata xwe li gorî planeke teqez amade bikira û bi pêvajoyê re te e daye xebata xwe. Carinan ti tin lê zede kirine carinan kêr kirine; carinan cihê serenavan guhertiye carinan jî serenavek xistiye bin du binbe an û hwd. Di dawiya xebatê de bîst û sê be ên sereke û gelek binbe ên wan derketine holê lê li gorî Thompson ev ne xebateke qediyayî ye û ji bo vê jî cihên vala ji bo pa bendan hi tine.

Em ê aniha bi çend tabloyan naveroka îndeksê bi tabloyan bidin nasîn.<sup>5</sup>



**Tablo 3: Jimareya motîfan li gorî be an**


Wekî ku ji tabloyê jî tê famkirin, herî zêde motîf di nav be ên ‘A. Motîfên Mîtolojîk’, ‘D.Sêhr’ û ‘F. Derasayî’ hene. Ji ber ku Thompson ne tenê li ser çîrokan lê ser mît û efsaneyan jî sekiniye, motîfên mîtolojîk zêde ne. Lê ew zêdebûna her du

<sup>5</sup> Ev tablo ji [www.momfer.ml](http://www.momfer.ml) hatine wergirtin.



be ên din ji taybetiyên çîrokan tê. Ji xwe taybetiya çîroka a derasayîbûnê e kere ye û bi gi tî di wan de sêhr peyda dibe.

Be ên ku herî kêrî motîf di wan de ne ‘L. Berevajîbûna Çarenûsê’, ‘U. Sirû ta Jîyanê’ û ‘W. Taybetmendiyên Karakterî’ ne.



**Tablo 4: Jimareya motîfan li gorî zayenda wan**

Dema ku em li tabloya jorîn binerin, em dikarin çend encaman jê derbixin. Jin bêhtir bi xapandinê hatiye têkildarkirin. Wekî din “motîfên zayendê” jî bêhtir li ser jinan in. Mêr bêhtir di bin be ên motîfên mîtolojîk, sêhr û derasayî tîn dîtin. Bi kurtasî em dikarin bibêjin: jin dixapînin, mêr jî derasayî ne.

## 2.2. Sazkirina Motîf Îndeksê

Her motîfek di nava îndeksê de bi vî awayî hatiye diyarkirin.

Nimûne:	D1302.1. <i>Bivîrê sêhrê sêhrê fer dike.</i> (Cf.D1206) Hindistan: Thompson-Balys.
<b>D1302.1.</b>	Jimareya motîfê di îndeksê de. Her ku motîf dikeve binbe eke din jimar bi (.) tê veqetandin.
<b>Bivîrê sêhrê sêhrê fer dike.</b>	Pênaseya motîfê.
<b>(Cf.D1206)</b>	Jimareya motîfa an motîfên manend an jî tên tevlihevkin
<b>Hindistan</b>	Welatê ku motîf lê bêhtir tê dîtin
<b>Thompson-Balys</b>	Berhevoka motîfê de

Tablo 5: Bi nimûneyekê ni andana motîfan di îndeksê de

## 2.3. LÎSTEYA MOTÎFAN<sup>6</sup>

Thompson motîfên ku kom kirine bi rêkûpêk xistine bin be an. Thompson, ji bo tevlihevî çênebe ji bo her komeke motîfan tîpeke alfabeyê bi kar aniye. Ji ber ku hin tîpan dikarîbûn tevliheviyeke nû derxin holê, hin tîpên bi rêzê naçin jî hene. Li jêr me hewl da derbarê her be a sereke ya motîfan de agahîne kurt bidin û mînaeke taybet ji nav îndeksê jî pê ve bikin.

### A. Motîfên Mîtolojîk

Motîfên ku di bin tîpa Ayê de hatine komkirin derbarê sirû ta xwedayan û gerdûnê, jêderka mirovan, pergala jiyana û civaka mirovên kevna de ne. Herwiha motîfên derbarê destpêka jîyanê, afirandin û sazkirina dinyaya ajel û nebatan de jî di vê be de cih digirin.

### A0-A99. Afirîner

<sup>6</sup> Di amadekirina vê be de bi gi tî ji Thompson (1955) û ji malpera ([https://www.ualberta.ca/~urban/Projects/English/Content/Motif\\_Help.htm](https://www.ualberta.ca/~urban/Projects/English/Content/Motif_Help.htm)) sîd hatiye wergirtin ku ev malper ji bo danasîna MIFLê ye.

A10. Xwezaya afirîner

A13. Afirînerên ajal

A13.2 Afirînerên balinde

A13.2.1. Eyloyê afirîner

## **B. Ajel**

Ji bilî jêderka ajalên kevnar ên ku di bin be a motîfên mîtolojîk de ne, hemû motîfên derbarê ajelan di bin vê tîpê de hatine komkirin. Di bin vê be ê de em motîfên derbarê ajalên axêver, marên girse, ajalên sêhrî û ajalên arîkarê mirovên di serpêhatiyê de dibînin. Zewaca ajelan bi mirovan re, qraliyetên ajelan û fanteziyên din ên ecêb derbarê ajelan de jî di bin vê be ê de cih digirin.

### **B100-B199. Ajelên sêhrî**

B180. Ajelên çarlingî yên sêhrî

B184. Ajelên simdar ên çarlingî yên sêhrî

B184.1. Hespê sêhrî

B184.1.3. Hespê sêhrî yê ji dinyaya avî

## **C. Qedexe**

Di vê be a motîfan de ti tên qedexekirî hene. Ne tenê ti tên ku di çîrokeke diyar de lê ti tên ku di civakê de jî qedexe di nav van motîfan de cih digirin. Di nav vê be ê de nimûneyên wekî qotiya pandora ku vekirina wê qedexe ye, ketina mezela qedexe, destavêtina ti tên qedexekirî û encamên bînpêkirina van qedexeyan hene. Herwiha pêdîviyên mîsoger jî di vir de peyde dibin.

### **C100-C199. Qedexeyên cînsî**

C160. Qedexeya derbarê zewacê de

C162. Qedexeya zewaca bi kesekî/a diyar re

C162.1. Qedexeya zewaca bi banûya nijadekî diyar re

C162.1.1. Qedexeya zewaca periyê bi kesekî

fanî re

## **D. Sêhr**

Ji ber ku sêhr di nav çîrok û mîtan de gelek berbelav e, bêhtirîn motîf di bin vê be ê de hene. Ji xwe ji bo navê çîrokan di hinek zimanan de terma ‘çîrokên sêhrî’ jî tê bikaranîn. Veguherînên sêhrî, heyberên sêhrî, hêzên sêhrî di nav vê be ê de cih digirin.

### **D800-D1699. Heyberên sêhrî**

D1300-D1599. Fonksiyonên heyberên sêhrî

D1300. Heybera sêhrî zanatiya derxwezayî dide

D.1300.1. ewqe zanatiya sêhrî dide

## **E. Mirî**

Di nav edebiyata gelêrî de pêrew û xeyalet hêmanine gelekî berbelav in. Di bin vê be a motîfan E'yê de pênaseya wan, dirûvê wan û tevgerên wan cih digirin. Ji bilî van di bin vê be ê de em dikarin bibînin bê çawa mirî vedijin. Her wiha em dikarin derbarê baweriyên xwezaya ruh û baweriyên koçkirina ruhan de jî ti tan bibînin.

### **E0-E199. Vejandin**

E64. Vejandina bi heybera sêhrî

E64.3. Vejandina bi zingila sêhrî

E64.3.1. Vejandina bi zingila kesê pîroz

## **F. Derasayî**

Ev be a motîfan (F.Derasayî) gelek caran bi be a E.Sêhr re tê tevlihevkirin. Her çiqas ev her du be gelekî di ibin hev jî hin cudahiyên wan hene. Ya yekem sêhr ne ti tekî xwezayî ye. Ji ber vê ti tine ecêb lê xwezayî wekî lehengekî xwedî hêzeke derasayî di bin be a F.Derasayî de cih digire. Lê ku lehengekî hêjar bi saya karanîna gustîlkekê bibe xwedî hêzeke derasa, ev ê di bin be a D. Sêhr de cih bigire. Ya duyem jî ji bo sêhrê divê tevgereke diyar û bixwestin hebe. Ji ber vê her çiqas em periyên wekî ti tekî xwezayî nabînin jî ew bêhtir di bin be a F.Derasayî de hatine polînkirin lê ne di bin be a E.Sêhrê de. Ji ber ku ew ji ber xwe ve hene, ne ku bi tevgera leheng an kesên xerab derdikevin holê jî sedemeke din e. Ji bilî periyên ruh, pêrew û eytan jî di vir de cih digirin. Deverên derasayî wekî kelehên di nav behrê de, kes û bûyerên derasayî jî di vir de peyde dibin. Di bin vê be ê de herwiha em baweriyên derbarê dinyayên din (dojeh, perîstan...) û rêwîtiyên wan jî dibînin.

### **F0 – F199. Rêwîtiyên dinyayên din**

F0. Rêwîtiya dinyaya din

F10 – F79. Dinyaya jorîn

F10. Rêwîtiya dinyaya jorîn

F10.1. Vegera ji dinyaya jorîn

## **G. Hût**

Thompson terma ‘hût’ ne tenê ji bo forma ‘hût’ lê bi gi tî ji bo formên cinawir an dêwan bi kar aniye. Ji ber vê em di bin vê be ê de agahiyan li ser merivxwir, merivxwirî, cadû, dêw, hûtan jî dibînin.

### **G10– G399. Cûreyên dêwan**

G10– G99. Merivxwir û merivxwirî

G10– G49. Merivxwiriya domdar

G10. Merivxwirî

G11. Cureyê merivxwiran

G11.4. Ava merivxwir

## **H. Ezmûn**

Ji ber ku ezmûn/test di folklorê de gelekî peyde dibin ev be cihekî mezin digire di nav îndeksa motîfan de. Mamik, ezmûnên zanebûn, jîrbûn hêzdarbûn an jêhatîbûnê; îspatkirina nasnameya kesekî, lêgerîna ti tekî ji aliyê lehengekî ve çend ji ezmûnên di nav vê be ê de ne.

### **H0– H199. Ezmûna nasname: nasîn**

H80– H149. Nasîna bi heyberan

H110. Nasîna bi cil û bergan

H114. Nasîna bi lepik

## **J. Zane û Balê**

Ev be di eslê xwe de ji sê binbe an pêk tê: zanetî, jîrtî û baletî. Keresteyên be a zaneyan bêhtir ji fablan (çîrokên ajelan) hatine komkirin. Çîrokên bale û jîran jî bêhtir ji pêkenokan pêk tên.

Motifên vê be ê yekser girêdayî çawaniya eqlî ya karakteran e.

### **J1100– J1699. Zîrektî**

J1100– J1249. Kesên zîrek û tevgerên wan

J1110. Kesên zîrek

J1115. Pî ekarên zîrek

J1115. 10.Rêvebirên zîrek

## **K. Xapandin**

Ev be bêhtir girêdayî tevgeran e. Gelek vegotinên gelêrî derbarê xapandinan de ne. Di nav vê be ê de li gel xapandinên cinsî, xapandinên wekî derewkirin, dizî, blofkirin û durûtîkirin cih digrin. Girtin û rizgarbûna bi xapandinê jî di bin vê be ê de ye.

### **K0– K99. Serketina pê birkê bi xapandinê**

K10. Di pê birka atletîkî de bi xapandinê serketin

K11. Di pê birka bazdanê de bi xapandinê serketin

K11.1. Di pê birka bazdanê de bi xapandinê serketin:

nasên arîkar

## **L. Berevajîbûna Çarenûsê**

Çîrok gelek caran behsa serpêhatiya ciwanekî dike ku ew di demeke jiyana xwe de mecbûr dimîne derkeve serpêhatiyekê, di nav vê de gelek serkeftinan bi dest dixê û di dawiyê de digihe armanca xwe. Em di nav çîrokan de gelek mînakên berevajîbûna çarenûsê dibînin wekî dewlemendbûna feqîran, qralbûna kurê herî biçûk, kesên ku bi kesin ji aliyê çîna civakî ji wan bilindtir re dizewicin. Ev hemû di nav vê be ê de cih digrin. Bêguman hemû berevajîbûnên çarenûsê ne erênî ne gelek mînakên nerênî jî hene.

Di çîrokan de êm dibînin ku zarokên malbatinan demeke dirêj çênabin lê pi tî bûyerekê ew dibin xwedî zarok. Ev di nav van motîfan de nimûneyeke pir berbelav e. Mînakên wekî zordar pereyên xwe winda dike, dadgerê xedar karê xwe winda dike jî di vê be ê de cih digirin.

## **L0– L99. Zarokên serketî yên herî biçûk**

L0. Zarokên serketî yên herî biçûk

L10. Kurê serketî yên herî biçûk

L10.1. Navên kurê serketî ên herî biçûk

L10.1.1. Sêzdeh wekî navê kurê serketî ê herî

biçûk

## **M. Tayînkirina Dahatûyê**

Di vê be ê de ligel kehanetan, pê dîtin, sond, soz, peyman, lanet, nifir û pê darazî jî cih digirin.

## **M300– M399. Kehanet**

M310. Kehanetên ba

M311. Kehanet: Dahatûyeke pir rewnaq ji bo zarokên hê çênebûyî

M311.4. Kehanet: zarokê hê çênebûyî dê bibe mîr

## **N. ans û Bext**

ans di vegotinên gelêrî de cihekî girîng digire. Di nava vê be ê de motifên derbarê qumar, xwezaya ans û bextê, qezayên bi ans û bê ans, gencîne û kesên arîkar de cih digirin.

## **N800– N899. Arîkar**

N800.Arîkar

N810.Arîkarên derxwezayî

N812. Hût an dêwên arîkar

N812.3. Hûtê minetdar wekî arîkar



## **P. Civak**

Ev be derheqê pergala civakê de ye. Motîfên derbarê kevne opiyên civakî, desthilat, bazirganî û pî e, malbat û hevaltî, xwezaya desthilatdar û esîlzadeyan de li vir hatine komkirin.

### **P200– P299.Malbat**

P200.Malbat

P230.Zarok û dê û bav

P231. Dê û kûr

P231. Kûr dayika xwe hi yar dike

## **Q. Xelat û Ceza**

Çîrok gelek caran bi serkeftin û xelatgirtina leheng û cezakirina kesê xerab bi dawî dibin. Ew tevgerên girêdayî xelat û cezayan û xwezaya xelatgirtin û cezakirinê di bin vê be ê de hatine komkirin.

### **Q0. Xelat û Ceza**

Q10– Q99.Karên xelatkirî

Q20.Dîndariya xelatkirî

Q22. Xelata ji ber baweriyê

## **R. Girtî û Firar**

Di çîrokan de gelek caran mirov an tîn esîrkin an jî hinek kesan esîr digirin. Di bin vê be ê de jî mijar û tevgerên derbarê esîrbûnê de hatine komkirin. Êweya derdestbûnê, revîn û rizgarbûna ji esîrbûnê, opandina esîran hin ji van mijaran in.

## **R0– R99.Girtîbûn**

R10.Revandin

R10.1. Prensesa revandî

R10.1. Prensese ji aliyê le keran ve tê revandin.

## **S. Zordariya Neasayî**

Ev be derbarê tevgerên pir dijwar ên zordaran de ye. Ev tevger carinan ji ber sedemekê ne carinan jî bêsedem tên kirin. Di vir de dêmariyên zordar, ku tinên pir xerab, zarokên avêtî û zordariyên pir dijwar cih digirin.

## **S0– S99. Nasên xedar**

S60.Hevserên xedar

S62. Mêrê xedar

S62.1. Mêrê jinkûj

## **T. Zayend**

Evîn, zewac, namûs, bekaret, zarokanîn û mezinkirin, têkiliyên cinsî ên nelirê di bin vê be ê de hatine komkirin.

## **T0– T99.Evîn**

T10.Dilketin

T11.Dilketina kesê/a qet nehatiye dîtîn

T11.Dilketina bi dîtina wêne

## **U. Xwezaya Jiyanê**

Mirov dikare bibêje ev be eke filozofiya asayî ye. Çavderiyên derbarê vê yekê de bê çima divê mirov bi ya dayik û bavên xwe û desthilatê bike, danzanînên bê çima jiyana bêdalet e û wecîzeyên din di bin vê be ê de cih digrin.

### **U0– U99. Newekheviyên jiyane**

U60. Dewlemendî û hêjarî

U66. Her kes tê kirîn

U66.1. Her jin tê kirîn

## **V. Ayîn**

Carinan cudakirina D.Sêhr û V.Dîn zehmet e. Lê di be a V.Dîn bêhtir derbarê rîtuêlên dînî wekî diakirin û nimêj, baweriyên dînî li ser ferî te û ewliyayan an ti t û avahiyên dînî de ye. Ji ber wê mucîzeyek dibê ku di bin be a V.Dîn de hatibe komkirin. Lê divê ew mucîze ji ber kesekî an tevgereke dînî peyde bibe.

### **V0– V99. Xizmetên dînî**

V70.Rojî û cejnên dînî

V70.4. Cejna çinînê

## **W. Taybetmendiyên Karakterî**

Ev be bi ser du cureyên tevgeran ve hatiye dabe kirin: tevgerên ba û ên neba . Wêrektî, camêrî, merdî, dilnizmî çend ji tevgerên ba ên lehengên çîrokan in. Çavbirçîtî, quretî, zordarî, hesûdî jî çend tevgerên neba ên lehengên çîrokan in.

### **W100– W199. Taybetiyên karakterî yên neba**

W110.Taybetiyên karakterî yên neba - takekesî

W111. Tiralî

W111.1. Pîleya tiraliyê

W111.1.1. Kesê ji ber bixwerenedîtîne lingê wî

di ewite

## **X. Pêkenî**

Di vê be ê de henekên derbarê zayend, rew a civakî, netewe, nîjad, dirûv, kêrnehâtîbûn, derew, mezinkirin û serxwe bûnê cih digrin.

### **X200– X599. Pêkeniya derbarê çînen civakî de**

X300– X499. Pêkeniya li ser pî eyan

X410. Henekên li ser ke eyan

X414. Ke e li derê de li ga siwar dibe

## **Z. Komên Motîfan ên Curbicur**

Dema ku mirov dixwaze emayeke polînkirinê amade bike herdem çend hêman peyda dibin ku li tu binbe ên vê tesnîfê de nikarin bîn bicihkirin. Di bin be a Z'yê de ti tîn wekî jimarên ku pir tîn karanîn; sembolîzma rengan, heyberan an peyvan; xwezaya lehengan û ti tîn din ku mirov nikare bixe bin be ên ji A'yê heya Z'yê cih digirin.

### **Z100– Z199. Sembolîzm**

Z140.Sembolîzma rengan

Z142. Rengê sembolîk: spî

Z142.2. Spî wekî sembola ehîdbûnê

**BE A SEYEM**

**TETBÎQKIRINA MOTÎFÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED THE  
LI SER THE MOT F INDEKS OF FOLK LITERATURE**



### 3.1. TETBÎQKIRINA MOTÎFAN LI SER THE MOTIF INDEX OF FOLK LITERATURE

Motîfên ku me di çîrokên Mîrze Mihemed de tespît kirine, me li gorî rêbaza Thompson di îndeksa wî de bi cî kirin. Ji ber ku heman hevok dibe ku çend motîfan bihewîne, me ew hevokên wisa di bin çend cihên cuda de nî an dan. Bonimûne, di gelek çîrokan de gotina “Sê heb kurên padî ah hene.” derdikeve pê me. Di vir de em sê motîfan dibînin. Yekem “padî ah/mîr”, duyem “jimareya formel sê” û seyem jî “bav û kûr” sê motîfên ji hev cuda ne. Me jî ev îfade di bin her sê motîfan de nî an da. Lê carinan di hin çîrokan de hin ti t hene ku mimkûn e bibin motîf, lê di çîrokên me de ne bi fonksiyona motîfî cî girtibûn. Me ew di nav îndeksê de nî an nedan. Ji bilî van, me ji ber girîngiya wan sernavên motîfan ên gi tî jî di nav îndeksê de dan.

Me nimûneyên motîfan bi kitekit li ser îndeksê tetbîq kirin û çîroka ku ew motîf tê de hebû me di nava kevanekê de da. Ne tenê ew motîfa ku me nimûneya wê dîtibû lê sernavên wê jî me nî an dan. Bonimûne, di nav motîfên ajelan de motîfa “ejderhayê heftserî” heye û di îndeksê de bi jimareya “**B11.2.3.1.**” hatiye nî andan. Wekî ku me di sazkirina motîfan de jî dabû diyarkirin, her yek jimareya ku bi xalan (.) hatiye veqetandin, tê wateya ku ew binbe e. Wekî ku hûnê di tabloyê de jî bibînin me sernavên gi tî bi tîpên girdek û tarî (**B.AJEL**), komên motîfan tarî û bi tîpên hûrdek (**B0 - B99. Ajelên mîtolojîk**), binbe û motîf jî ji bo ku tevlihevî çênebin bi tîpên hûrdek, tarî û îtalîk (**B10. Cinawir û melezên mîtolojîk**) destnî an kirin.

<b>B. AJEL</b>	Be a Sereke
<b>B0 - B99. Ajelên mîtolojîk</b>	Koma Binbe an
<i>B10. Cinawir û melezên mîtolojîk</i>	Binbe
<i>B11. Ejderha</i>	Motîf
<i>B11.2. Formên ejderhayan.</i>	Binbe a motîfê ya yekem
<i>B11.2.3. Ejderhayê pîrserî</i>	Binbe a motîfê ya duyem
<i>B11.2.3.1. Ejderhayê heftserî</i>	Motîfa jêder
Zîhakî heftserî pê iya ava bajêr girtiye û divê her dem keçekê qurbanî bikin da avê berde. (2)	Nimûneya ku me tespît kiriye

**Tablo 6. Nî andana motîfan di nav îndeksê de**

## **A. MOTÎFÊN MÎTOLOJÎK**

**A0 - A99. Afirîner**

**A100 – A599. Xweda**

**A600 - A1199. Kozmogonî û kozmolojî**

**A2200 - A2599. Taybetmendiyên ajelan**

**A2600 - A2699. Jêderka nebat û daran**

**A2700 - A2799. Jêderka taybetmendiyên nebatan**

**A2800 - A2899. Çend ravekirinên curbicur**

## **B. AJEL**

### **B0 - B99. Ajelên mîtolojîk**

#### ***B10. Cinawir û melezên mîtolojîk***

#### ***B11. Ejderha***

Ejderha hemû gelê bajêr direvîne û dixwe. (7)

#### ***B11.2. Formên ejderhayan***

#### ***B11.2.3. Ejderhayê çendserî***

#### ***B11.2.3.1. Ejderhayê heftserî***

Zîhakî heftserî pê iya ava bajêr girtiye û divê her dem keçekê qurbanî bikin da avê berde. (2)

#### ***B11.10. B11.10. Qurbanîkirina mirovan ji ejderhayan re***

Zîhakî heftserî pê iya ava bajêr girtiye û divê her dem keçekê qurbanî bikin da avê berde. (2)

Ejderdayekî(marekî) ser ava bajêr girtiye. Gelên bajêr her hefte keçikekê dixemilînin û dikin qurbanî da ku karibin pe ek av bistînin. (7)

### ***B30. Çûkên mîtolojîk***

#### ***B31.5. Sîmurg: balindeyê gewre***

Dermanê nexwe iya padî ah, pi ika (cergê) teyrê Astîka Çîlûçavre e. (1)

Teyrê Astîka Çîlûçavre li pi t çiyayê Qaf û Kofî (Çiyayê Qaf) de dijî. (1)

Mîrze Mihemed ku karibe çêlîkên Teyrê Simîr ji mar xilas bike, Teyrê Sîmir dê wî derxe ser rûzemînê. (2)

### **B100 – B199. Ajelên sêhrî**



***B180. Çarlingên sêhrî***

***B184.Çarlingên sêhrî yên simdar***

***B184.1. Hespê sêhrî***

Hespê ba û birûskê arîkariya Mirze Mihemed dike ku ji bavê xwe rizgar bibe. (1)

Ti tek nikare kerê ûnkê Sêpê li pey xwe bihêle. (1)

Zanayê kal ji heriyê hespekî re ji Bîblîcanê re çêdike. (3)

Hespê ku kalê zana daye Bîblîcanê, hespekî taybet e. Ku siwarê wî jê dadikeve ew hesp winda dibe. (3)

Mîrze Mihemed ji êr û hespên xwe re dibêje dema ku min mûyên we li hev xist hûn dê werin cem min. (5)

**B200. – B299. Ajelên xwedî tevgerên mirovan**

***B210. Ajelên axêver***

***B211. B211. Ajel wekî mirovan diaxifin.***

Teyrê Simîr û çêlîkên wê bi Mîrze Mihemed re diaxifin. (2)

Beran Çako bi saya qêrînê û axaftina xwe, xwe ji mirinê rizgar dike. (3)

Ji ber ku keçelok edaba piyê êr derdixe û wî ba dike, êr dibêje tu çi bixwazî ez ê bidim te. (5)

Gur dibêje Mîrza Mihemed birçîbûna min çend salan qedand, ez têr kirim û rê dide wî û Belqizê. (8)

**B300 – B599. Ajelên dost**

**B300 – 349. Ajelên arîkar - bi gi tî**

Mîrze Mihemed ku karibe çêlîkên Teyrê Sîmir ji mar xilas bike, wê Teyrê Sîmir wî derxe ser rûzemînê. (2)

***B320. Xelatên ajalên arîkar***

***B322. Ajela arîkar xwarinê peyda dike.***

***B322.1. Leheng go tê xwe dide ajela arîkar.***

Divê Mîrze Mihemed cendek û sîtilan nexer xwar lê ku bixwe xwar ew nikarin derkevin ser rûzemînê. Lê bê hemdî cendekekî mîhan dixwe xwar. Ji bedela go tê mîhan go tê hêta xwe jê dike û dide Teyrê Sîmir. (2)

Mîr Mihemed e caran nan, av û go t dide teyr lê di cara heftan de parçê go t ji destê xwe dide erdê û ji bedela wê de go tê xwe dide teyr. (7)

***B350 – B399. Ajelên minetdar***

***B380. Ajelên minetdar ji bo rizgarkirina ji ê ê***

Ji ber ku keçelok edaba piyê êr derdixwe û wî ba dike, êr dibêje tu çi bixwazî ez ê bidim te. (5)

***B400 - B499. Cureyên ajalên arîkar***

***B400 – B449. Ajelên arîkar***

***B400. Ajelên kedî yên arîkar***

***B401. Hespê arîkar***

Hespê ba û birûskê arîkariya Mirze Mihemed dike ku ji bavê xwe rizgar bibe. (1)

Bîblîcan bixwaze here ku derê hespê ku kalê zana ji heriyê çêkiriye dê wê bibe wir. (3)

***B421. Kuçikên arîkar***

Tajîyê Mîrza Mihemed li ber bîrê li hêviya wî disekine û dema kerwan derbas dibin dihêle ew wî ji wir derxin. (8)

***B430. Ajelên dirinde yên arîkar***

***B435. Ajelên dirinde yên arîkar - famîleya kûçikan û go txwiran***

***B435.3. Gurê arîkar***

Gur dibe Mîrza Mihemed birçîbûna min çend salan qedand, ez têr kirim û rê dide wî û Belqizê. (8)

***B450. Çûkên arîkar***

Teyrê Sîmir Mîrza Mihemed derdixe ser rûzemînê. (2)

Bi arîkariya teyr, Mîr Mihemed carekê din derdikeve rûzemînê. (7)

***B490. Ajelên din ên arîkar***

Tejî dê li her derî arîkariya Mîrza Mihemed bikin. (1)

**B500 – 599. Xizmetguzariyên ajelên arîkar**

***B510. Dermankirina ji aliyê ajelan***

Dermanê nexwe iya padî ah pi ika (cergê) teyrê Astîka Çîlûçavre e. (1)

Teyrê Sîmir go tê hêta Mîrza Mihemed bi tifa xwe carek din lêdixe û wî ba dike. (2)

Teyr û ew go tê ku Mîr Mihemed ji la ê xwe jêkiribû û dabûye bi tifa xwe careke din bi la ê wî dike û wî ba dike. (7)

***B550. Ajelên siwariyê***

***B559. Ajelên siwariyê- curbicur***

***B599.2. Ajelên ku ji bo peywirê pêk bîne, arîkariya mirov dikin.***

Keçelok bi arîkariya êr û hespên xwe le kerên neyar hemûyan dikuje. (5)

**B600 – B699. Zewaca mirov û ajelan**

***B604. Zewaca bi xijendeyan re***

***B604.5. Zewaca bi beqê re***

Ji ber ûrê Mîrze Mihemed li ber beqekê dikeve, Mîrze Mihemed beqê ji xwe re tîne. (4)

***B640. Zewaca bi mirovekî di rengê ajelan de***

Beqa ku Mîrze Mihemed wekî jin ji xwe re tîne di eslê xwe de keçikeke pir delal e. (4)

**B700 – B799. Tevgerên ecêb ên ajelan**

**B720 – B749. Taybetiyên ecêb ên fizîkî yên ajelan**

***B740. Hêza mezin û ecêb a ajelan***

***B744. Ajelên ku pir xurt diçin***

Ti tek nikare kerê ûnkê Sêpê li pey xwe bihêle. (1)

**B800 - B899. Motîfên curbicur derbarê ajelan**

***B870. Ajelên dêw***

***B872.3. ahîne dêw***

ahîne bazîd li ber deriyê yekem nobedariyê dike. (1)

## C. QEDEXE

**C0 – C99. Qedexeyên derbarê jîndarên derxwezayî de**

**C100 – C199. Qedexeya cinsî**

**C200 – C299. Qedexeyên xwarin û vexwarinê**

**C200 – C249. Qedexeyên xwarinê**

Bîblîcan çî xwarinê çêbike divê pê î bide pisîkê yan wê pisîk agirê wan bitemirîne û dîtina agir nepêkan e. (3)

**C300 – C399. Qedexeya nêrînê**

**C400 – C499. Qedexeya axaftinê**

**C498. Qedexeya axaftinê: gotineke qedexe**

Dema Belqiz bibêje “can ha can” divê Mîrza Mihemed bibêje “kule can” an ku bibêje “can” dê bibe kevir. (8)

**C500 – C549. Qedexeya deslêdanê**

**C537. Qedexe: deslêdana ajela diyar**

Beranê spî mirov derdixe ser erdê, beranê re mirov dibe heft qat binê erdê. Ji ber wê keçîk wî îretan dike da ku li beranê spî siwar bibe. Wate divê li beranê re siwar nebe. (2)

**C550 – C599. Qedexeya çîna civakî**

**C600 – C699. Qedexeyên bêhempa û neçariyê**

**C600 – C649. Qedexeya ti tekî tekane**

Dixuna Belqizê çil gillê ne, Mîrza Mihemed divê sih û nehan veke yekê bihêle. Gava ew hemûyan veke wê bibe kevir. (8)

Divê Mîrza Mihemed ji çar deverên Belqizê maç bike yan nikare wê bi dest bixe. (8)

**C610. *Devereke qedexe***

Divê Mîrza Mihemed neçe Merge Sorê. (1)

**C611. *Be ên malê yên qedexe.***

**C611.1. *Deriyên qedexe***

Di mala kalê kor de sê deriyên kilît kirî hene û ew naxwaze tu kes bikeve wan. (1)

Teyrê Astîka Çîlûçavre li pi t sê deriyên talûke ye. (1)

**C700 – C899. *Qedexeyên curbicur***

**C750. *Qedexeya demê***

Divê lawik derbeke û tenê li Kalo bixe, ger ku ji yekê zêdetir lê bixe wê Kalo wî bikuje. (7)

**C830.1 *Qedexeyên nehatine polînkirin***

Bîblîcan divê xweliya dewsa pîrê biavêje devereke dûr an na wê pîrê careke din sax bibe. (3)

êr ji keçelok re dibêje sê çêlîkên min hene, here yekê ji wan bifetisîne lê ku ez dengê wê bibihîsim ez dê te bixwim. Pi tre li ber çem bi o ku bîhna wê jî were ez ê te bixwim. (5)

**C885. *Qedexe: bihîstin an guhdarkirin***

Wê zilam qamçiyekê li her yek birayên Bîblîcanê bixe. Bîblîcan jî divê guhê xwe bigire û dengê qamçiyê nebihîze. Ku dengê qamçiyê bibihîze birayê wê nabe mirov wê heywan bimîne. (3)

e birayên Bîblîcanê careke din dibin meriv lê dema ku zilam qamçiyê li Çakoyê birayê Bîblîcanê yê biçûk dixê, Bîblîcanê dengê wê dike û Çako wekî beranekî dimîne. (3)

êr ji keçelok re dibêje sê çêlîkên min hene, here yekê ji wan bifetisîne lê ku ez dengê wê bibihîsim ez dê te bixwim. Pi tre li ber çem bi o ku bîhna wê jî were ez ê te bixwim. (5)

### **C900 – C999. Cezayê bînpêkirina qedexeyê**

Bîblîcan xwe ji bîr dike ku pê î xwarinê bide pisîkê û ew berî pisîkê xwarinê dixwe. Pisîk jî agirê wan ditemirîne. (3)

***C960. Veguherîn wekî cezayê bînpêkirina qedexeyê***

***C962. Cezayê bînpêkirina qedexeyê: Mirov dibin ajal.***

Bîblîcan ji ber ku pincara dewsa xweliya pîra sêr ji birayê xwe re çêdike her yek ji wan dibe heywanek. (3)

Ji ber Bîblîcan dengê qamçiya ku zilam Çakoyê birayê wê yê biçûk dixê, dibihîse Çako wekî beranekî dimîne. (3)

## **D. SÊHR**

### **D0 – D699. Veguherîn**

#### **D100 – D199. Mirov vediguherin dibin ajel**

Bîblîcan ji ber ku pincara dewsa xweliya pîra sêr ji birayê xwe re çêdike, her yek ji birayên wê dibe heywanek. (3)

#### **D200 – D299. Mirov vediguherin dibin heyber**

##### ***D231. Veguherîn: mirov dibin kevir***

Jina dêwê spî dibêje ku kesê li pêy Belqizê diçin, dibin kevir.(8)

#### **D300 – D399. Ajel vediguherin dibin mirov**

##### ***D390. Veguherîn: xijende û ajelên curbicur dibin mirov***

##### ***D395. Veguherîn: beq dibin mirov***

Beqa ku Mîrze Mihemed ji xwe re aniye, vediguhere iklê keçikekê. (4)

#### **D500 – D599. Rêyên Veguherînê**

##### ***D510. Veguherînên ji ber bînpêkirina qedexeyê***

Bîblîcan ji ber ku pincara dewsa xweliya pîra sêr ji birayê xwe re çêdike, her yek ji birayên wê dibe heywanek. (3)

##### ***D560. D560. Rêyên din ên veguherînê***

##### ***D575.1. Veguherîn bi avêtina xweliyê***

Ji ber ku satila Bîblîcan qul bûye, xweliya pîrê li her derî belav dibe û di dewsa xweliyê de pincar çêdibin. (3)



**D700 – D799. Xerabûna sêhrê**

***D701. Xerabûna sêhrê gav bi gav***

Pi tî ku Mîrza Mihemed ertan yek bi yek pêk tîne, sêhra li ser Belqizê xera dibe. (8)

***D730. Xerabûna sêhrê bi îteatê***

Pi tî ku Bîblîcan ji binê bîrê derdikeve, beran Çako hembêz dike û Çako careke din ji ber xwe ve dibe mirov. (3)

***D742. Xerabûna sêhrê bi soza zewacê***

Zilam bi ertê ku Bîblîcan wî bike, soz dide ku birayên wê careke din bike mirov. (3)

Bîblîcan soz dide zilam ku ew birayên wê carek din bike mirov, ew dê wî bike û bibe jina wî. (3)

**D800 – D1699. Heyberên sêhrî**

**D800 – D899. Xwedîbûna heyberên sêhrî**

***D810. Heybera sêhrî wekî diyarî***

Keça biçûk gustîlka sêhrî dide Mîrza Mihemed da ku xwe karibe rizgar bike.(2)

***D812. Afirindeyên derasayî heyberên sêhrî didin.***

***D812.4. Ruh heyberên sêhrî didin.***

***D812.4.1. Mirî li dinyaya jêrîn heybera sêhrî didin.***

Dayika Mîrza Mihemed a mirî kumekî sêhrî dide wî. (4)

***D815. Heyberên sêhrî ji nasan tê standin.***

***D815.1. Dayik heybera sêhrî dide.***

Dayika Mîrze Mihemed a mirî kumekî sêhrî dide wî. (4)

***D822. Zilamê pîr heybera sêhrî dike diyarî.***

Zanayê kal ji heriyê hespekî re ji Bîblîcanê re çêdike. (3)

***D830. Destxistina heybera sêhrî bi fenan***

***D838. Destxistina heybera sêhrî bi diziyê***

Mîrze Mihemed dema ji mala hût direve, bi xwe re sê ti tîn sêhrî e, sabûn û cêrekî avê dibe. (5)

***D860. Windakirina heybera sêhrî***

***D863. Heybera sêhrî ji ber xwe ve winda dibe.***

Hespê kalê zana daye Bîblîcanê hespekî taybet e. Ku siwarê wî jê dadikeve, ew hesp winda dibe. (3)

**D900 – D1299. Cureyên heyberên sêhrî**

***D915. Çem û rûbarên sêhrî***

Çemê sêhrî dibêje ku ev çend sala kesî ava min venexwaribû û negotibû gelek iker ji xwede rê, lê Mîrza Mihemed wisa got, ez jî dê wî derbas bikim. (8)

***D930. Taybetmendiyên erdî yên sêhrî***

***D931. Kevir û latên sêhrî***

Dema Mîrze Mihemed hêsan(kevir) diavêje, hêsan dibe Çiyayê Kubarê da ku bavê Mîrze Mihemed nikaribe hêsanî derbas bibe. (1)

***D960. Bexçe û nebatên sêhrî***

Mîrze Mihemed bi dara spîndarê re diaxife. (1)

Dara Spîndarê arîkariya Mîrze Mihemed dike. (1)

***D1010. Lebatên sêhrî yê ajelan***

***D1022. Perikên sêhrî***

Ji bo ku Mîr Mihemed karibe ji binê bîrê rizgar bibe, divê du perikên sêhrî ku di sindoqa Kalo de ne heft caran li hev bixî. Dema ku li hev xistin, dê beranekî re û beranekî spî peyda bibe. Lê Mîr Mihemed divê li beranê spî siwar bibe, da karibe derkeve rûyê erdê. (7)

***D1023. Pirç û pora sêhrî***

Mîrze Mihemed kengî du mûyên hespê ba û birûskê li hev dixê, li ku dere be jî hesp peyda dibe. (1)

Mîrze Mihemed ji êr û hespên xwe re dibêje ku dema min mûyên we li hev xist, divê hûn werin cem min. (5)

***D1039. Xwarinên sêhrî***

***D1039. Xwarinên sêhrî - curbicur***

***D1039.2. Xwêya sêhrî***

Dema Mîrze Mihemed xwêyê diavêje, xwêya sêhrî li pê iya Kalê Kor dibe behreke mezin. (1)

***D1070. Alavên xwe kahiyê yê sêhrî***

***D1072.1. eyê sêhrî***

Dema Mîrze Mihemed e diavêje, eyê sêhrî dibe têt û dirî da ku bavê Mîrze Mihemed nikaribe hêsanî derbas bibe. (1)

Mîrze Mihemed e davêje pi t xwe, e li pê iya hût dibe dahl, strî û gurnik. (5)

***D1141. Mezela sêhrî***

Mîrze Mihemed ti têt derasayî di çil odayên hût de dibîne. (5)

***D1146. Deriyên sêhrî***

Derî dibêjin ji ber ku Mîrza Mihemed qencî bi me re kiriye, em ê jî bi ya wî bikin û derî rê didin wî û Belqizê. (8)

***D1174. Qotiya sêhrî***

Pîrê sindoqeke sêhrî ku di nava wê de du tejî hene dide Mîrza Mihemed. (1)

***D1076. Gustîlka sêhrî***

Dema Mîrza Mihemed gustîlka sêhrî ya keçikê dizîvirîne, beranekî re û beranekî spî peyda dibin. (2)

***D1195. Sabûna sêhrî***

Mîrza Mihemed sabûna sêhrî diavêje pê iya hût, sabûn li ber hût dibe emetok. (5)

***D1170. Alavên sêhrî***

***D1171. Qabên sêhrî***

***D1171.4. Surahî, cêr û misînên sêhrî***

Mîrza Mihemed cara dawî cêrê avê diavêje ber hût û ew cêr li ber hût dibe çemekî mezin. (5)

***D1242. Ti tên herikbar ên sêhrî***

***D1242.1. Ava sêhrî.***

Di nava wan her sê odayên kilît kirî de ava zêr û zîv û hespekî kihel heye. (1)

**D1300 – D1599. Fonksiyonên heyberên sêhrî**

***D1390. Heyberên sêhrî mirovan xilas dikin.***

Derî dibêjin ji ber ku Mîrza Mihemed qencî bi me re kiriye, em ê jî bi ya wî bikin û derî rê didin wî û Belqizê. (8)

Çemê sêhrî dibêje ku ev çend sala kesî ava min venexwaribû û negotibû gelek iker ji xwede rê, lê Mîrza Mihemed wisa got, ez jî dê wî derbas bikim. (8)

***D1400. Heybera sêhrî kesekî têk dibe.***

***D1402. Heybera sêhrî dikuje.***

Mîrza Mihemed kumê ku dayîka wî dayiyê heke bixe serê bavê xwe dê bavê wî bimre, lê ku bavê wî bi xwe bixe serê xwe dê Mîrza Mihemed bimire. (4)

Bavê Mîrza Mihemed dizane ku kurê wî kum bide serê wî dê bimire. Lê dîsa jî nikare wî bisekinîne û dema Mîrza Mihemed kumê sêhrî dixwe serê bavê xwe, bavê wî dimire. (4)

***D1467. Ava sêhrî gencineyan çêdike.***

***D1467.1. Ava sêhrî zêr çêdike.***

Di nava wan her sê odeyên kilît kirî de ava zêr û zîv û hespekî kihel heyê. (1)

Mîrza Mihemed ji kaniya zîv û zêran ji xwe re cilên zêrîn çêdike. (5)

***D1470. Heyberên sêhrî ti tan diafirînin.***

***D1472. Heyberên sêhrî xwarin û vexwarinê peyda dikin.***

***D1472.1. Heyberên sêhrî bixwe xwarin û vexwarinê peyda dikin.***

***D1472.1.11. Qo xane xwarinê peyda dike.***

Qo xane û qa ika ku jina Mîrza Mihemed xwestibû sêhrî bûn. Mirov dikarî têra welatekî xwarinê tê de çêbike. Çiqas biqede jî dîsa ji ber xwe ve tijî dibe. (4)

**D1600 – D1699. Taybetmendiyên heyberên sêhrî**

***D1610. Heybera sêhrî ya axêver***

Hûr ji kêrê dipirse be ma çima destê Mîrza Mihemed biriye, kêr jî dibe min nebiriye. (5)

Derî dibêjin ji ber ku Mîrza Mihemed qencî bi me re kiriye, em ê jî bi ya wî bikin û derî rê didin wî û Belqizê. (8)

***D1610.2. Dara axêver***

Mirze Mihemed bi dara spîndarê re diaxife. (1)

**D1700 – D2199. Hêzên sêhrî û nî aneyên wan**

**D2050 – D2099. Hêzên sêhrî yên xeraker**

***D2064. Nexwe iya sêhrî***

***D2064.5. Nexwe iya sêhrî ji ber nîfir an lanetê***

Padî ah ji ber nîfira keçelok bi ê eke bêderman dikeve. (5)

## **E. MIRÎ**

**E0 – E199. Vejandin**

**E200 – E599. Pêrew û xeyaletên din**

**E600 – E699. Reenkarnasyon (Vejîna di la ekî din de)**

**E700 – E799. Ruh**

*E780. Lebatên la ên pêwîst.*

*E781. Çav serkeftî tê bi cî kirin*

Mirze Mihemed çavên kalê kor dixê ciyê wan û bi saya libên çêran wan rehet dike. (1)

## **F. DERASAYÎ**

### **F0 – F199. Rêwîtiyên bo dinyayên din**

#### **F80 – F109. Dinyaya jêrîn**

##### ***F80 . Rêwîtiya bo dinyaya jêrîn***

Beranê spî mirov derdixe ser erdê beranê re mirov dibe heft qat binê erdê. Ji ber wê keçîk wî îret dike da ku li beranê spî siwar bibe. (2)

Beranê re Mîrze Mihemed dibe dinyayek din a jêrîn. (2)

KU ÇU Ebubekir (2013). *Li Gorî “Motif Index of Folk Literatue” yê Motifên di Çîrokên Kurdî yên Gelêrî de*, Projeya Mastira Bêtez a Newe andî, Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artuklu, Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

LEACH Maria (1984). Type. *Funk and Wagnalls, Standart Dictionary of Folklore, Mytology and Legend*, r. 1137, New York: Harper & Row

LUTH Max(1997). *Avrupa Masal Tipleri ve Ki ileri*, wer. Sevgül Sönmez. Milli Folklor Dergisi 36, r. 70

MART N Peggy (1979). *Stith Thompson: His Life and His Role in Folklore Scholarship*, Bloomington, Indiana: Folklore Publications Group, Indiana University

MURPHY Terence Patrick (2015). *The Fairytale and Plot Structure*, London: Macmillan

PERTEV Ramazan (2016). *Xebateke Girîng di Dîroka Folklorê Kurdî de: Kemal Fewzî û Berhevkariya Çîrokên Kurdî*, Bingöl Üniversitesi Ya ayân Diller Enstitüsü Dergisi 3

PROPP Vladimir (2008). *Masalın Biçimbilimi*. wer. Mehmet Rifat-Sema Rifat, Istanbul: Türkiye Bankası Kültür Yayınları

SABAR Yona (1982). *The Folk Literature of Kurdistan Jews*, New Heaven: Yale University Press

SAKAO LU S. (1980). *Anadolu-Türk Efsanelerinde Ta Kesilme Motifi ve Bu Efsanelerin TipKatalogu*, Ankara: Ankara Basimevi

SAKAO LU Saim (2002). *Gümü hane ve Bayburt Masalları*, Ankara: Akça Yayınları

SAKAO LU Saim (2010). *Türk Masal Tipleri Katalo u Tasla ı Üzerine*, Milli Folklor Dergisi 86, rp. 47-48

SEY DO LU Bilge (1975). *Erzurum Halk Masalları Üzerine Ara tırmalar*, Ankara: Baylan Yayınevi

TEMTEK Leyla evin (2013). *Folklorê Bazîdê*, Projeya Mastira Bêtez a Newe andî, Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artuklu, Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

THOMPSON Stith (1946). *The Folktale*, New York: The Dryden Press

THOMPSON Stith (1955-58). *The Motif Index Of Folk Literature*, Indiana: Indiana University Press

UTHER Hans-Jörg(2004). *The Types of International Folktales: A Classification and Bibliography. Based on the System of Antti Aarne and Stith Thompson*, Helsinki: FF Communications

VESELOVSKY A. N. (1913). *The Poetics of the Subject* ('Poetika syuzhetov'). St. Petersburg

YILDIRIM Mehmet (2013). *Di Hin Çîrokên Mîrze Mihemed de Motîfên Edebiyata Gelêrî*, Projeya Mastira Bêtez a Newe andî, Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artuklu, Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

#### **Çavkaniyên dijîtal û onlîne:**

AARNE Aanti (2016). *Verzeichnis der Märchentypen*, Dîroka Sûdwegirtinê: 16 Nîsan 2016, [https://de.wikisource.org/wiki/Verzeichnis\\_der\\_M%C3%A4rchentypen](https://de.wikisource.org/wiki/Verzeichnis_der_M%C3%A4rchentypen)

MATHUNA Mac Seamus (2016). *The History Of Celtic Scholarship in Russia And The Soviet Union*, Dîroka Sûdwegirtinê: 26 Adar 2016  
<http://arts.ulster.ac.uk/historyceltic/wp-content/uploads/2012/04/Celto-Slavica-MacMathuna-CS-in-USSR-No-pictures118-August.doc>

MELETINSKI Elezar (2016). *Typological Study of the Folktale*, Dîroka Sûdwegirtinê: 8 Nîsan 2016  
[http://monoskop.org/images/b/bf/Meletinsky\\_Eleazar\\_1969\\_1974\\_Typological\\_Study\\_of\\_the\\_Folktale.pdf](http://monoskop.org/images/b/bf/Meletinsky_Eleazar_1969_1974_Typological_Study_of_the_Folktale.pdf)

[https://www.ualberta.ca/~urban/Projects/English/Content/Motif\\_Help.htm](https://www.ualberta.ca/~urban/Projects/English/Content/Motif_Help.htm) Dîroka Sûdwegirtinê: 8 Nîsan 2016

Wikipedia (2016). *Antti Aarne*, Dîroka Sûdwegirtinê: 15 Nîsan 2016  
[https://en.wikipedia.org/wiki/Antti\\_Aarne](https://en.wikipedia.org/wiki/Antti_Aarne)

Wikipedia (2016). Stith Thompson, Dîroka Sûdwegirtinê: 29 Adar 2016  
[https://en.wikipedia.org/wiki/Stith\\_Thompson](https://en.wikipedia.org/wiki/Stith_Thompson)

**Çavkaniyên din:**

PERTEV Ramazan (2013-2014), Vladimir Propp û Morfolojîya Çîrokê, Newa andî,  
Notên Dersa Edebiyata Gelêrî ya Zanîngeha Mardin Artuklu, r. 1



## **PEVEK 1**

**ÇÎROKÊN MÎRZE M HEMED**



## 1. ÇÎROKA YEKEMÎN

### Be a Yekemîn

Hebû tunebû, ji Xwedê mezintir, ji evdan jî derewtir tunebû. Di demeke berê de li cihekî padî ahek hebû. Mîr xwediyê sê kuran bû. Navê kurê mezin Ehmed, yê navîn Mihemed û yê piçûk jî Mîrze Mihemed bû. Mîr çiqas xwediyê sê kuran be jî dixwest ku keçeke wî jî hebe. Gelên wî bajêrî bi Mîr ve pir hewî dikirin ku Xweda Teala ji kerema xwe keçekî bide mîr. Lêbelê Xwedayê mezin demeke dirêj bersîva hêwî û daxwazên wî neda.

Rojekî jina mîr nexwe ket û bêzar ma. Ev bûyer di nav bajêr de deng da û herkesî guh da ser mala mîr. “Ka îcar yê ji mîr re keç bibe an jî kur?” Roj hat gihî te dema razana jina mîr, Xwedê Teala keçek da mîr. Di nav gelên bajêr de bû kêfxwe û eng û ahiyek mezin. Di qesra padî ah de sê roj û sê ev xwarin û vexwarin tê dayîn, gel wek dawetekî govend digrin dileyîzin, jin tilîliyan diki înin, zilam jî bi hespên xwe yî kumêt û rewan dikevîne pê baziyan.

Lêbelê digel vî her sê rojên ahî de bûyerên zahf balkê , ecêb û xof jî çêdibin. Lewra roja yekemîn de rênçberê padî ah tê û dibêje:

— Padî ahê min di nîvê evêde ti tek hatîye, sê heb hespên me yî hêrî ba ku tiye, pirtî pirtî kiriye û nî anek jî di holêde nehî tiye û wînda bûye. Ji bo ku mîr pir kamran û kêfxwe bû, guh nedayê û got:

— Ti tek nabe, bila can saxî be!

Di roja duduyan jî ev bûyer dubare dibe. Ev car jî di gomê de sê heb çêlekên guhanê wan tije îr, parçe parçe bûyî û nîvê wan jî hatiye xwarin tê dîtin. Çiqas mîr ser van bûyeran nesekine jî ku cara sisê ya jî pezê wan wusa tînen talankirin, êdî mîr jî dikeve ikê. Kurê wî yê piçûkê bi navê Mîrze Mihemed dibêje:

— Bavo ez îro ranazêm, ev bûyer ne ti tekî xêre. Ger ev ti t çêbe, ez derxime holê û wî bikujim. Dema ku dibe êvar, Mîrze Mihemed diçe dev û dora qesrê digere. Di nîvê evê de Mîrze Mihemed diçe dikeve gomê û bêdeng disekine. Demek pa ê guh dide derî; dibîne ku hêdî hêdî derî vedibe, ti tek dikeve hundir. Dengê pê hêdî hêdî di aliyê dewaran de diçe. Wê demê dewar di cihê xwe de nasekinin, xwe tevdidin û wek saya gurekî har bikeve ser mîhan, dîkin ku zincîrên xwe biqetînin û



birevin. Wê demê Mîrze Mihemed ûrê xwe diki îne û dev û dora xwe û nav lingê dewaran de badike. Di ni ka ve de dengêki wek bebika tê:

— Wee, wee!

Û disa derî vedibe, ew ti t çawa hatibû wusa derdikeve û direve diçe. Mîrze Mihemed dema ku serê ûrê xwe dinêre, dibîne ku tiliyeke qiliçi ya zarokekê pêva ye. Destmalekê bêrika xwe derdixe, serê tiliya jêkirî dixê nav destmalê û disa wî dixê bêrika xwe. Ji kesekî ra ti teki nabêje, diçe radizê. Dema ku roj derdikeve, dinê ronî dibe, rênçberê mîr wek mizginiyekê bîne tê, dibêje:

— Î ev ti tek ne hatiye serê tu ajalekî! Pez, dewar û ji hespan qet yek jî kêmbûye.

Mîrze Mihemed êvarê dema ku tê dikeve nava nivînê xwe, difikire û dibêje:

— Ezê sibê zû rabim, vê tiliyê dinav hemu bajêrî de bigerînim, ka ev tiliya kêye? Wê demê yê derê holê. Mîrze Mihemed sibe zû radibe, ji kesî re ti tekî nabêje. Hespê xwe siwar dibe û wê tiliyê hemu bajêr digerîne. Her malekê yek bi yek digere, mezin heya piçuka dinêre. Lêbelê xwediyê wê tiliyê peyda nake. Vedigere qesrê, carek din tiliya herkesî dinêre, lê disa kesî ku tiliya wî jêkirîye nabîne. Êdî kesek nemabû, Mîrze Mihemed difikirî xwe bi xwe re û digot:

— Ew eva ku min xwe gomê de ve art; dengê piyê bebikekê dihat, û dîsa ku min ûrê xwe lêda serê tiliya bebikekê pêva jêkir û dengê girîna bebikekê hatibû min. Ev sê roje xu ka min hatiye dinê û ev sê roje jî ajalên me ziyar dibînên. Yek jî ez nava bajarê de geriyam, kes nema ku ez xwediyê vê tiliyê bibînem. Bi tenê qesra me de, min tenê tiliya xwi ka xwe nenêriye. Dibe nebe ezê tiliya xwi ka xwe jî binêrim. Pa ê diçe ba diya xwe û dibêje:

— Ez dixwazim xu ka xwe bibînem.

Diya wî dibêje:

— Kurê min ma tu nizanî, heya çilê bebikeki dernekeve, ewî ni anê tu kesi naxin. Dîtina wê çaxê ne ba e û ew dîtîna dibe sedama qeza û belayên mezin.

Mîrze Mihemed disa jî ku xwest xwi ka xwe bibîne. Lê belê çiqas xwest jî, diya wî destûra wî neda. Di dawiyê de nêçar ma got:

— Here ji bavê xwe destûr hilde. Ger bavê te destûr da, wê demê were ezê xwi ka te ni anê te bidim.

Mîrze Mihemed çû ba bavê xwe, ji wî destûr xwest. Lêbelê bavê wî destûr nedayê.

Mîrze Mihemed bi xemgînî:

— Ku hûn destur nedin ez xwî ka xwe bibînim, ezê serê xwe hildim herim ji vê malê!

Bavê wî gotê:

— Li kuderê hatîye dîtîn ku keça sê rojî kesek bîxwaze bibîne!

Mîrze Mihemed carek din ji bavê xwe re got:

— Ez dixwazim xu ka xwe mutleqa bibînim. Ger tu astengî dernexî! Lewra ew heywanên me yî ku bi hovîtî hatibûne perçekîrin ne karê ajalên kovîne. ûna dev û diranên wan wek yê zarokaye. Dema ku min ûrê xwe ki and û lêda, min dît tiliya zarokekî bi ûrê min ve hat. Ez bajêr hemu gerîyam, tu kesê ku tiliya wan jêkirî min nedît. Bi tenê xu ka min maye. Ez dixwazim wê jî bibînim.

Bavê Mîrze Mihemed disa destûra wî neda, jê re hêrs bû û got:

— Tu çava ji mala min dikevî ikê. Tu min, ji keça mine di nav pêçekê de dixî ikê. Van gotinên xwe biterikîne. Cardin ez ti tekî waha nebihîzim. Ku ti tekî waha were guhê min, ezê te ji malbata xwe bavêjim û tu ku de diçî here. Mîrze Mihemed, bi van gotinên bavê xwe pir aciz bû, xemgîn bû û ser ve jî pir hêrsa wî hat. Lê ti tek jî ji destê wî nehat. Dêna xwe dayê ku kesek jê bawer nake, herkes pê henek û tiranên xwe dike. Serê xwe hilda terka malbat, bajêr, welatê xwe kir. Lêbelê dema çûyîne zivirî pa xwe û ji wan re wusa got:

— We ji min bawer nekir, berda min û destê min ji xwe û welatê min kir. Lêbelê hunê rojêkî pir po man bibin.

Mîrze Mihemed bi nêçarî û xemgînî malbat û bajarê xwe terk dike û diçe.

### **Be a Duyemin**

Dema ku Mîrze Mihemed bajarê xwe dertê; bi ev û bi roj diçe gund û bajaran, de t û çiyayan pi t xwe ve dihêle. Tê memleketekî cuda. Berê xwe hildide tê

serê de tekî binê çiya de dibîne ku kerk kolkekî axê heye. Diçe ber deriyê kerkolkê, lêdixe. Pîrejinek derî vedike. Mîrze Mihemed silav û selam dide pîrê. Pîr jî silavên wî vedigerîne:

— Ey bavê pîrê! Tu bixêr hatî, ser çava û ser sera. Tu ev dera û ev dera tu!

Mîrze Mihemed jî dibêje:

— Dayika pîrê, ev çend roje ez peyatî tîm û di rêyandanim. Pir birçî bûme. Ku ti teki te hebe ji min re bîne ez bixwim. Pîrê diçe malêhazirî çî hebe, xwedê çî xistiye nesîb, amade dike, dîne dide ber Mîrze Mihemed de. Mîrze Mihemed xwarinê dixwe û ji pîrê dipirse:

— Tu tenêyî di vê malê de, kesî te tuneye?

Pîrê dibêje:

— Kurê min ez tenê nînim. Mêrê min jî heye. Mêrê min diçe ber peza. Çavên wî kore. Navê kerê wî jî ûnkê Sêpê ye.

Mîrze Mihemedmatmayî dimîne. Dibêje ku çavên wî korbe, çawa dikare here ber peza û çawa dizane pez kêmin an zêdene, hatine an nehatine, kuda diçin û ji ku tên? Pîrê dibêje:

— Belê, mêrê min kore lêbelê ku destê xwe pi ta pezekî bixe, dizane kîjan hatiye, kîjan nehatiye. Pozê wî pir ba bêhnê hildide, dur ve dizane mirovê hemberê wî kêye an jî kê nîne. Guhên wî jî pir ba dibihîzin. Her dengê nasdike, dizane deng ji kê û ku ve tê. Demeke nêzîk de yê were. Tu jî zû bike! Ku te li vir bibîne, yê te pirtî pirtîke. Heya pîrê van gotina dibêje dengê kalê kor tê. Pîrê bilez Mîrze Mihemed vedi êre û dibêje:

— Ne deng derxe ne jî bêhn bigre û hilde!

Kalê kor bi hêrs tê malê, dibêje:

— Tê min bêhna biyanî!

Pîrê dibêje:

— Ya kafirê kor! Biyanî li vir çî dikin? Ka were runê, behna xwe bide. Tu êdî kal bûyî. Diçî ber peza, nêçîrê, tu pir diwestî, diperitî. Xwezî kêrekî me hebûya.

Biçûya ber peza, karê ku tu kalbûna xwe da dikî bila ji mere bikira. Tu yê jî hînekî rawestyayî, teyê bêhna xwe bida, kêfa xwe binêrîya, bigeriyayî û biçûyayî nêçîrê.

Dema pîrê van gotina ber dilê kalê de dike. Dilê kalê hineki nerm dibe. Kalê bêhneke kur diki îne û dibêje:

— Çibikin em, kurê me tuneye!

Pîrê dibêje:

— Tu ji ku dizani ku kurê me tuneye! Kurekî me heye. Lêbelê ji bo ku ez ji te tirsiyam û min got tu yê kurê me bikujî, ji boyê wî min kurê me heya naha ji te ve art. Êdî mezin bûye, bûye xort, dikare her karê tu diki bike.

Kalê kor dibêje:

— Ez ê çawa bizanibim ew kurê mine?

Pîrê dibêje:

— Tu derkeve ser xanî û di kulekê de ser de bimîze, ku ev xort ber miza te nehele, ew dem tê bizanibî ku kure teye an na.

Miza kalê wek asîte bikeve ser çî ewî derhal dihelîne. Ji bo ku Mîrze Mihemed zerar nebîne, pîrê ewî dixê quncikê xanî û diçe kevirê a tîne datîne bin kulekê. Pa ê dibêje kalê de:

— De ka bimîze!

Dema ku kalê dimîze ser bera , bera di wê demê de dihele diçe. Vê navberê de pîrê merhemeki çêdike dîne serê Mîrze Mihemed dixê, ku kalê kor bêhna wî hilnede. Ji boyê ku pîrê, wê bêhna biyanî wenda bike û wek mîna bêhna kalê kor bêhnekî bide Mîrze Mihemed, wî merhemê serê wî dixê. Kalê dema ku ser xanî peya dibe tê, dibîne ku Mîrze Mihemed neheliyaye û bêhn dike, dibîne ku bêhna biyaniyan jî nayê. Êdî bawer dike ku Mîrze Mihemed kurê wan e.

Mîrze Mihemed êdî dibe kurê wan. Êvarê dibêjê dîya xwe:

— Dayê, sibe zû mîn rake, ezê herim e ber celebê peza. Ne hewceye tu bavê min ji xew rakî. Pîrê dibêje:

— Ka were, ez ji te re bêjim tuyê herî kê derê, neçî kê derê!

Pa ê kalê kor hi yar bû û hat jê re got:

— Madem ku tuyê biçî ber celeb, ger tu van ti ta bizanibî. Du heb mêrg hene. Yek Mêrge Sor e, yek jî Mêrge Re e. Ger tu pêz bibî mêrge re ê, tu carî neçî mêrge sorê! Lewra li Mêrge Sorê, Pîra Mirovxwar heye. Ku tu herî yê çavên te derxe û bi her sê keçên xwe yî mîna wî mirovxwarin, yê te bikujin û bixwin. Zaten çavên min jî, ewî Pîra Mirovxwar derxist.

Mîrze Mihemed, sibe zû radibe û pêz dide pê îya xwe, diçe diçe diçe û tê Mêrge Re ê. Ajalan diçêrîne, têr dike û vedigere malê. Çend rojan wusa berdewam dike. Rojekî jî rojên wiha disa li Mêrge Re ê pêz diçêrîne. Demek derbas dibe nabe, pir mereq a Mêrge Sorê dike. Dibêje, “Ezê herime Mêrge Sorê, kanê ev mêrg çawane û Pîra Mirovxwar çawaye.” Pezê xwe dide pê îya xwe û ber bi Mêrge Sorê ve diçe. Dema ku tê digîhe Mêrge Sorê, dêna xwe didê kanîyek nav mêrgê de ye û sipîndarek jî ber de hê in bûye. Pezê xwe dibe ser kanîyê av dide, pa ê dide pi te rojê. Mîhekî digire, îrê wî dido ê vedixwe. îrê zêde mayî jî ber binê darê de dike. Binê sîha sipîndarê de rudinê. Dinêre Pîra Mirovxwarê por gevel, bihêrs dur ve tê û agir ber pozê wî davêje. Tê nêzîk dibe, dibêje Mîrze Mihemed:

— Ez te asîmana digeriyam, tu rûyê erdê destê min ketî! Bavê te jî mîna te kir, pezê xwe anî nav mêrga min, min lêda her du çavên wî derxis û ew kor kir. Îcar jî dor hatiye te!

Mîrze Mihemed dibêje:

— Ka pîrê were, were neke, xwe aciz neke. Ka were runê, derdê te çiyê, were ji min re bêje. Pîra mîrovxwar dîsa hêrs dibe û dibêje:

— Çawa derdê min çiyê? Tu çawa tê yî mêrga min û pezê xwe lê diçêrînî?

Dema ku pîrê tê cem wî, Mîrze Mihemed dibêje:

— De ka tu çi dibêjî, em ê çi bikin? Pîra Mirovxwar, dike ku derfêtekî bibîne û Mîrze Mihemed bixwe. Lewma dibêj:

— De ka were serê min hineki dixwire, ezê serê xwe daynime ser lingê te, binêre ka çiyê nav porê min de diçe û tê.

Mîrze Mihemed nêçarî dibêje:

— Temam, belê were ez binêrim. Pîrê dema ku bi wî gevela xwe yê mezin ve têt, Mîrze Mihemed çî bibîne! Nav porê wê de tijî gemar, ri k û sipî, mar û mi k ser hev de davêje, dixi xi e û dicivcive. Dema ku Pîrê serê xwe datîne ser lingê Mîrze Mihemed, dest davêje bendikên gorê rîsên pîyê wî de ku heya ser delingên alê xwe de ki andiye û girêdaye. Dike ku bend veke, gora derxe û piyê wi bixwe. Vê navberê de Mîrze Mihemed nêçarî hêwî dike ji Xwedê re û dibêje, “Ey rebbê mînî jorê! Tu dibînî ez çî halîdanîm!” Pa ê ji dara sipîndarê ya ku binî de runi tinê re dibêje:

Darê darê, îrê min binê te de kir

Heke tu pê razî bûyî

Darê darê, bila binê te here jorê

Kulyên te were xarê!

Dema ku Mîrze Mihemed van gotina dibêje dar kulyên xwe berjêr dike, dîne xarê ber serê pîrê. Mîrze Mihemed biskên pîrê yek û yek bi kulyên darê ve girêdide. Di vê navberê de pîrê jî gora piyê wî derdixe û hema hema yê bixwe! Mîrze Mihemed disa hêwi dike û darê re dibêje:

Darê darê, binê te were xarê

Kulyên te here jorê!

Dema ku Mîrze Mihemed van gotina dibêje Pîra Mirovxwar bi gevela xwe ve bi çiqilên darê ve dertê jor û ser serê darê ve daliqandî dimîne. Êdî nikare tu ti tekî bike. Nêçarî û matmayî dibêje:

— Te çî kir, çima wusa kir û vana anî serê mîn!

Mîrze Mihemed xwe davêje nezaniyê û dibêje:

— Min çî kir, ti tek nekir. Min biskê te axên darê ve girêda ku serê te neleqe û ka ez binêrim nav de çî heye, çî diçe û têt. axên darê ji bilind bû, derket jor. Çî bikim ez!

Wê demê Pira Mirovxwar dibêje Mîrze Mihemed:

— Emê nav xwe de peyamekî çêbikin. Tu here mala min, sê keçên min maldenin. Ji keçên min re bêje bila werine li vir. Ku tu van gotinên min bikî, êdî ji

vir ûnde ez ê Mêrge Sorê ji te re serbest bikim. Tu kengî bixwazî pezê xwe tê de biçêrînî.

Lêbelê armanca pîrê ewe ku her sê keçên wê werîn, ewê darê ve vekin û bi keçên xwe ve Mîrze Mihemed bikujin û bixwin. Mîrze Mihemed dibêje pîre:

— Temam ezê herim bangî wan bikim, lêbele ewên çawa ji min bawer bikin? Ka bêje keçên te kêne, çi dikin ku ez bizanibim û ew ji min bawer bikin.

Pîrê dibêje:

— Keça min e mezin îro dewata wê ye, serdewatîyên wê rêdenin. Ya navîn sibê nî ana wê ye û ya pîçuk jî du sibê xwazgîniyê wê yê werin.

Dema ku Pîrê van merc û daxwazên xwe Mîrze Mihemed re dibêje, û salixdana keçên xwe dike, ew jî mercên xwe pîrê re dibêje:

— Belê, de ka tu jî ji min re bêje çavên bavên min li ku derêne.

Pîrê dibêje:

— Mala me de sindoqek heye. Çavên bavê te di wê sindoqêdene.

Mîrze Mihemed dibêje:

— Çavên bavê min, yê çawa qenc bibe û wek berê gerdûna ronî bibîne? Tu vana ji min re nebêjî ez jî mercên te napêjirînim û nakim.

Pîrê dibêje:

— Belê, min pêjirand ert û mercên te. Tu yê herî nav bexçeyê min de çêrek heye. Ji wan çêra du liba biçine. Dema ku te çavên bavê xwe xiste cih de, tu yê her libek ji wê çêrê ser de biki îni. Ew dem çavên bavê te yî kafirê kor, yê qenc bibe û dinya ronî bibîne. Lêbelê, ne be ku dema te çêre ki ande çavên wî tu pê iya wî bisekinî. Bireve xwe bide aliyekî. Lewra çavên wî yê pir zahf biê in û yê kulma bavêje te. Kulmên wî pir giranin ku ji te bigire yê te bikuje!

Mîrze Mihemed radibe ber bi mala Pîra Mirovxwar ve diçe. Dema ku tê malê, dibîne ku keça pîrê ya mirovxwar sîtil tije av kirine û danîne ser kuçikê agir de. Amadehiya dewatê dike. Keça mezin dema ku Mîrze Mihemed di mal de dibîne, pir hêrs dibe. Wek diya xwe dibêje:

— Wey ez te asîman digeriyam, tu ruyê erdê destê min ketî!

Mîrze Mihemed dibêje:

— Ka bisekine keçê! Ez bi zora aqlê xwe nehatime li vir. Dîya te min ande li vir. Got, “here bêje bila amadehiya dewatê bikin, serê xwe bi un. Îro dewata keça mine mezine, sibê û du sibê jî îrnayî û destgirtiya keçên mina navîn û piçuke.” Ji boyê wî diya we got bila destên xwe zû, sivik bigirin û serê xwe bi un.

Dema ku Mîrze Mihemed van gotinan li hev dîne, keça pîrê jê bawer dike. Lewra keçik ji ber xwe ve dibêje: “Heke dêya min ew ne andibûya, ewê ji kuderê re bizanibûya dewat, îrnayî û destgirtiyê me kengêne û heye an tune.”

Dema ku Mîrze Mihemed dibîne keça mezin jê bawer kiriye. Dibêje:

— De zû bike bikeve ser okê, xwe amade bike ez ava te bînim. Dêya te got, “Bila bilez serê xwe bi on û me nedine ermê!”

Keçik bilez dikeve ser okê. Mîrze Mihemed tafîl sîtila ava xa yayî dînê û ser keça mirovxwar de dike. Keçê disote, diranê wê wek ku bikene ber ewitandinê derdikeve der ve. Mîrze Mihemed diçe bangî keça navîn dike, dibê:

— Were xû ka te ya mezin serê xwe u t, bilez tu jî here bikeve ser okê.

Keça navîn dema dikeve ser okê de, xweha xwe wusa diranê wî der ve dibîne, dibêje qey xweha wê dikene. Lewma dibêje:

— Bêlo me be! Qet erm nake. Êêê...! Ku dewata min be ezê jî wusa kêfxwe bim û diranê min ê wusa be bikin!

Ev gotin, hê dev de Mîrze Mihemed ava kelandî ser serê wê de jî dike û ewê jî di ewitîne. Keça biçuk jî dîne û wusa dikuje. Her waha her sê keçên Pîra Mirovxwar jî dikuje. Pa ê diçe çavên bavê xwe ji sindoqê derdixe. Dîçe di bexçe de jî du çêre digre û rê dikeve. Dema ku tê binê sipîndarê, dibîne ku pîrê hê pêve daliqiyayîye. Pîra Mirovxwar dibêje:

— Kanêne keçên mîn, te çima wan neanîne?

Wê demê Mîrze Mihemed dek û ramanên pîrê û yên xwe û bi ser de kirinên xwe e kere dike. Dibêje:

— Min keçên te ku tin.



Pîra Mirovxwar dema van gotinan guhdar dike pirî ku hêrs dibe û nikare ti tekî bike, di cihê xwe de diqehire û dimirê.

Êdî hema hema ro diçe ava û sîha bejna mirov nayê gavkirin. Mîrze Mihemed, pezên xwe dicivîne hev û çavên bavê xwe hildide û diçe malê. Dema ku tê malê, bavê wî jî destvala nû ji nêçîrê hatiye. Dibihîze ku dema diya wî ji nêçîre dipirse, bavê wî dibêje:

— Nêçîra çî halê çî, nêçîra kora yê çawabe?

Ew dem Mîrze Mihemed çavên bavê xwe derdixe holê û dibêje:

— Va ye çavên te!

Pa ê çavên bavê xwe dixwe kortên çavê wî, xwe dide aliyekî û wan her du çêra diki îne ser çavên bavê xwe. Bavê wî hirmijî û ber ê a wî kulmên zexim avête Mîrze Mihemed, lêbelê ji ber ku wî xwe ve artibû, jê negirt. Hekena yê ber kulmên wî bihata ku tin! Ser re demeke kurt derbas bû nebû, çavên bavê wî ba bûn. Dê û bavê wî heyirîn, a man! Gotin:

— Kurê me ka bêje te vana ji ku û çawa aniye?

Mîrze Mihemed jî di serê wî de çî derbas bûye, navbera wî û Pîra Mirovxwar de çî qewimiye ji wan re dibêje. Çawa pîrê, keçên wî ku tiye û mêrga sor hildaye, yeko yeko ji wan re dibêje û ser ve dike:

— Mêrga Re jî Mêrga Sor jî vir unda ya me ye. Em çawa bixwazin emê wusa pezên xwe bê tirs berdinê û biçêrînin.

Dê û bavê wî pir kêfxwe dibin, kurên xwe pîroz dikin û hemd dikin ji Xwedê re kû kurekî wanî wusa jêhatî û çak he ye.

Sibetirê dema ku hê roj hilnehatiye, Mîrze Mihemed radibe ku pêz bibe çêrandinê. Dibîne ku bavê wî pê iya wî rabûye û amadehiya xwe kiriye ku here ber pêz. Bavê wî dema Mîrze Mihemed dibîne dibêje:

— Kurê min êdî çavên min dibînin, Mêrga Sor jî ya me ye. Tu talûke û xetere jî nemaye, lewma ji vir un de ezê herime ber pêz. Tu hinekî kêfa xwe binêre, bigere û ji xwe re here neçîrê.

Pa ê kalê pez dide pê ya xwe dibê ku biçêrîne. Mîrze Mihemed jî malê dimîne. Diçe digere, neçîr dike tê. Lêbelê zilamekî mîna wî zû zû naweste, ranaweste û cihê xwe de nasekine. Rojekî dema di nav malê de digere, sê derî yê kilîtîkirî bala wî diki îne! Ji dayika xwe dipirse:

— Ka ew derge çima girtîne û nayêne vekirinê; di pi ta wan deriya de çi heye, ew derî vedibine ku derê?

Dayika wî pê îyê dibêje:

— Kurê min sual neke, nepirse!

Lê dêya wî ji boyê ku zane Mîrze Mihemed pir merakdar û hewasdare, dibêje:

— Kurê min qet tu tekî jî tune ye di pi t wan deriya de. Bitenê kerûper, pirtpal, kelmelen min û bavê tene. Kêrî tu ti tî nayên, bi salane di wir denin û tu kes ser de neçûye. Nav toz û gemarêdene. Ne be ku tu bikevî hundir!

Mîrze Mihemed çiqas bixwaze binêre jî naxwaze dêya xwe aciz bike û vê gavê dev jê berdide.

Rojekî ji rojan dibêje dayika xwe:

— Dayê, tu zanî ku bavê min nizane ez di rastiye de kure wi yî ne helalim! Lê tu zanî ku malbateke min heye. Min pir bêriya welêt, bajar, dê û bavê xwe kiriye. Ku destûra te hebe û tu rê bidî min, ezê herim serîkî bidim wan. Ka halê wan çiyê, çi qewimiye? Lewra dema min wan hî t, ne demeka ba bû, bûyerên nedîtî diqewimîn! Çiqas wana destê xwe ji min kiribe jî, ezê herim.

Dayika wî difikire, kurt direj dipêve, pa ê destûra çûbûna wî dide. Dayika wî dibêje:

— Lêbelê ez te tenê rênakim, na înim. Ezê bi te re ti tekî daynim, ti tekî birêkim.

Mîrze Mihemed dibêje:

— Çiyê ku tê bi min re bi înf?

Pîra dayika wî diçe di hundur de sindoqekî dîne. Dema ku bi ivikeke dara hinarê lêdixe, ji hundurê sindoqê du teji dertên holê, destxwe re peyda dibin. Ji tejiyan yek bi guhe, yek jî bê guhe. Dayika wî dibê jê:

— Evana yê ba tebin. Dema ku tu ketî tengasiyekî; kuderê be, çi çaxî be tu bangî wan bikî, ew her du tejiyên ba te yê peyda bibin. Yê mihefiziya te bikin, te biparêzin.

Mîrze Mihemed dibêje:

— Temam dayê, tu çava dixwazî bila wusa be.

### **Be a Sêyemin**

Mîrze Mihemed dema ku dayika wî îznê didê û rê dikeve, diçe diçe diçe û tê nêzîkî bajarê bav û kalê xwe. Ser qelaçekî disekine û bajêr mêze dike. Lêbelê ji bajêr tu deng nayê û wek bajarekî xirabeyî vike valaye. Kesek tune, mirovek jî tê de dîyar nine. Pir xemgîn dibe. Dilê wî di ewite. Li çokê xwe dixê û dibêje xwezî ez neçûbama, min wan neterikanda! Pa ê tê nêzîktir; çi bibîne! Dibîne bitenê jineke zexim daye peyê pisîkekî û kuçe kuçe, kolan kolan direvîne. Pisîk ji tîrsa carê xwe davêje derfeyeki dixê ku xwe xelaske.

Mîrze Mihemed dût ve bang dike, dibêje:

— Heey! Tu kê yî, çi kesî berdidî wê pisîka reben?

Jînik, ber dengê mirovekî ku hate guhê wê mat dimîne. Radiweste û berê xwe dide Mîrze Mihemed, dibêje:

— Tu keyî, tu çi kesî?

Mîrze Mihemed dibêje:

— Ez ji vî bajarî me, kurê padî ahim.

Dema ku Mîrze Mihemed dibêje ez kurê padî ahim, keçik dibêje:

— Were were birayê min. Em xu k û birayê hevin. Ez jî keça padî ahim.

Mîrze Mihemed ber bi keça xwîrt ve çû, nêzîk bûyê. Dema ku hate ba keça xwîrt, keçe gotê:

— Bira, ev du sê roje min tu ti tekî nexwariye, ez birçîme û ez dixwazim te bixwim.

Mîrze Mihemed dibêje:

— Çawa dibe ti tê waha?

Keça xû ka wî dibêje:

— Ez nikarim xwe zeft bikim, nikarim xwe bigrim. Min dê û bavê xwe û hemu bajar xwariye! Ev du sê roje ti tek nemaye ku ez bixwim. Ev pisîk mabû ku ez bixwim, lê te bangî min kir û ew jî destê mîn xelas bû. Tu tenê mayî destê min de bira, ezê te bixwim!

Dema ku keç nêzîk bû, Mîrze Mihemed tiliya wê ya qilîçê dit ku serê wî qutandî ye. Ew dem aqlê wî hate serê wî. Ser ket ku nûha çî qas rew eke talûke û xetere de ye. Dema ku hê bajar, dê û bavê xwe neterikandibû, keçeke xû ka wî nû hatibû dinê. Hê sê roj bû kû hatibû dinê, lê ew hersê roj jî pez dewar û hespên wan hatibûn ku tin û xwarin. Di ser cendekê wan ajalan de una devê bebikekî hebû û dema bi xwe çûbû nobedariye, ûr kê andibû, lêxistibû serê tiliya qilîçê ya bebikekî jêkiribû. Ji bebika nû bibû, ketibû ikê lê nehî tibûn bebikê bibîne. Ê qet nedîtibû xweha xwe, lewra hê çil rojî nebibû û nedihê tin mêr ewê bibînin. Niha jî ev keça xwirte mirovxwar di bajêr de kes nehî tiye. Yê revî reviyaye yê ku maye hemu xwariye. Ê niha jî bitiliya xwe ya kilîçê ya jêkirî hemberê wî sekiniye û dibêje:

— Ez birçîme ez dixwazim te bixwim!

Mîrze Mihemed, dibêje keça mirovxwar:

— Temam, tu min dixwî bixwe. Lêbelê daxwazeke min ji te heye. Ku te ew anî cih êdî tu zanî, tu min dixwî bixwe an naxwî nexwe. Ez zû ve ye ku bajêr derketibûm çûbûm. Min bêriya dê û bavê xwe kiriye. Lê niha te wana xwariye. Ez pir xemgînîm. Ez dixwazim derême ser xanî û sê sitrana bêjim, îna dê û bavê xwe bigrim. Ger tu evî ji min re zehf nebînî!

Xû ka wî ye mirovxwar dibêje:

— Temam, de zû bike lewra ez birçîme!

Mîrze Mihemed dema ku derdikeve ser xênî bilez al, gore û solên xwe derdixe. Du dara delingê al re dike, gora diki îne ser û pêlavan ser goran re dike. Ê ser xênî re dadiliqîne. Pa ê bangî keça mirovxwar dike, dibêje:

— Wa ye min pê xwe daliqandiye jêr ku tu nebêjî, “birayê min, min xapand, leyisk anî serê min û revî çû!”

Pa ê alê bi gore û pêlav pêkirî ber jêr de dadiliqîne, moriya zar jî datîne rexê wî. Morîya zar wek dengê wî disitirîne, sitranan dibêje. Mîrze Mihemed, dema ku vê leyîstkê dike pa ê bilez dizîka ve direve diçe. Moriya zar sitranek du sitran sê sitran dibêje û berdevam dike; pênc, e sitranan disitirîne. Keça mirovxwar êdî xwe zeft nake, nikare ber xwe bide. Digre wî pê yî ka ê jêr dike ku Mîrze Mihemed bixwe! Lêbelê çi bibîne! Dar û alê wî! Ew dem pir hêrs dibe. Dibêje:

— Hêêy bê aqilo! Tu dibê qey, tu ê ji destê min xelas bibî!

Ê wek biruskê dide peyê Mîrze Mihemed. Heya xû ka Mîrze Mihemed ya mirovxwar pê dihise ku ew reviyê, Mîrze Mihemed kort û newalan derbas dibe û pa ya xwe dihêle. Lê dema ku dizivire pa ya xwe dinere çi bibîne, xweha wî wek biruskê hima hima wê ye daye peyê wî! Mîrze Mihemed dike hinekî jî zû here lê hêz û taqet di wî de nema ye. Jixwe xweha wî hema hema nêzîkî wî bibû jî. Wê demê Mîrze Mihemed, dêhna xwe dayê ser girekî darek heye. Bilez revî çû derkete ser darê. Keça mirovxwar hat dev û dora darê geriya. Kir nekir ji boyê ku pir qelew û zexim bû, nikaribû derkeve ser darê. Wê demê dest bi kotina koka darê kir û da ber leqa.

Mîrze Mihemed dît kû êdî ji destê wî tu ti tek nayê. Destê xu ka xweye mirovxwar xelas nabe. Fikirî fikirî pa ê ni ka ve xwe bixwe re got:

— De dayika mine pîr, du tejjî dabû min, ku ez li ku bim jî ketime tengasiyê, ew werine alîkariya min! Êdî destê min ti tek nayê, kanê ez gazî wan bikim yê werin an nayên!

Destê xwe da ber devê xwe û bangî tejjyan kir:

— Hooo tejjî, hooo tejjî, hooo tejjî!

Dema ku Mîrze Mihemed bang kir, tejjyê bê guh dibêje:

— Dengê xwediyê me hat min!

Tejiyê bigûh dibêje:

— Kero! Ez bi guhim û tu bê guhî. Çawa deng tê te û na yê min?

Tajiyê bê guh dibêje:

— Hu be û guh bidê!

Ew dem tejî yê bi guh dengê Mîrze Mihemed dibihîze. Di heman demê de binê darê peyda dibin û dora keça mirovxwar diçin tên û digirjinê! Lêbelê heya ku xwediyê wan destur nade û i aret nake, wusa disekin. Pa ê Mîrze Mihemed î aret dike û tejiya berdidê. Tajî xwe davêjine keça mirovxwar, her yek çîpeke wê digire û perçe perçeyî dikan.

### **Be a Çaremîn**

Dema ku tejî keça mirovxwar dikujin û pirtî pirtî dikan, Mîrze Mihemed dikeve rê û disa vedigere mala dayike pîra xwe ye ku bibû kurê wan. Hal û meseleyên ku serê wî de derbas bibûn yeko yeko ji dayika xwe re dibêje. Çawa ew xu ka wî bûye mirovxwar û bajêr bela wela kiriye. Lêdaye dê û bavê wî û di bajêr de çiqas mirov û heywan û ajal hene hemu xwariye. Hê ser de jî xwastiye ewî jî bixwe! Lê çawa destê wî xelas bûye û bi tejiyan çawa ew daye perçe kirin! Dêpîra wî dema ku dibihîze tejiyan xu ka wî perçekirine, dibêje:

— Kurê min te wusa nekira, xu ka te bû, guneh bû.

Mîrze Mihemed dibêje:

— Mîn xwe jê xelas nekir! Mîn çî kir jî ewê da peyê min ji boyê ku min bixwe. Mixabin êdî ji destê min xêncî ku tina wê tu ti tek nemabû.

Pa ê Mîrze Mihemed berê xwe dide pîrê dibêje:

— Êdî kesî min tune. Ne dê û bavê min ne gund û bajarê min; hebe tunebe tu û bavê min hene. Ji vir waha ezê ba we bim. Hun çî bêjin ezê gotina we bikim.

Dayika wî bi van gotinan pir kêfxwe û kamran dibe.

Rojek du roj sê roj wusa derbas dibe. Mîrze Mihemed tê ba dayika xwe dibêje:

— Ez wan sê deriyê kilît kirî pir meraq dikim. Wan her sê odeyan de çi heye! Ez dixwazim wan a mêze bikim!

Dayika wî disa ber dilê wî digere. Dibêje:

— Kurê min; neke, ti tekî ku kêrî te were tune. Tu yê çi ji wan odayan bikî, were van gotin û meraqa xwe biterikîne! Kafirê bavê te bibihîze yê min jî te jî bikujê.

Mîrze Mihemed ew roj dev jê berdide. Lêbelê cihê xwe de nasêkine. Rojêke din dîsa diçe ba dayika xwe û dibêje:

— Kilîta wan mezela li kuderêne, bide min ezê bitenê binêrim û derkevim. Destê xwe nadime ti tekî. Ku em ji bavê min re nebêjin, ewê kuderê ve bizanibe.

Dayika wî fem dike ku xwe ji Mîrze Mihemed xelas nake. Dinêre Mîrze Mihemed roj bi roj hê zêdetir meraqa wan odayên deriyê wan kilît kirî dike û ber xwe dikeve! Dibêje:

— Temam kurê min. Ezê cihê kilîtên deriyên ji te re bêjim. Lêbelê tu yê jî sozekî, peyamekî bidî min. Dema ku tu ketî hundirê wan odeyan, tu destê xwe nadî tu ti tekî! Lewra kê dest li ti tekî bixe, kafirê bavê te pê dizane! Ez naxwazim ti tekî wusa bibe sedema ku tina te!

Mîrze Mihemed gotina dayika xwe dipêjirîne. Dibêje:

— Sozbe, bila sozê mêrê berê be ku ez destê xwe nadime ti tekî!

Pa ê dayika wî jê re dibêje:

— Kurê min, kilîta wan deriya cem bavê te ye û nava rîhê bavê te de ne. Bitenê bavê te xew de be, mirov dikare wan kilîta bigre. Xêncî wî mumkunata wî tune.

Mîrze Mihemed pir dil a dibe. Dayika xwe re dibêje:

— Ezê çawa wê kilîtê nava riyê bavê xwe hildim?

Ew dem dayika wî dibêje:

— Kurê min dema bavê te çû raza, tê hêdika herî ba wî bisekinî. Tu yê ba mêzekî û ba guhê xwe bidî yê. Heke xwerini jê were, bizanibe ku ew ranezaye. Nebe ku tu dest bavêjî kilîtê. Bi xwedê yê di wê demêde te bikuje! Heke te guh dayê xwire xwir jê nayê, hema hêdîka kilîtê ji nav rihê wî hilde û dût keve!

Mîrze Mihemed ew ev dema ku bavê wî diçe ji bo razanê, ew jî demekî disekine û pa ê diçe oda bavê xwe. Çawa dayika wî jê re gotibû guhê xwe ba dayê, tu deng ji bavê wî nedihat. Evnî ana razayîbûna wî bû. Mîrze Mihemed, kere ker kilîta nav rihê wî de hildide û ji oda wî derdikeve. Diçe deriyê oda yekem vedike çi bibîne! irinî û gu e gu a kanîyeke ava zêr e; diki e û diherike, ser hevdu re davêje. Mat dimîne û heyran heyran dinihêre! Dibêje:

— Nexwe bavê min lewma nahêle kesek ser vê odê keve!

Pa ê diçe deriyê duyem vedike. Çi bibîne! Di vê odeyê de jî ire ir û gu e gu a ava zîvê ye, diherike û diki e. Dîsa dibêje:

— Nexwe bavê min lewma nahêle kesek ser vê odê keve!

Ji wir jî dertê û deriyê sêyem vedike. Dema ku dikeve hundurê odê, dêna xwe didê hespêkî kihêl di nava odeyê de ne. Disa wek berê dibêje:

— Nexwe bavê min lewma nahêle kesek ser vê odê keve!

Destê xwe nade tu ti tekî. Deriyê her sê odêyan digire. Lêbêlê deriyan kilit nakê. Pa ê kilita deriyan dibe wek berê datîne nav riyê bavê xwe. Bixwe ji diçe dikeve nav nivînê xwe û radizê.

Bavê Mîrze Mihemed sibe zû radibe, pêz dide pê iya xwe ku bibe Mêrge Sorê biçêrîne. Dema ew derket, Mîrze Mihemed jî radibe û raste rast diçe oda ku kaniya zêrîn tê de diçilwile, dityêse û diherike. Dikeve hundur û xwe ava zêrînde dike. Pa ê diçe oda din xwe kaniya zîvê dixê. Dema ku xwe avên zêr û ya zîv dixê û dertê, rewnak dide. Belê, wek rojê dibiriqe! Her der ber i qa wî ronî dibe. Wê demê Mîrze Mihemed radibe diçe ba dayika xwe. Hal meseleyên xwe jê re dibêje. Dayika wî dema ku wusa ronak dibîne, pê dihise ku ewî çi kiriye û çi nekiriye. Dibeje:

— Kurê min te çima wusa kir! Daxwazeke me ye dinê hebû ku kurekî me hebe. Tu bixwe peyda bûyî û hatî. Tu bûyî kurê me, em jî bûne dê û bavê te. Te çima



waha kir; serê min û serê xwe xiste belayê! Tu nizanî, bavê te haya wî yê pê çêbe, yê te jî min jî bikuje!

Mîrze Mihemed di nav po maniyê de dibêje:

— Êdî min kir, dev jê berde.

Pa ê dayika wî dibêje wî:

— Here, oda sêyemin de hespê kihêl hilde bîne. Mecbûr ezê te re bêjim ka tê çi bikî û çi nekî. Êdî tu nikarî li vir bimîni. Bavê te çawa were, yê bê pirs û sual te jî min jî bikuje. Tu bireve here! Ezê jî mecbur bêjim haya min ji ti tekî tune ye ku min nekuje! Bitenê ew hespê kihêl bibe nebe yê te destê kafirê bavê te xilas bike. Ew hesp, hespê ba û birûskê ye. Dema ku diçe, dibêje bayê sibê û êvarê, “hun hêdi diçin”. Xwe ser wan re dike diçe. Dibêje birûskê, “heya tu ronî bîdî, ezê pê iya roniya te bikevim.”

Pîrê disa dibêje Mîrze Mihemed:

— Dema ku tu bi hespê ba û birûskê ve rê ketî, bavê te yê kafir li ku be jî yê bizanibe ku ew toza rabûye, toza berlingê hespê ba û birûskê ye. Disa yê evî jî bizanibe ku tu ketiyî wan her sê odayên wî. Lewma dûr ve be jî, ewê roniya ku ji te tê bibîne. Ew çax bitenê armançeke wî yê hebe, ew jî ku tina te ye! Nebî nebî tu bisekinî û pa iya xwe binêrî! Lewra ewa yê jî kerê ûnkê Sêpê sêwarbe û bide peyê te. Kerê ûnkê Sêpê ew kere ku tu ti tek li ser rûyê erdê tune ku pê iya wî bikeve û jê derbas bibe. Ji boyê vê ezê sê ti tê bi sêhr bidime te. Ku tu wana bikar bînî, dibe ku tu ji destê wî xwe xilaskî.

Dayika pîrê diçe hêsanekî, eyek û kerekî xwêy dîne, dide Mîrze Mihemed. Dibêje:

— Kurê min! Dema ku tu bi hespê ba û birûskê reviyayî, kafirê bavê te jî dê bi kerê ûnkê Sêpê bide peyê te. Ku ew nêzî te bû, navbera we ber bi xelasbûnê be, evî xwêyê bavêje pê iya wî. Ewa yê bibe behreke mezin. Tu nesekine, bireve. Ewê bide behrê heya jê xelas be, tu yê durkevî. Ku ew behrê xelasbû, nêzîkî te bu wê demê e bavêje rêya wî. Ew e yê bibe têt û dirî. Tu nesekine û bireve. Heya ku ew bi kerê ûnkê Sêpê ve wan têt û dirîya xelas bibe, tu yê êpê dîr bikevî. Bavê te yê kafir, ser kerê ûnkê sêpê ez zanim dê dîsa bigihêje te, ew dem tu hêsan bavêje pê iya wan.

Hêsanê bibe Çiyayê Kubarê. Ezê hêwî bikim ku ew ji çiya yê kubarê derbas nebin û tê de asêl bibin!”

Pa ê Mîrze Mihemed çû hespê ba û birûskê anî. Ji dayika xwe helalî xwest ku êdî derkeve rê. Diya wi gotê:

— Here lewê min! Heqê û mafê me te re xwe helal be! Rêya te vekirî be û Xwedê mirazê te bike.

Di dawiyê de jî van gotinan ser ve dike:

— Bîr neke! Ku tu ji destê bavê xwe yê kafir xelas bûyî, ji dêla hespê xwe du mûyan biki îne. Çi cihê û welatî be, çi dinyak be; tu wan mûyan hev bixî, hespê te yê ba û birûskê de hemberê te peyda bibe.

Mîrze Mihemed, hespê ba û birûskê sêwar dibe, derdikeve rê. Dema ku hespê ba û birûskê dide çargaviya, ba dibêje:

— Ew çî ti t bû ber me re firiya û çû!

Dema ku birûskê lêda, ew pê iya roniya wî ket!

Em werine dora bavê Mîrze Mihemed. Ew jî pêz berdabû Mêrge Sorê û nêçîrî dikir. Demek unde dêna xwe dayê aliyê mala wî de tozek rabûye û bi ronîke wek tavê avêtiye erd û esîmana û dûr dikeve. Pir hêrsa wî te. Lewra dizane ku Mîrze Mihemed ketiye wan her sê odayên wî. Xwe ava zêr û zîv de kiriye. Pa ê jî hespê wî yê ba û birûskê hildaye û direve. Dibêje:

— Ma qey êdî tu dikarî xwe ji destê min xelas bikî! Ger te ev bêbextiya min re nekira!

Dest xwe de kerê xwe yê ûnkê Sêpê siwar dibe û dide peyê Mîrze Mihemed. Mîrze Mihemed dema ku pa iya xwe dinêre, dibîne ku siwarekî ji wî zûtir, kerekî ji hespê wî lezgîntir daye peyê wî! Xwe bi xwe re dibêje:

— Bi Xwedê evê hebe nebe bavê min e!

Demek ûnde kerê ûnkê Sêpê hema hema xwe digihîne hespê ba û brûskê. Lewra ji bo yê wî bû ku ji wî re digotin ûnkê Sêpê. Wê demê Mîrze Mihemed xwê ya dayika wî dabûyê derxist û avête pê iya wan. Ew xwêy dest xwere bû behreke mezin! Mîrze Mihemed neseqinî bilez çû. Bavê wî da behrê, heya ku ji behrê xelas bû, Mîrze

Mihemed êpê dûr ket. Disa hat hat gihiya wî. Mîrze Mihemed vê carê e avête pê iya wan. Ew e bû têt û dirî. Li wan aliya! Devê wî hat pa iyê, quna wî çû pê iya wî. Mîrze Mihemed nesekini, çû ku xwe ji destê bavê xwe yê kafir xelas bike. Ew bi zorê be jî ji wan têt û diriyane xelasbûn. Dîsa hatin gihiyane Mîrze Mihemed. Wî got:

— Tu îcar qet ji destê min xelas dibî!

Nizanibû ku pîrê pilana mezin je re gotiye. We demê Mîrze Mihemed, derxist hêsan, avête pê iya wan. Ew hêsan pê iya bavê wî û kerê ûnkê Sêpê bû çiyakî mezin, bû Çiyayê Kubarê. Ew çiqas pê ve hilpas bûn iqitîn ketine jêr. Kirin nekirin nikaribûn jê derbas bibin. Ew dem bavê Mîrze Mihemed, bangî wî dike. Dibêje:

— Here, kû tu çuyî jî! Lê nebêje eva hunerê min bû, eve bi aqilê min bû. Evana fend û fêle min bûn. Evane ne ji te bûn. Tu qurbana binê pê wê be ku yê vana ji te re gotiye

### **Be a Pêncemîn**

Mîrze Mihemed dema ji bavê xwe yê kafir xelas dibe, diçe diçe diçe; tê memleketeki din, cihek, dinyak din. Berê xwe didê ivanek e, birek pêzê wî ye û pez diçêrin, ivan jî ber pêz e. Dibêje ivan:

— Bereket be ivano!

— ivan jî dibêje:

— Bereket be, ser çava re hatî, rihmet dê û bavê te be.

Mîrze Mihemed dibêje,

— ivano, ji min re pezek lazime! Tu pezekî nafro î min? ivan, dibêje:

— Bilabe. Ezê bifiro im.

Mîrze Mihemed dibêje:

— Tu çend zêra dixwazî?

ivan:

— Sê zêran dixwazim.

Mîrze Mihemed dema ku çûbû ser kanîya zêr û zîva, pa ila xwe tije zêr kiribû. Dibêje:

— Ha ji te re deh zêr. Bila go tê wê jî ji te re be.

ivan mat dimîne. Dibêje:

— Madem wusaye tu ji boyê çî vê mîhê dikirî?

Mîrze Mihemed dibêje:

— ivan bitenê hûre wê ji min re hewceye.

Pa ê mîhekî dîne, serjê dike. Go tê wê dide ivan, hûrê wê paqij dike di o. Pa ê dide ber tavê heya ku hinekî hi kbû, ewî hûrî hildide du kunan vedike. Ji bo yê ku ew ronî nede. Kes ewî nasneke, nebêje ev kîye û çakîye! Wî ronîya ser çavê xwe, rûyê xwe ve êre, ewî hûrî diki îne serê xwe.

Mîrze Mihemed dema ku hûr ki ande ser serê xwe, êdî ronîya wî nedihate xuyakirin û bala mirova nediki ande ser xwe. Kete rê û çû. Çû çû rexê bajarekî, dêna xwe dayê kolikeke qazan wê dere heye û mirovek jî ber kolikêye. Gote mêrik:

— Selam elêkim.

Mêrik jî got:

— Elêkim selam.

Mîrze Mihemed gotê:

— Tu kêyî, çikese?

Mêrik dibê:

— Ez xulamê pa dî ahê vê bajarê me.

— Li vir çî kar dikî?

Mêrik dibêje:

— Ez qazvanîm, ber qazê padî ahim.

Pa ê Mîrze Mihemed dipirse dibêje:

— Cihê te heye, tu dikarî mêvaneki bihewînî?

Mêrik dibêje:

— Ez dikarim mêvana bihebînim.

Ew û Mîrze Mihemed ber bi qazan ve diçin. Dema ku dime in, mêrik Mîrze Mihemed re dibêje:

— Ezê herime ba padî ah jêra bêjim, “Ez êdî kal bûme. Min ji te re qazvanek dîtiye. Ger tu bixwazî bila ew, ji vir waha qazvaniyê bike.”

Pa ê mêrik diçe ba padî ah. Jê re dibêje:

— Hun zanin ku êdî ez kalemêrim, pîremêrim. Ez êdî nikarim ber bêhna qazan û qir etersê qazan bimînim. Min ji we re qazvanek dîtiye. Zilamekî cahile, rebene û xerîbe. Jixwe ez nikarim ber wan bisekinim, tenê ew bikaribe berê xwe bide wan û ba wan razê.

Padî ah dibîne ku êdî qazvanê pîremêr nikare wî karî bitenê bike, lewma gotina wî dipêjirîne û dibêje:

— Bila wek gotina te be û êdî ew bila bibe qazvanê me.

Êdî deh roj be, mehek be an jî salek be dem derbas dibe, qazvanê me ber qazan e. Xidamên padî ah jê re xwarin û vexwarin amade dikin û ratiba wî dibin û dînin. Îcar em derbasî mala padî ah bibin. Sê keçên padî ah hebûn. Keça mezin dema wê ya zewacê derbas bibû. Ya nav îna dema wê hema hema derbas dibû. Lê ya piçuk nû gihi tibû ûkirinê, dema zewacê. Rojekî wezîrên padî ah civiyan berhev û gotin:

— Em dibînin ku keçên padî ah êdî xamane û dema wane mêrkirinê hatiye û derbas dibe. Lêbelê gelo emê evî çawa bêjine padî ah, “keçên te dema wane zewacê derbas bûye!”

Pa ê rabûn sê hêk anîn û boyaxkirin. Ji wan hêkan yekî zer, yekî sor û yekî jî kesk boyaxkirin; xistine siniyekî û bîrîn danîne ser sofraya padî ah. Dema ku padî ah dest avête hêkan ku bixwe, wezîrekî got:

— Padî ahê min, ez xulam! Ev hêk ne yên xwarinêne, me'neyek, wateyek wan heye.

Padî ah got:

— Me'neya wan çiyê, ka ji min re bêjin.

Wezîr got:

— Ev her sê hêk keçên te ne. Ya zer ji û derbas bûye, ya sor hema hema dê derbas bibe, ya kesk dem dema wê ye.

Padî ah got:

— Ê ba e, emê çi bikin?

— Dîbêjin ger tu keçên xwe bidî mêr.

Padî ah dibêje:

— Emê çawa bikin?

Wezîr dîbêjin:

— Hun herin ji keçên xwe bipirsin. Bila bi gorî dilê xwe bizewicin.

Padî ah jî ev pê niyara wezîrên xwe pêjirand.

Dema ku hê padî ah jî wan nepirsîbû û fikra wane zewacê hê hilnedabû, wan rojan jî keça piçûk pir bêhteng bû. Dî wê bêhtengiyê de heskir ku derkeve derve. Ji boy wî gote xidama bavê xwe yê ku ji bo yê qazvan ratîbê dibe ku ew cihê wê de ji qazvan re xwarin û vexwarinê bibe. Keça piçûk ratîb hilda û kete rê. Dema ku gihî te cihê qazan, dit ku tî tek di nav hewza avê de rewneqê dide devûdora xwe. Wê demê keçikê xwe vedizî, cihe xwe de sekinî, xwe nusand û mêzekir. Dît ku xortekî ciwan di nav hewzê de xwe di o û ronîya wî dîde her derî. Keçikê xwe bi xwe re got: “Bila tu rewneqê bidî. Ka emê bibînîn tu kê yî kê nînî. Ger tu mirovekî bi esil bî, biaqil û jêhatî bî, dema tu ji hewzê derketî, divê tu xwe bi pêjgîrê ziwa bikî û pa ê tu yê kincên xwe xwebikî. Lêbelê ger tu mirovekî ne esil bî, pi tî u tinê, tu yê kincên xwe ile il xwebikî.” Keçik hinekî sekinî pa ê dît ku dema ew xort ji hewzê derket, pê iye xwe bi pêjgîrekî ziwakir û pa ê kerhurkek xiste serê xwe û kincên xwe yê pînekirî xwekir. Pa e keça piçûk serket ku ev kes qazvanê wane. Lêva xwe geskir û got:

— Hiiimmm tu eveyî, tu naxwazî kes te nasbike. Lewma tu xwe vedi êrî, xwe nî anê kesekî nadî!

Xwarinê hilda wek ku haya wê bi ti tekî tune ye çû ba qazvan. Xwarina wî dayê û got:

— Ha ji te ra ratiba ku ji bo te hatiye iyandin.

Tu ti tek jê re negot, vegeriya çû qesra bavê xwe. Ji kesekî re jî qala ti tekî nekir.

Dema ku padî ah çû ba keçên xwe ji wan pirsî, ka çawa dixwazin ku mêrbikin. Keçên wî jî gotin:

— Bila agahî bidin hemu bajarî, çiqas xort, civan hene bila werin ber berbana qesra me re derbas bibin. Ên ku tên bila cilên xwe yê paqij xwekin; yê ku hespê wî heye bila bi hesp, yê ku kerê wî heye bila bi ker, yê ku ti tekî wî tunebe jî bila bi piyê xwe werin, derbas bibin. Ew dem her yekê me yê sêvekî bide destê xwe. Me kê ecibandiye, dilê kê ketiye kê, bila sêva xwe bavêje navmilê wî bixe.

Padî ah gotina keçên xwe pêjiran û got:

— Ev gotina we ti tekî gelek maqule û cindîye.

Bangî zilamên xwe kir. Ji zilamên xwe re got:

— Herin hemu bajarî agahdar bikin û fermana min ji wan re bibêjin.

Delalên padî ah çûn kuçe kolanên bajêr geriyan û hemu meydanan de fermana padî ah xwendin:

— Hey mirovno! Kesek bila nebêje min nebihîst. Herkes bila guhdar bibe, yê ku guhdar kiriye bila ji yê ku guhdar nekiriye re bibêjin. Herkes bila xwe çêbike, yên ku tên bila cilên xwe yê paqij xwekin, yê ku hespê wî heye bila bi hesp, yê ku kerê wî heye bila bi ker, yê ku ti tekî wî tunebe jî bila bi piyê xwe ve werin. Keçên padî ahê dê berbanê rawestin. Herkesê bin berbanê re derbas bibe. Keça bi sêvên xwe nav pi ta kê nî an da, ew dê bi wê keçê re bizewice. Zilaman xwe çê kir, kincên xweyê daweta û ahiya xwe kirin, xwe bedew û cindî kirin ji bo yê ku dilên keçên padî ah bikeve wan. Pa ê yek û yek hatin bin berbanê re derbasbûn. Keça padî ah a mezin sêva xwe avêt navmilê kurê wezîrê milê rastê xist, keça navîn jî sêva xwe avêt navmilê kurê wezîrê milê çepê xist. Lêbelê keça piçuk ew roj sêva xwe neavête kesekî. Roja din jî zilam dîsa hatin derbasbûn, lêbelê keçê dîsa sêva xwe pi ta kesekî neda. Dema ku keça piçuk sêva xwe neavête kesekî, evî bala herkesê û padî ah jî ki and. Padî ah got:

— Ka binêrin kesek maye an nemaye yên we gazînekiriyê.

Gotin:

— Na! Me bangî herkesî kiriye. Lêbelê bitenê kerhurkê qazvanê we nehatiye.

Padî ah dîbeje:

— Gazî wî jî bikin, bila kesek nemîne, herkes were derbas bibe.

Qasidê padî ah çûn ba qazvan û agahî danê. Herkes nava meraqeke mezin de hêviya keça piçûke, ka yê çî bike. Lewra hinde ciwanên mezin, dewlemend hatin û çûn, keçê sêva xwe pi ta kesekî neda. Demek derbas bû, dêna xwe danê, ser pî ta kerekê dikule mirovek tê. Serserê xwe de kerhurkek ki andiye û mê an jî devûdora wî gîrtîye û guveguya mê ane. Kincê pîne kirî, kerê kulek, di serî de hurkekî hi k kirî... Kerhurkê meyî qazvan derket û hat. Wê demê, herkesê wê derê, bi qazvan û bi kera wî tirane dikin û bi halê wî dikenin. Dema ku qazvanê me hat bin berbanê re derbas bû, keça piçûk sêva xwe avêt û navmilê wî da. Herkes ecibmayî ma. Xwe bi xwe re gotin, “Hinde ciwanên çêtir, ba , dewlemend bi hespên xwe hatin derbas bûn, di nav wan de keça piçûk kesî neeciband, hema keça piçûk sêva xwe pi ta vî da! Hebe nebe keçêkê xwe a kir sêva xwe avêt nav milê wî da.” Gotin:

— Xeletiyek heye! Ger qazvan carek din were derbas bibe.

Qazvan hat derbas bû, keçê dîsa sêva xwe avêt navmilê wî da. Dîsa ne pêjirandin.

Gotin:

— Ev qazvanê pîs ew keça padî ahe bedew! Nabe! Xeletiyek heye, ger kerhurk dîsa were derbas bibe.

Cara sisêyan jî dema qazvan hat derbas bû keçêkê wek berê, dîsa sêva xwe avêt pi ta wî da. Padî ah hêrs bû. Got:

— Na, ne xeletî ye. Ewê bidine qazvan.

Pa ê çû ba keça xwe got:

— Te çima hemberê hinde miletî min da ermê. Hinde mirovên ciwan, hêja hatin derbas bûn. Lê te sêva xwe pi ta qazvanê qazan da. Êdî tu ne keça minî. Lêxe here!

Pa ê hin kincên qirêje pîs diavêjin ber pîyê wê û dibêjin:

— Lêxe here!



Ew û kerhurk bi rêya xwe digirin û diçin. Padî ah, ji kêça mezin û kêça navîn re sê roj û sê ev davetekî dike. Her du bûk û zavayan dilxwe dikin, nav zêr û zîvan de dixemilînin û dikine gerdek ê. Bajêr hemu têne davetê dîleyîzin, kêfa xwe dinêrin, dixwin û vedixwin. Qazvanê me û keça padî ahe pîçuk jî dine peyê hev û tèn dikevin kolika ber qaza.

Heke salek be du sal be ser re derbas dibe, rojekî padî ah nexwe dîkeve. Rojek, du roj, sê roj hêngî diçe nexwe iya wî pê de diçe. Hekîm tèn diçin tu çareyekî nabînin. Pa ê bi fermana padî ah gazî Hekimê Loqman dikin. Hekimê Loqman tê nexwe iya padî ah dinhêre û dîbêje:

— Ev, nexwe iyeke pir zor e. Dermanê vê nexwe iyê jî tune ye destê me de. Bi tenê vê nexwe iyê re dermanek heye, ew jî dest nakeve. Rêya wî dermanî, rêya çûyin û nehatinê ye. Padî ah bi wezîrên xwe ve dîbêjine Hekimê Loqman:

— Ka ji me re bêje ew derman li ku ye, emê herin bigerin û bînin.

Hekimê Loqman dibêje:

— Ew derman pi ika teyreye ku êdî li tu derê nayê dîtin. Navê wê teyrê Astîka çîlûçavre e. Ji wê yek tenê ma ye. Ew jî pi ta çiyayê Qaf û Kofî de ye. Heya niha kesekî ku çûye nehatiye, rêya çûyin û nehatinê ye.

Dema ku Hekimê Loqman vana dibêje padî ah ferman dike ku gazî zanyar û aqilmendê serdemê bikin. Demeke kurt de zanyar tê û derdikeve hizûra padî ah. Dema padî ah jê cihê teyrê Astîka çîlûçavre pirsî, zanyar gote wan:

— Ev teyr pi t sê deriya ye û li pi ta çiyayê Qaf de di ikeftê de ye. Pir dur e. Hespekî wusa ku siwarê xwe bigihîne wira zû zû peyda nabe. Kesek newêre here wîr jî. Lewra pi t sê deriyane. Ber her derîkî dafik û talûkên mezin hene. Ber deriyê yekem teyrê ahîne bazîdnobedariyê dike. Serserê derî disekine, dema ku kesek bike bikeve hundur, serê nikulê wî ve jehr heye, çawa bi dindikê xwe ve lêdixe dukuje. Yê ku çû wîr, ger siniyekî tije genimke û ewî sinya genim bide serserê xwe û derbas be. Dema hate binê teyrê ahîne bazîd, ewê bi genim ve mijûl be, ew çax ger sinyê hêdîka bihêle û derbas be. Lê ger mirov zû bike, lewra heya ku ew teyrê ahîne bazîd xwarina pê iya xwe xelas nekiribe, divê ji wir derbikeve. Hekena, ji wî xelasbûn tune.

Ber deriye duduyan mîhek û êrek heye. Çil sale birçîne û nehî tine kesek ji wan derbas bibe, deriyê duduyan veke. Pê iya mîhê go t heye, pê iya êr jî gîha heye. Ew jî kê bigrin yê pirtî pirtî bikin. Ger yê ku çû wîr, gîhayê pê iya êr bide ber mîhê, go tê ber mîhê jî bide ber êr. Ew çax yê bikaribin derbas bibin. Lê ger mirov zû bike, lewra heya ku ew êr û mîh xwarina pê iya xwe xelas nekiribe. Hekena ji wan xelasbûn tune.

Ber deriyê sisêyan jî heft qafilê kafiran heye. Kesek nikare nav wan re derbasbibe û here. Lewra dema ew radizên, çavê wan girtî be jî dibînin. Ji bo vê, yê ku çû wîr, ger pir baldar be. Ku dêna xwe dayê, çavên he t qafilêyên kafira girtîye û xiriniya xewê ser wan ketiye, ger xwe ve êre, qet derbas nebe. Lê çavên wan vekirî be û çavzîl bin, dengê xiriniyê wan neyê, ev nî ana razana wan e. Yê çûye, ger hêdîka û tu dengekî dernexe, bêhne xwe biçikîne û di nav wan heft qafilêyên kafir re derbas be, here. Pa ê deriyê sisêyan veke û bikeve hundurê ikeftê. Lê ger mirov zû bike, lewra heya ku ew hi yar nebin, ku mirov hundur derneketibe, ê dî derketina wîr, xelasbûna wîr tune ye.

Dema zanyar van gotinên xwe qedand, her du wezîran bangî kurên xwe kirin û gotin:

— Zû xwe amade bikin, eva karê mêran e, ger hun herin cergê teyra astîka çîlûçavre hildin bînin.

Her du zavayên padî ah ji bo ku bikevine çavê padî ah, pesnê xwe didin, dibêjin:

— Belê eva karê me ye û emê herin wî dermanî ji bo padî ahê xwe hildin bînin.

Radibin, amadehiya xwe dikin. Derdikevine rê û ber bi de tê ve berjêr dibin.

Keçên padî ah ya mezin û ya navîn radibin, diçine ba keça piçuk ku pesnê mêren xwe bidin. Haya keça piçuk jî ji tu ti takî tune ye. Dibêjine xu ka xwe ye piçuk:

— Bavê me nexwe e û ber mirinê ye. Tu û qazvanê xwe nava kêfê denin. Mêrên me rabûn ketine rê ji bo ku herin dermanekî ji nexwe iya bavê me re bibînin û bînin. Kerhurkê te çi dike? Hebe nebe ber qazane!

Her du jî tiranên xwe dikin, dikenin û diçin. Keça piçuk ji bo bave xwe pir xemgîn dibe. Ser de ji tiranê xu kê nê wê pir ewê diê înin. Heya wê demê ne ew ê gotibû mêrê xwe, ez te nasdikim, ne jî mêrê wî gotibû ez evim. Negotibû mêrê xwe ku min tu dîtîyî, ez te nasdikim. Tu ne hema kerhurkekî di serî de û qazvanekî belengaz û rebenî. Heya niha min dengê xwe nekîr, ti tek negot. Lê ez ne aqilsivik û dînim. Ma tu nizanî min çima sêva xwe navmilê te da?”

Pa ê dîbeje:

— Tu jî hema rabe ti tekî bike, bide peyê her du kurên wezîran, di de tê de here xwarê. Bila nebêjin bêxîretin, ji bo padî ah ti tek nekîrin. Bila serê me nekeve ber me û bila serê me bilind be.

Mîrze Mihemed dibîne ku êdî jina wî her ti tî dizane, dîbeje:

— Temam, bila gotina te be. Ezê herîm lê ertekî min heye. Tu yê jî ji kesekî re derheqê min de ti tekî nebêjî heya qederekî.

Jina Mîrze Mihemed gotina wî dipêjîrîne. Pa ê Mîrze Mihemed amadehiya xwe dike ku here dermanê padî ah bibîne û bîne.

Dema ku lawên her du wezîran hespên xwe siwar dibin, mirovên bajêr hemu tîn wan bi rê dikin, pesnê wan didin, wana wek qehremana bi rêdikin. Dibêjin:

— Bibe nebe ev her du zavayên padî ah yê herî cerga teyrê Astîka Çîlûçavre bînin.

Demek ser re derbas dibe, gelê wê derê dêna xwe dinê kerhurk, ser pi ta kera xwe ye topal hêdî hêdî ber bi wan ve tê. Dibêjine qazvan:

— Xêre tu li van der e? Tê bi ku ve herî?

Qazvan dibêje:

— Ezê herîm ji bo nexwe iya padî ah cergê teyrê Astîka Çîlûçavre ê bînim.

Herkes bi wî dikene û dibêjin:

— Tê bi vî kera xwe ye topal ê gurî herî cergê teyrê astîka çîlûçavre ê bînî!  
Tu û kera xwe ve nikarin bikaribin jêra de tê de kêvrî kekî bigirin û cergê wî bînin!  
Îcar, maye ku tu herî cergê teyrê astîka çîlûçavre ê bînî!

Pa e kera wî dine ber kevira û tiranên xwe pê dikin, têra xwe pê dikenin.

Dema ku qazvanê me bi kera xwe ye total ve ji nav gel dertê, surê bajêr pa xwe dihile û ber jêr diçe û diqulibe, ew dem ji kerê xwe peya dibe. Kerhurkê serê xwe de derdixe, kincên kem û pînekirî derdixe û dike xwircikê kera xwe. Tewla kera xwe li wir diçikîne, hefsarê kerê xwe lê giridide. Pa ê du mûyen ji dêla hespê ba û birûskê derdixe, çawa hev dixê hespê ba û birûskê ba wî peyda dibe. Kincên xwe yî nû li xwe dike û xwe diguherîne. Roniya wî dide wan dera, rewnek dide jêr û jor. Nava eniya hespê ba û biruskê maç dike û lê siwar dibe. Li hespê ba û birûskê siwar dibe û dikeve rê. Ku de tê de tê xwarê, dibîne ku her du zavayên padî ah, kurên wezîran, berdine kêvrî kekî û wî alî vî alî didine peyê, lê nikarin bigirin. Ew bangî wî dike:

— Wey pê îbirke!

Yê din dibêje:

— Nehêle bireve ew Astîka Çîlûçavre e, emê bigrin cergê wî ji padî ah re bibin!

Mîrze Mihemed bi hespê xwe wek birûskê tê nav her duyan de derbasdibe û patika kêvrî kê ve digre û dîne ba wan. Zavayên padî ah hêrs dibin dibêjin:

— Ew kêye ku wusa nêçîra me xera dike û nîvî de dihêle!

Mîrze Mihemed, tê ba wan û dibêje:

— Min nêçîra we xera nekiriye. Ez derbas dibûm, min dît ku ev nêçîr xwe nade dest, lewma min ji we re girt.

Pa ê Mîrze Mihemed dibêje wan:

— Hun ê çibikine vê kêvrî kê?

Dîbêjin:

— Padî ah nexwe e, emê cergê wî ji padî ah re bibin.

Mîrze Mihemed, fem dike ku zavayên padî ah ji bo ku herine Çiyayê Qaf û cergê Astîka Çîlûçavre bînin, pir ditirsin. Lewma li vê derê cergê kêvrî kê yê bibin û herkesî bixapînin. Mîrze Mihemed dibêje herdu zavayan:

— Ezê kêvrî kê bidime we, lê ertekî min jî ji we heye!

Ew jî dibêjin:

— Ka bêje ertê te çiyê.

Mîrze Mihemed dibêje:

— Hunê a ika serê xwe derxin, ezê bi qa a gustîlka xwe ve jora netika we, bin porê we xim. Ez mirovekî biyanîme, pa ê ezê lêxim herim. Belkî êdî em qet hev û du nebîn. Hûn qebl bikin ezê kêvrî ka we bidime we, lê hun nepêjirînin ez kêvrî kê nadime we.

Zavayên padî ah nêçar dimînin, ertê Mîrze Mihemed dipêjirînin. Ji hev re dibêjin:

— Eva yekî ji van dere nîne, ti tek nabe, em kêvrî ka xwe hildin herin. Mîrze Mihemed kêvrî kê dide wan dikeve rê û dîçe.

Her du zavayên me kêvrî kê hildidin tèn cergê wê derdixin, bi kêf û ahî, qure qure dibêjin:

— Em çûn, me cergê Astîka Çîlûçavre anî.

Wezîr bi dilxwe î û kêfxe bangî xulaman dîkin:

— Wî cîgerê didine çêkirin û dine ber padî ah. Dema padî ah ewî cergê dixwe hêngî dîçe nexwe iya wî zêde dibe û nexwe eki hal dikeve.

Mîrze Mihemedî, di vê navberê de bi hespê xwe yî ba û birûske kort û newalan, çiyên û de tan derbas dibe. Dîçe dîçe û tê Çiyayê Qaf û kofî ve hildiki e. Dêna xwe didê teyrê ahîne bazîd ser derî rawestyayîye, siniyekî tijî genim dike. Pa ê dide ser serê xwe, dizîka ve tê binê teyrê bazîd dîsekine. Dema teyrê bazîd bi niklê xwe ve bi wan ve mijul dibe, Mîrze Mihemed binê siniye re derbas dibe. Deriyê yekem vedike û dikeve hundur. Zû bi zû tê dêna xwe didê, ber deriyê duduyan mîhek û êrek disekinin. Gîhayê ber êr dide ber mîhê, go tê ber mîhê jî dide ber êr. Ji ber ku êr û mîh çil sale birçîne, dest bi xwarîne dîkin. Vê navberê de Mîrze Mihemed jî di deriyê duduyan re derbas dibe û dikeve hundur. Dêna xwe didê heft qafîleyen kafira, her qafîlek nav xwe de rêz bi rêz, bi ûr û mertalên desta de disekinin. Mîrze Mihemed, bi dîqat dinêre çavên wan vekirîne, çavzîlin û qet deng ji wan nayê. Fem dike ku heft qafîleyên kafira razayîne. Lêbele jiber ku wusa çavzîlin, mirov newêre

nav wan hemuyan re derbas bibe û here. Mîrze Mihemed, bêhna xwe diçikîne û hêdî hedî di navbera hemuyan re derbas dibe. Tê deriye sêyemin jî vedike û dikeve hundur. Berê xwe didê teyrê Astîka Çîlûçavre li wêderê ye. Dizîka ve tê binêAstîka Çîlûçavre û ni ka ve destê xwe davêje qirika wê û nikilê wê jî digire, ji bo ku neke qaje qaj. Lewra ku piçek dengê wê derê, ew nobedarê wê derê hemu yê bicivin ser serê Mîrze Mihemed û ye wî dest xwe de bîkujin. Pajê Mîrze Mihemed dest davêje ûrê xwe û serê wê jêdike û pi ika we derdixe dike xurcikekî û bilez hêkî ew le ker ranebûne, ew mîh û êr û ew teyr xwarinên xwe xelas nekirine, dizivire ji wir dertê. Wek berê bi pir dîqat navbera wan re derbas dibe û tê, derdikeve.

Dema ku Mîrze Mihemed tê bine bajêr ba kera xwe, kincên xwe diguherîne, kerhurk diki îne serê xwe û kera xwe siwar dibe, tê mala xwe. Lê dema nav bajêr re derbas dibe disa herkes henekên xwe, tiranên xwe dikin. Dibêjin:

— Qazvan çûye cergêAstîka Çîlûçavre aniye!

Pa e dine ber beran û keviran. Pey re jî dibêjin:

— Va ye zavayên padî ah ev du roje pi ik anîne û padî ah xwariye, ser de zêdetir nexwe ketiye.

Qazvan guh nade wan, rasterast tê mala xwe. Pi ka teyrê Çîlûçavre dide keça padî ahe piçuka jina xwe û jê re dibêje:

— Ha ji te re, eva cergê Astîka Çîlûçavre e. Here navmaliya bavê xwe re bibêje, bila hinek birinc bide te. Birincekî çêke, cergê teyrê astîka çîlûçavre berdake û bibe bide bavê xwe, ewê bi îzna Xwedê qenc bibe. Lêbelê ji kesekî re nebêje, eve cergê Astîka Çîlûçavre e.

Keça piçuk, diçe hinek birinc dixwaze, navmaliya padî ah birinc didê, lê dibêje:

— Dizîka ve here bila dê û bavê te, te nebînin!

Keça padî ahe piçuk wî birinci dîne, çêdike û cergê Astîka Çîlûçavre dikelîne û berde dike. Pa e diçe qesra bavê xwe. Dibêje:

— Evê xwarinê bidine bavê min.

Dema ku padî ah dibihîze yek hatiye, dibêje:

— Ew kê ye, çima hatiye?

Xulam û wezîr dîbêjin:

— Keça te ye piçuk e hatiye. Ji te re birinc aniye ji bo ku tu bixwî.

Padî ah dibêje:

— Berdinê bila here. Keçeke mine mîna wê tune ye!

Wezîrên padî ah rica dikin, dibêjin:

— Keça te ye, guneh e. Hema kevçîkî ji xurekê wî bixwe, bila ber xwe nekeve. Hem meriv nizane Xwedê bi çi qencyê di îne!

Dema ku padî ah kevçîkî ji birinc hildide, tem dide devê wî û dîbêje bînin. Wî birincî dixwe xelas dike. Pê re jî qenc dibe û ji nexwe yê tu ti tek namîne. Padî ah dibêje:

— Ez bi cergê Astîka Çîlûçavre zêdetir nexwe ketim, lê bi birincê keça xwe destxwede ba bûm.

Wezîr dibêjin:

— Nexêr, ew cergê ku te du roj berê xwar nû tesîr ser nexwe iyê kir, lewma hûn ba bûn.

Keça piçuk dema ku dît bavê wî ba bû, pir dilxwe dibe û lêva xwe digeze, diçe mala xwe. Rasterast diçe ba Mîrze Mihemed, dibêje:

— Bavê min qencbû. Lê herkes dibêje, her du zavayen mezin ew qenc kiriye. Lewra wana çûye cergê Astîka Çîlûçevre ê anîye, lewma padî ah ba bûye.

Gazindê xwe dike û dîbêje:

— Heya niha min sebir kir, me hinde cefa, tehde dît, hinde neheqî ki and êdî bese! Rabe xwe e kereke û rastiye herkesî re bêje.

Mîrze Mihemed, dibêje:

— Temam, lê belê ertekî min heye. Ku tu ewî bînî cih, ezê xwe e kerekim û rastiye nî anê herkesî bidim.

Keça padî ah dibêje:

— Ka bêje ertê te çiyê.

Mîrze Mihemed, dibêje:

— ertê min ev e. Tu yê herî qesra bavê xwe ba xu kê xwe. Ji wan re hemu rastiye bêjî. Pa ê ezê xwe e kere bikim. Jixwe sibê ji bo ku padî ah ba bûye, herkesê bicive meydana bajêr. Ezê bi hespê ba û birûskê ve, wir re derbas bibim û rastiye nî anê wan bikim.

Jina wî ertê wî dipêjirîne û diçe ba herdu xu kê xwe. Ji wan re dibêje:

— Xwelî serê we be! Hûn jî dibêjin mêrên me merin, çûne çiyayê Qaf û Kofî, cergê teyrê Astîka Çîlûçevre ê anîne û bave me ba kirine. Nexêr, ewî çûye çiyayê Qaf û Kofî, cergê teyrê Astîka Çîlûçevre ê aniyê û bave me ba kiriye mêrê mine. Hûn jî mêrê xwe camêr dihesibînin. Mêrên we tirsonekin. Lewra ew neçûne çiyayê Qaf û Kofî, bîtenê çûne de ta binê bajêr. Ew cergê anîbûn jî ne yê teyrê Astîka Çîlûçevre ê bû, cergê kêvrî kekî bû.

Xu kê wî jê bawer nakin. Dîbêjin:

— Kerhurkê qazvanê te ancax here ber qaza. Yê çawa bi kera xwe ye topal ve here çiyayê Qaf û Kofî!

Werhasilê kelam ji xu ka xwe ye piçuk bawer nakin. Xu ka wane piçuk jî dibêje:

— Dema sibe bû û herkes li meydana civiyan, hûnê bibînin ka kê derewan dike û kê rastiye dibêje! Dema mêrên we û xortan bi hespên xwe ketinê pê baziye, yekê ser hespa xwe mîna ba û birûskê ji me rîqê ve derê û were mexrîbê re herê. Ewê wek birûskê mêrên we û hemu civanan derbas be û wana bela wela ke. Bizanibin ew mêrê min e. Ku neyê jixwe bizanibin ez derewan dikim. Pa ê radibe û diçe mala xwe.

Dema dibe sibe, millet hêdfî hêdfî dicivinê ber qesra padî ah. Di bajêr de çiqas mirov hene, têne ahiyê, pê baziye. Padî ah û wezîr bi malbatên xwe ve jî derdikevine berbanê, ahî û leyîstkan mêze dikin. Mîrze Mihemed radibe kincên xwe diguherîne, kerhurk serê xwe derdixe. Xwe çêdike, pak dike û du muyên hespê ba û birûskê hev dixê. Destxwe re hespê ba û birûskê ba wî peyda dibe. Nava eniya hespê ba û birûskê maç dike û lê siwar dibe. Le dide diçe ber qesra padî ah. Wê demê jî zavayên padî ah û civanên bajêr hemu bi hev re dest bi pê baziye dikin. Mîrze Mihemed bi hespê xwe ve tê wek birûskê nav meydana re derbas dibe. Ber lez û beza wî, ber bayê wî herkes walî valî de dikeve. Tu siwarek meydana namîne û hemu



terabera dibin. Zavayên padî ah dikevin, her yek milekî wan di kê. Padî ah û herkes mat dimînin. Roja yekî, roja duduya û roja sisêyan jî wusa dibe. Pa ê padî ah ferman dike dibêje:

— Herîn ka binêrin, eve kî ye, eve çi ti te. Herine pê iya wî bila raweste, ka eve kêye wusa herkes tarûmar kir û di nav tozê de hî t?

Pa ê Mîrze Mihemed tê û ber padî ah disekine. Selam dide:

— Selam elêkim,

— Elêkime selam!

Padî ah ji siwarî dipirse:

— Tu kêyî, ku derê ve derketî?

Mîrze Mihemed dibêje:

— Ez xulam, ez zavayê te me.

Padî ah:

— Tu ku re zavayê minî! Her du zavê mi va li virin, yek jî kerhurkek serîde ye û qazvane, ber qazan e. Ew li ku, tu li ku! Ew kerhurk serî de ye, gurî û pîse, lê tû sipî û ronî didî.

Pa ê Mîrze Mihemed, serê wî re çi derbas bûye, ji wan re dibêje. Çawa keça wî hatiye û ew dîtiye. Çima sêva xwe avêtiye navmilê wî xistiye. Zavayên wî çawa berdane kêvrî kê û ewî çawa kêvrî k girtiye û bi ert daye wan, peyê re çawa çûye teyrê Astîka Çîlûçavre aniye yeko yeko ji padî ah re dibêje. Pa ê ji padî ah re dibêje:

— Heke ku hûn ji min bawer nakin, bangî zavayên xwe bikin, eva gustîlka min e. Min dema bi ert kêvrî kê da wan, min muhira qa a gustîlka xwe ve netika wan da. ûna gustîlka min, bila a ika xwe rakin di bin porê wan de netika wan ve ye.

Padî ah bangî zavayên xwe dike. Zava tèn, dema a ika xwe bilind dikan, netika wan ve mohra gustîlka Mîrze Mihemed dibînin.

Wê demê padî ah her ti tî fem dike. Bangê keça xwe ye piçuk dike. Dide rexê xwe û ji wî û Mîrze Mihemed re dibêje:

— Eve ez eve textê min, eve jî xatûna min. Êdî textê min ji te re û textê xatûna min jî ji keça min re.

Pa ê padî ah ji wan re daweteke nedîtî dide kirin. Nav dilxwe î û ba iyê de çil roj û çil ev govend digrin û dileyîzin.

Ew hatin gihî tine mirazê xwe. Kerhurk hat bû zavayê padî ah, bû padî ahê wî bajêrî, keça padî ahe piçuk hat bû xanima ser wî bajêrî û ser xu kên xwe re, zavayen padî ahên din bûne xulamên wan. Çîroka me firiya çû asîmana û rihmet dê û baven guhdara.

### **Der barê vebêjêran de agahî**

Berhevkar : Mehmet Yıldırım – Bedrettin Kırka aç

Nav û pa nav : Fêyzî KIRKA AÇ

Cihê jidayîkbûnê û temen : Gundê Oremarê/ 65

Asta perwerdehiyê : Dibistana Seretayî

Navnî an : Gever/Çolemêrg

Çavkaniya wî : Bavê wî

Dever : Oremar

Mêjûya berhevkirinê : 2012

## 2. ÇÎROKA DUYEMÎN

### Be a Yekemîn

Hebûye tunebûye. Ji Xweda mezintir kes tunebû ye. Di zemanekî berê de welatekî de padî ahek û sê kurên wî hebûye. Ev padî ah pir dewlemend bûye. Xwedîyê bax û bexçeyê pir navdar bûye. Di bexçeyê wî de çî bêjî hebûye. Mêwiye bexçeyê wî pir xwe bûne. Di nava baxçe de dareke sêvê jî hebûye. Ev dara her sal sê heb sêvên sor gevez û mezin dide. Lê belê ew çend salên dawî de, ti tek musallatê bax û bexçeyên wî padî ahî bûye. Dema ku mêwiye baxçe digehîje; sêv sor û gevez dibin, tirî irîniyê de derb dibin û hurmî, hinar, gilyaz tên dema xwarinê, di nivê eve de ew ti t tê û bexçe serûbinê hev dike. Bexçe talan dike, wan sêvên ku padî ah pir jê hezdike jî diqetîne û hildide. Çawa hatiye dîsa di holê de wusa wenda dibe û diçe. Sibe zû mirov ku radibin û halê bexçe wusa tarûmar dibînin, rew ekî matmayî de dimînin.

Padî ah bi vê rewê re pir xemgîn dibe. Bi hêrs ve hemu mirovên xwe, yeko yeko di îne ku wî ti tî bigrin û bikujin. Bax û bexçeyên rengin, fêkiyên xwe destê wî rewarî, cinawirî xelas bikin. Lêbelê kê diçe an xewra diçe, an tê ku tin, an jî tirsî wî xwe vedi êre. Kes vê rewê re çareseriyek nikare bibîne.

Dem wusa derbas dibe, ber bi biharê padî ah dîsa wek her sal bax û bexçeyên xwe radike û datîne, lê dinhêrîne, çêdike, pak dike. Her demê zêdetir xwe ik dibe bexçeyê padî ah. Zahfîr jî ser dara sêve disekine û lê dinhêre. Fêkî mezin dibin, bêhneke xwe dikeve dev û dora wan dera û dengê çivîk, bilbil û çirçirka tevlihev dibe. Dara sêvê wek her sal dîsa sê heb sêvên mezine sor digire.

Lê ku her sal wê demê de ew rewara tê û bexçe tarûmar dike, padî ah û gel hemu dikevin nav tirs û xemgîniyeke mezin de. Xwe bi xwere dibêjin:

— Ka êdî kes nema ku here ji bo vî halî ti tekî bike.

Wê demê kurê wî yê hêrî mezin derdikeve holê û dibêje:

— Ezê herim ji bo nobedarîya bax û bexçeyan. Ez nahêlim tu ti tek nêzîkî bexçeyan bibe!

Padî ah çiqas bêdil be jî nêçar dimîne, destûra kurê xwe yî mezin dide ku kurê wî here û ti tê ku tê, bexçe tarûmar dike bikuje. Birayê mezin zirxê xwe li xwedike, ûrê xwe girêdide û diçe nobedariyê. Ku dibe êvar, tirseke mezin pê digre. Nîvê evê hime him, gime gimeke bideng dema ku tê, birayê mezin tirsê dikeve binê qir û qala xwe vedi êre. Newêre serê xwe bilind bike ka ew çiyê. Dema ku roj serda tê, her der ronî dibe, pa ê diwêre ku rabe, nava qir û qala derê. Dema ku radibe, dibîne ku halê bexçe xerab e. Bexçe tarûmar bûye. Dara sêvê dinhêre çî bibîne! Ji her sê sêvan yek tine. Diçe hizura bavê xwe, vir vizika dike. Dibêje:

— Ez xewra çûme. Lewma min nedîtiye ka ew çî cinawir bû. An na minê serê wî jêkira!

Padî ah û gel hemu pir xemgîn dibin. Ji sê birayan yê navîn destûr ji bavê xwe dixwaze û dibêje:

— Bavo ez destûrê jite dixwazim. Ezê herim çî dibe bila bibe, lêbelê xew çavên min nakeve, ezê ewî ti tî bikujim û me hemiyan ji vî derdî xelas bikim.

Pi tî vê gotinê bavê wî destûra wî dide. Birayê navîn wek birayê mezin zirx û ûr girêdide û diçe. Ku êvar ser de tê ditirse. Hema hema nivê evê ye ku ew cinawir êdî were, birayê navîn jî xwe vedi êre. Ew jî ku dengê wi ti tî dibihîze, pir ditirse. Dikeve binê qir û qala. Dengê wî ti tî wusa zehf û bi xofe, birayê navîn newêre serê xwe rake û lê binhêre. Heya roj ser de tê, her der ronî dibe. Pa ê diwêre ku rabe, nava qir û qala derê. Dema ku radibe, dibîne ku halê bexçe tarûmar e. Ji wan her du sêvan yek kêr bûye û bitenê sêvek maye. Bexçe, wek ku artê ek mezin bikevê û serobin bike, xerab bike tarumar dîtiye. Birayê navîn nêçarmayî û dest vala, bi xemgîniyek mezin diçe û wek birayê mezin dibêje:

— Ez xew re çûme. Min ti tek nedîtiye. An na minê serê wî jêkira!

Herkes têra xwe xemgîn dibe. Dikevine nav bêhêviyek mezin de.

Di nav vê rewê de birayê hêrî biçuk yê binavê Mîrze Mihemed, derdikeve holê û dibêje:

— Dora mine. Ezê herim nobedariyê bigrim.

Wê demê birayên wî, pê tinazan dikin û dibêjin:

— Tu yê herî me ji vî halî xelaskî? Tu nikarî bi rêva herî ku maye tu me destê wî cinawirî xelaskî. Em herdu biran çûn, hemu mirovên padî ahê bavê me çûn, dîsa jî me ti tek nekir. Tu yê newêrek û gurî herî û me xelas kî? Tu piçukî, runê di cihê xwede.

Kî dibhîze ku Mirze Mihemed'ê destûr ji padî ah bixwaze ji bo ku here nobedarîye bigre û ew rewar û cinawir her çîye, ye wî bikuje; pê tinazên xwe dikin, dikenin. Lêbelê Mîrze Mihemed, qet guh nade van gotinan. Raste rast diçe ba bavê xwe û daxwaziya xwe jê re dibêje. Bavê wî pê iyê destûr nade, lêbelê ku Mirze Mihemed bi biryardar dibêje ezê herim, bavê wî dibêje:

— Ji me kesê ku neçû nema. Heya birayên te yên mezin jî çun. Kesî tu ti t nekir. Deka tu jî rabe here ka tê çî bikî? Her guman nakim ku tu bikaribî ti tekî bikî. Lewra tu biçukî, ti tek destê te nayê.

Mirze Mihemed radibe amadehiya xwe dike, zirx û ûrê xwe girêdide, diçe. Êvarek re û tarî de ji bo nobedarîya bax û bexçeyan, der û dora bexçe digere. Ku dem derbas dibe, hêdî hêdî xewa wî tê, dîsa radibe digere. Ber bi nivê evê ku xewa wî zêdetir tê û xew dikeve çavê wî, xencera xwe diki îne û tiliya xwe ye piçuk jêdike. Pa ê hinek xwê davêje ser birîna xwe. Bi ê a tiliya jêkirî xewa wî direve. Dema ku ew ti tê were, dûr ve dengê xu e xu , gu e gu , gufe gufa wî dikeve wan kort û newalan. Mirze Mihemed radibe ûrê xwe diki îne û hêvîya wî dengî disekine. Di tarîyê de çav çavî nabîne. Ku di tekî mezin dibîne, dêna xwe didê dêwekî mezine ku hatîye bax û bexçeyan tarûmar bike. Êrî î ser dike û ûrê xwe ve lêdixe. Bi wî êrî ê dêw birîndar dibe. Dibe quje quja wî û di holê de wenda dibe diçe. Mîrze Mihemed benda hilhatina rojê dimîne. Ku ronahî dikeve dev dora, radibe û xwîna dêw wan dera dibîne. Dîçe bin dara sêvê, dêna xwe didê ku sêva ser darê hê pêvan e. Radibe diçe mala xwe. Çi bûye ji birayen xwe yê mezin û navîn re, bavê xwe û gel re dibêje. Qala dêwê mezin, birîndarkirina wî û urinya wî dike. Lêbelê kes jê bawer nake. Tinazên xwe pê dikin. Dema ku Mîrze Mihemed heter dike, birayên wî dibêjin:

— De ka em herin, binêrin. Em zanin te tirsê ve êrî î qir û qala kiriye. Lêbelê em disa jî herin.

Waha tiranê xwe, tinazên xwe dikin û dikevîne rê. Dema ku diçin, birastî jî dibînin ku bax û bexçeyan de xwînek pir rijiyaye. Wan der dora ûna pê dêw û gevastina wî...

Bila her sê bira vê rew êde bin. Ka em binêrin dêw çî halîdane? Dema ku ew eva Mîrze Mihemed dêw birîndar dike, dêw pir bi hêrs dibe. Lêbelê ber birîna xwe pir canê wî diê e. Lewma direve diçe, dikeve bîra ikefta xwe ku pir kûr û mezine. Xwîna wî rêz dibe heya bîra ikeftê de. Dêw ji Mîrze Mihemed re sond dixwê. Dîbê:

— Ku tu destê min bikevî, ezê te bikujim û pirtî pirtî bikim.”

Di vê navberêde Mîrze Mihemed û birayên xwe, xwe bi xwîna dêw ya ku rijiyaye, pê digrin û diçin. Hersê bira diçin diçin heya ber ikeftê, dikevîne ikeftê. Digerin nagerin ti tekî nabînin. Pa ê bîreke fireh û kûr e bêbinî dibînin. Birayên mezin dibêje ezê bikevîme bîrê. Werîsekî davêjine navtenga wî û berjêr dikin. Lêbelê hê nivê weris de pir ditirse. Dike qare qar û dibêje:

— Min biki înin jor!

Pa ê birayê navin dikeve bîrê. Weris tê ku idî biqede, dike qêrin dibê min biki înin jor. ewî jî diki înine jor. Birayên Mîrze Mihemed yê mezin û navîn ditirsin ku bikevîne wê bîrê. Dibêjine Mîrze Mihemed:

— Tu bikev bîrê. Emê werîsekî dirêj bavêjine navtenga te û te darxine jêr. Ka çî heye, çî tune ye ji mere bibêje. Ku kengî te xwest derkevî jor, du cara bend biki îne, emê te derxine jor.

Mîrze Mihemed tirsonek nebûye. Bêtirs û jêhatî bûye. Qet tirs hun bêjin çavê wî de tunebûye. Dibêje, “Bilabe”. Werîs tînin davêjne navtenga Mîrze Mihemed û wî berjêr dikin. Birayên Mîrze Mihemed hêdî hêdî werîs berdidine jêr. Têrê nake, werîsek din jî pêve dikin, yekî din jî. Pa ê piyê Mîrze Mihemed ji erdê digire. Mîrze Mihemed piçekî disekine ku çavên wî hîmî tariyê dibe, pa ê pê îya xwe dibîne. Dinêre ji durve ronahîk tê. Alîyê wê ronahîyê ve diçe. Dibîne ku sê hev ode wê derêne. Deriyê oda yekemîn vedike çî bibîne! Keçeke bedew, sêveke sor di desta de li wê derê xemgîn xemgîn rûni tiye. Keçik, dema Mîrze Mihemed dibîne ditirse dibêje:

— Tu li vir çî dikî? Dêw ku te li vir bibîne yê te destxwe de bikuje!

Mîrze Mihemed, dîbêje netirse, ez hatime ku ewî bikujim. Dema min dêw ku t, ezê te xelaskim.

Pa ê Mîrze Mihemed dîçe deriyê duduyan vedike. Dêna xwe didê keçeke ji keça din bedewtir sêvek desta de li wê derê bi xemgînî rûni tiye. Keçik, dema Mîrze Mihemed dibîne ditirse û dibêje:

— Tu li vir çi dikî? Dêw ku te li vir bibîne yê te destxwe de bikuje!

Mîrze Mihemed, dîbêje netirse, ez hatime ku ewî bikujim. Dema min dêw ku t, ezê we xelaskim.

Pa ê Mîrze Mihemed dîçe deriyê oda dawî vedike. Dêna xwe didê keçeke ji keçên din piçuktur û pir bedewtir li wê derê bi xemgînî rûni tiye, lê wek yê din destê wê de sêv tune ye. Lê Mîrze Mihemed çawa keçika piçuk dibîne dile wî dikevê û keça piçuk jî dil berdide wî. Keçik, dema Mîrze Mihemed dibîne ditirse ku dêw were û wî — vî zîlamê rin— bikuje. Lewma dibêje:

— Tu li vir çi dikî? Dêw ku te li vir bibîne yê te destxwe de bikuje!

Mîrze Mihemed, dîbêje netirse, ez hatime ku ewî bikujim. Dema min dêw ku t, ezê te xelaskim.

Pa ê Mîrze Mihemed ji wan ra çi bûye, çima li vire yeko yeko dibêje. Çawa hatîye dêw birîndar kirye, çawakî birayên wî ji wî bawer nekirine; henek, tirane pê kirine ji keçan re dibêje. Keç jî, çi serê wan re derbas bûye ji Mîrze Mihemed re dibêjin. Her sê keç jî keçên axa û began bûne. Lê belê wî dêwî yeko yeko wan revandîye, anîye vir û karên xwe bi wan dide kirin. Keç dîl mane li wê derê. Nikarin destê dêw xelas bibin.

Keç pir ditirsin ji ber ku dêw berhatinêye. Dêw wê demê derketîye derve ji bo xwarinê vexwarine bîne. Mîrze Mihemed dibêje keça:

— Netirsin ez hatime ewî bikujim.

Pa ê xwe vedi êre. Demek ûn de hume hum, gufe gufa dêw dikeve wan dera. Sê keç jî pir ditirsin ku ew dêwê mezinê bihêz û hov yê lêxe vî zîlamê bêtirs û ciwan bikuje. Dêw ku dikeve hundir, Mîrze Mihemed derdikeve pê îya wî. Dêw matmayî dimîne ku Mîrze Mihemed wusa di cihê xwe de dibîne. Pir hêrs dibe û dibêje:

— Heyyy Mîrze Mihemed! Ez te rûyê ezman digeriyam, tu rûyê erdê destê min ketî! Ka biki îne ûrê xwe.

Mîrze Mihemed lê vedigerîne:

— Ey kafirê heram, min dor daye te. Tu pê iyê ûrê xwe biki îne!

Dêw bi hêrs ûrê xwe diki îne, çawa davêje Mîrze Mihemed xwe xwar dike. ûr ser serê wî re derbas dibe diçe heft çîya serûbinê hev dike. Îcar Mîrze Mihemed dibêje:

— Vê carê jî dor dora mine kafirê heram!

Mîrze Mihemed, çawa ûrê xwe diki îne davêje, serê dêw difirîne. Dêw qet qetî dike û mîna çiyakî dide ser hev. Pa ê diçe ba keça piçuk ku pir bedew bûye. Jê re dibêje:

— Ezê we ji vir xelaskim, derxînime jor. Du heb birayên minî ji min mezintir hene. Wana min bi werisekî dirêj ve peyayî vir kirin. Em herin ber devê bîrê, bila me yeko yeko biki înin jor.

Pa ê keçên din jî hildidin ba xwe, her çar diçin berdevê bîrê. Pê iyê werîs davêjine navtenga keça mezin. Mîrze Mihemed du cara werîs ka dike. Birayên Mîrze Mihemed keça mezin ka î jor dikin. Cara duyem keça navin derdixin jor. Dor ku tê keça piçuk, keç ji Mîrze Mihemed re dibêje:

— Tu pê iya min derê jor, pa ê min biki înin. Lewra te çawa ji min re qala birayên xwe kiriye; tê dilê min ku birayên teyê ji te re xiyantî bikin. Ku ez pê iyê derêm, yê te vir de bihêlin û herin. Pa ê yê ji herkesî re û bave we re bibêjin: “Me dêw ku tîye û ev keç xelas kirine. Birayê me yê piçuk jî ketiye bîrê û miriye.” Ji bo ev neyêne serê te, tu pê iyê derê jor, pa ê min biki înine jor.

Mîrze Mihemed napêjirîne û dibêje:

— Na, tu pê îya min derê. Birayên min ji min re xiyantî nakin.

Keça piçuk ku nêçar dimîne, dipêjirîne. Gustîlka tiliya xwe derdixe û dide Mîrze Mihemed. Pa ê ji Mîrze Mihemed re dibêje:

— Vê gustîlkê têxe tiliya xwe. Ku birayên te, te re xayîntî bikin û te neki înine jor, here berdevê bîra kur. Gustilka ku min daye te tilîya xwede bizivirîne. Wê demê beranekî sipî û beranekî re yê derkevin pê îya te û der û dora te yê bizivirin. Ji wan berana yek, mirov derdixe jor; yek jî, heft qat dixê binê erdê. Bîr ve



neke, tê xwe bavêjî ser pi ta beranê sipî ku te derxe jor. Ku tu xwe bavêjî ser beranê re , tê heft qat herî binê erdê.

Pa ê keça piçuk, werîs davêje navtenga xwe, birayên Mîrze Mihemed ewî jî diki înine jor. Birayên Mîrze Mihemed, ku her ti tî hîn dibin, ji bo kû hesudiyê Mîrze Mihemed dikin û dixwazin ew bixwe bikevine çavên bavê xwe û her kes bila bizanibin ew çiqas mêrxasin, çak û bihêzin, bêtirs û camêrin, weris davêjine bîrê. Mîrze Mihemed di bîrê de dihêlin, terka wî ye mirinê dikin. Lewra dixwazin bibêjin: “Me dêwê hov ku tîye û van keçan xelas kiriye.”

Her du birayên Mîrze Mihemed her sê keçan hildidin û qet venagerin pa iya xwe nanêrin, birayên xwe di bîra bêbinî de dihêlin û diçine qesra bavê xwe.

### **Be a Duyemîn**

Dema ku weris dikeve jêr, Mîrze Mihemed fem dike ku birayên wî jê re xayîntî kirine. Diçe berdevê bîra kûr, dema ku gustilka tilîya xwe de dizvirîne, dêna xwe didê beranek sipî û re ni ka ve peyda dibin û derdikevine holê. Demek pa ê ew beranan dev û dora hev de dizivirin. Mîrze Mihemed, xwe a dike û xwe davêje ser pi ta beranê re . Ku xwe davêje ser beranê re , heft qat diçe binê erdê. Ev der dinyake dine. Dev û dora xwe dinihêre û demekî rê ve diçe. Diçe diçe heya tê ber malekî. Jimalê pîrek dertê û wî dawetî malê dike. Mîrze Mihemed dikeve hundir û rûdinê. Ber ku zef tî bûye, aveke sar ji pîrê dixwaze. Pîrê tasekî de aveke êlû û or jê re dîne. Mîrze Mihemed dema gulmekî ji ave vedixwe, tema avê jê re nexwe tê, avê nadiqutîne û dirêjîne der ve. Pîrê ji Mîrze Mihemed borîn dixwaze ji bo avê. Pa ê dibêje:

— Ba me daxwaza mêvana nayê vegerandin, ger were cih. Ava bajarê me tune. Ji boyê vî min ew av ji te re anî.

Mîrze Mihemed, ku dipirse çawa av tune. Pîrê dibêje:

— Birasti ava bajarê me zahfe. Lêbelê zîhakî heft serîxwe daye ser ava bajêr, nahêle nuqtek av were bajêr. Ger em herdem jêra keçeke xwe qurban bikin, pa ê piçek av ser me deberdide. Niha dor hatîye keça padî ahê me ya bedew. Yê îro ewî

bibin û ser avê, pê kê î zîha yê heft serî bikin. Lewma padî ah ketîye xemgînîyek mezin. Ketîye nav îne.

Dema Mîrze Mihemed van gotinana guhdar dike, ji pîrê re dibêje:

— Ji min re hespekî ba û bilez lazime.

Pîrê hespekî kumêt peyda dike. Mîrze Mihemed hinek zêr zîv dide pîrê, helaliyê û xatirê xwe jê dixwaze û radibe diçe.

Mîrze Mihemed diçe diçe diçe der û bera, kort û newala, cih cih çîyayan derbas dibe û tê ber ikefta çîyakî ku ava gund tê de dizê. Dinêre ku ciwanên gund hemu hatine wir, keça padî ah jî ba wane. Mîrze Mihemed tê ber ikeftê û xwe vedi êre, li wana dinhêre. Ciwan, keça padî ah datînin ber devê ikeftê, ser zinarekî mezin. Ku dengê bayê difnê zîha tê, civan hemu ditirsin, direvin bela melayî dibin. Xwe vedi êrin. Zîhayê heft serî, serê xwe yeko yeko derdixe û ber bi keça padî ah ve tê. Zîha wek berê, keça ji bo wî hatîye anîn dike ku bixwe. Dema ku xwe dirêjî keçê dike, Mîrze Mihemed ûrê xwe diki îne û derbekî de ji heft serî yê zîha yekî jêdike û davêje wê derê. Zîha pir bi hêrs dibe, bi serê xweyî dinan ve dike ku êri î Mîrze Mihemed bike. Lêbelê Mîrze Mihemed destê xwe sivik hildide, fersendê nadê. Lê dixê serê zîha hemiyar jedike û zîha dikuje. Keça padî ah xelas dike. Ava ku zîha girtibû, vedike. Êdî ava bajêr diherike û diçe bajêr.

Heya wê demê civanên ku xwe ve artibûn, derdikevin holê. Wek ku wana zîhayê heft serî ku tîye dixne qare qar. Ew dibê, “Min zîha ku tîye”, yê din dibê, “Na min!” Ku dema Mîrze Mihemed keça padî ah xelas dike, xwe dide aliyekî. Pa ê jî diçe mala pîrê. Ew civanana, keça padî ah hildidin û dibine mala padî ah. Padî ah ferman dike dibêje:

— Kê ew zîha ku tîye, keça min xelas kirîye, ezê keça xwe bidime wî.

Lêbelê gelek civan dertên dibêjin:

— Me zîha ku tîye û keça padî ah xelas kirîye.

Padî ah ku nizane ka kêye ew zîlam, ji keça xwe di êwire. Keça wî dibêje:

— Sibê bila zîlamê bajêr hemu ber qesra me re derbas bibin. Ezê bibêjim ka ew zîlam kêye.

Keça padî ah wusa dike ku Mîrze Mihemed nasbike. Lewra dema Mîrze Mihemed, zîhayê heft serî dikuje û ewê xelas dike, keçik destê xwe xûna zîha de dike û navmilê Mîrze Mihemed dixê.

Sibetirê zilam hemu ber derê padî ah re derbas dibin, lêbelê keçik Mîrze Mihemed nabîne di nav wan de. Padî ah dibêje zilamên ku nehatibine, bila agahî bidine wan jî. Bila her kes were. Ew dem pîrê dibêje Mîrze Mihemed:

— Rabe here ba padî ah. Xwe vene êre. Padî ah belkî ji derdê te re çareseriyek bibîne. Yek ji virrên wan civana hemîya derxe holê. Ti tê ku nekirine bila nebêjin me kiriye.

Mîrze Mihemed zilamekî wusaye ku naxwaze pesnê xwe bide. Qencîyê ku kirîye, naxwaze were zanîn ku ewî kiriye. Lêbelê ku pîrê wusa dibêje, nêçar dimîne û diçe, ku ew jî ber mala padî ah re derbas bibe. Civan hemu ber derî re derbas dibin, keç disa kesî re nabêje evaye. Di dawîyê de Mîrze Mihemed tê ku derbas bibe, keç Mîrze Mihemed nasdike. Lewre dema ku Mîrze Mihemed zîha yê heft seri dukuje, civan tevlihev dibin, keç destê xwe xwîna zîha de dike û pi ta Mîrze Mihemed dixê. Ji boyê vê keçik ewî dinase û dibêje ev e. Ew dem gelên bajêr hemu dia û spasiyên xwe Mîrze Mihemed re dikin. Padî ah dibêje Mîrze Mihemed:

— Te em destê wî cinawirî xelaskir. Keçeke min hebû, hin mabû ku ez wî windakim. Te ew xelaskir. Tu zilamekî bêtirs û ba î. Bixwaze ji min çî dixwazî. Dixwazî li vir bimîne, bi dilê xwe. Ez keça xwe jî didime te. Bixwaze zêr û zîv, dewlemendiya dinê!

Mîrze Mihemed çî hatiye serê wî ji padî ah re dibêje. Dibêje:

— Ger ez derkevîm heft qat rûzemîn, birayên min ji min re xiyaneî kirine ger ev kirinê wan wusa nemîne. Min dema dêw ku t sê keç xilaskir. Dilê min kete keça piçuktur. Va gustilka wî ba mine. Ka ew çî halîdane? Bavê min çî rew êdane? Ger ez heft qat derkevîme ser rûzemîn û herim ba wan.

Padî ah û her kes pir xemgîn dibin, ji bo ti tî hatine serê Mîrze Mihemed. Lê belê nizanin ka yê çawa ji Mîrze Mihemed re bibine alîkar. Tu çareyek tune ku wî derxine ser rûzemîn. Pa ê ti tek tê bîra padî ah û dibêje:

— Ji bo ku tu derkevî ser ruyêzemîn, bitenê çareyek heye. Ew çare jî Teyrê Sîmir. Teyrê Sîmir, teyrekî hêrî mezine û pir bi hêze. Lêbelê ev çend sale marekî mezin miseletî hêlûna wî bûye. Kîngê cucikê wî ji hikan derdikeve, diçe derdikeve ser dara hêrî bilind û mezin ku hêlûna Teyrê Sîmir li wire, cucikê wî dixwe. Ku tu herî, wî marî bikujî, dibe ku ji te re bibe alikar.

### **Be a Sêyemîn**

Mîrze Mihemed radibe, destûr ji padî ah dixwaze û dikeve rê. Diçe diçe diçe, dikeve nava daristaneke dijwar de. Pa ê tê binê dareke mezin. Dinihêre serserê darê hêlûneke mezin, nav hêlûnêde sê hev cucikên Teyrê Sîmir. Teyrê Sîmir çûye ku ji cucikên xwe re xwarinê bîne. Mîrze Mihemed hildiki e ser darê û xwe vedi êre. Demek derbas dibe xu e xu ek tê. Mîrze Mihemed dêna xwe didê marekî mezin, dirêj hat. Xwe darê ve aland û derkete jor, hat ber hêlûna ku cucik tê de. Hemle dike ku cucika bixwe. Serê xwe dirêj dike ku cucikan bixwe. Wê demê Mîrze Mihemed ûrê xwe diki îne, çawa lêdixe serê wî jêdike, davêje wê derê. Pa ê berjêr dibe, mar perçe perçe dike, dike qûçeke mezin. Demek derbas dibe dengê Teyrê Sîmir dût ve tê. Bayê baskê wî wek, bagerekî daristanê dihejîne. Ku dibîne li wan dera di xwîne de maye, pir hêrs dibe lewra dibeje qey mar dîsa cucikên wî xwariye. Bilez diçe dibîne ku her sê cucikên wî jî di hêlûnê de nikilên xwe ber bi jor ve vekirine û hêvîya wêne. Pa ê xwîna erdê dinêre, bin pelên darêde quça marê ku Mîrze Mihemed ku tîye û daye ser hev dibîne. Pir kêfxwe dibe ku cucikên wî ji wî marî xelas bûye. Lêbelê dibêje ka kî ev mar ku tiye? Dema ku ew ser vê fikirîne, Mîrze Mihemed derdikeve holê. Teyrê Sîmir dike ku êri î Mîrze Mihemed bike û wî bikuje, cucikên wî ti tîn ku qewimîye Teyrê Sîmir re dibêjin. Ew dem Teyrê Sîmir:

— Ev çend sale vî marî cucikên min dixwar û ez nêçar hî tibûm. Te cucikên min xelaskir. Ka bixwaze, jimin çi dixwazî bixwaze!

Ew çax Mîrze Mihemed ji Teyrê Sîmir re çi serê wî re derbas bûye dibêje. Pa ê jî dibêje:

— Ger ez herim derkevim ser rûzemîn. Bîghîjime malbata xwe, tola xwe bistînim. Lewra birayên min ji min re xîyanetî kirine. Keça piçuk ku min ji dêw xelas kir, gustîlka xwe daye min, gelo halê wî çiyê û ew jî ber serê min naçe. Ez heft qat

binê erdê de, li vê derê me. Çawa ezê derêm ser rûzemîn, nizanîm. Jimin re gotin ku bitenê tu dikari alikariya min bikî.

Ew dem Teyrê Simirdibêje:

— Erê, ezê alikariya te bikim. Lêbelê ger tu herî ji min re heft heb cendekê mîhan û heft heb jî sîtilên tije av bînî. Dema ku tu ser pi ta min siwar bûyî û em firîyan, di her qatê de ku min got “quk”, tê cendekê mihê bavêjî devê min û pa ê jî sîtilekî avê berdî devê min. Heya ku em derketine ser rûzemîn.

Pa ê îretêkî jî ji Mîrze Mihemed re dike û dibêje:

— Ne be ku tu cendekê pez û ave bixî xwar. Ew dem em nikarin derkevin ser rûyê zemîn.

Mîrze Mihemed radibe diçe û heft cendekê mîhan û heft heb jî sîtilên tije av tîne. Ser bi ta Teyrê Sîmir siwar dibe û hewa dikevin. Dema ku her qatê de Teyrê Sîmir dibêje “quk” Mîrze Mihemed cendekê davêje devê wî û sîtileke avê ser de dike. Wûsa her qatî derbas dibin. Dema têne qata dawî ku derbas bibin, Mîrze Mihemed dike ku cendekê mîha dawi bavêje devê Teyrê Sîmir. Cendekê mihê destê wî de di iqite dikeve jêr. Nê çar dimîne ûrê xwe diki îne ji kêleka hêta xwe zole go t jêdike û davêje devê Teyrê Sîmir û avekê jî ser de dike. Dema ku qata dawi jî xelas dikin, dertêne ser rûzemin. Teyrê Sîmir Mîrze Mihemed peya dike. Xwatirê xwa ji hev dixwazin. Ew çax Teyrê Sîmir ji Mîrze Mihemed re dibêje:

— De ka here mirazê xwe.

Mîrze Mihemed çima ku ji hêta xwe go tek zaf jêkiribû, dikulîya. Nedixwest Teyrê Sîmir bibine ku ji ber hêta xwe dikule. Ji bo vî sedemê Mîrze Mihemed dibêje:

— Keremke tu pê iyê here, pa ê ezê herim.

Lêbelê dema ku Mîrze Mihemed ji hêta xwe go t jêdike davêje devê Teyrê Sîmir, Teyrê Sîmir ji ber ku zanibûye ew tam tama go tê miha nîne û tama go tê mirovane. Lewma wî go tî nexwariye û avêtiye bin zimanê xwe. Ji bo vî sedemê Teyrê Sîmir Mîrze Mihemed re dibêje:

— Na tu ê pê îyê herî.

Mîrze Mihemed nêçar dimîne, rêva diçe. Dema ku dime e, dikule û Teyrê Sîmir parava wî dibîne ku dikule. Gazî Mîrze Mihemed dike. Dema ku Mîrze Mihemed tê ba wî dibêje:

— Ka delinga xwe ye rastê bide jor.

Ku Mîrze Mihemed delinga xwe hildiki îne jor, Teyrê Sîmir go tê di bin zimanê xwe de derdixe. Hinek tuka xwe lêdixe û wî go ti heta wî ve dike. Di cî da lingê Mîrze Mihemed qenc dibe. Ew çax Teyrê Sîmir difire diçe. Mîrze Mihemed jî dikeve rê ber bi bajarê xwe ve diçe. Dema ku nêzîkî bajar dibe, ber maleke piçuk pîrekî dibîne. Selam dide pîrê, pîrik selama wî digre. Pîrê ji Mîrze Mihemed dipirse ka li ku tê û diçe kû. Mîrze Mihemed naxwaze xwe bide nasin. Dibêje ez mêvanim ji wî gundî tîm ezê herim mala padî ah. Dema ku behsa mala padî ah dibe pîrê behneke kur diki îne û dibêje:

— Mala padî ah de demeke dirê e ku î n û xemgînî heye. Dema ku her sê kurê padi ah diçin ku dêwê bax û bexçeyên wan talan dike bikujin, çawa ku birayên mezin dibêjin, birayê wani piçuk binave Mîrze Mihemed, werisê navtenga wî diqete dikeve birê û dimire. Her du bira dêw dikujin. Sê keçên ku dêw wan revandîye û wan heps kirîye, du bira wan keçan xelas dikin û dînin mala xwe. Birayê mezin keça mezin re, birayê navîn keça navîn re dizewice. Lêbelê keça piçuk bi kesî re nazewice. Çiqas ciwan hatine destgîrîyê wî jî hemîya zivirandîye. Wê demê heyra niha ti ti tek nexwarîye û nexwe nava nivînan de ye. Padî ah çiqas hekim hene anîne ku derdê wî re çareserî bibînin, lebelê tu hekîmekî çareserîyek nedîtiye. Xwarin vexwarina hêrî ba jê re dînin, disa jî naxwe.

Dema ku Mîrze Mihemed van gotinên pîrê guhdar dike, ba fem dike ku birayên wî çî anîne serê wi. Padî ah û gel re çî vir vizik kirine, ba fehm dike. Pir ber keça piçuk dikeve. Pa ê ji pîrê re dibêje:

— Ji min re tase îr bine.

Ku pîrê îr dîne, Mîrze Mihemed gustila ku keça piçuk dabu wî derdixe, bi dizi ve davêje nava jîr ku pîrê nebîne. Pa ê ji pîrê re dibêje:

— Ku tu vê îrê bivî bidî keça piçuk, tu çî bixwazî ezê bidime te. Lêbelê kesîre nebêje kê ev îr andîye.

Ew dem pîrê dibêje:

— Ew keça bedewe ku ji destê nedîmeya, destê hekîma, bi destê nazik û narîn ti tekî naxwe, venaxwe; yê çawa ji destê minê qurmiçiye bixwe.

Mîrze Mihemed dibêje:

— Dema ku te tasa îr dirêjî keça piçuk kir, bêje “tu keseran dilê xwe” tu vî îrî vexwî. Ew dem ewê îr vexwe.

Pîrê îr dibe. Mîrze Mihemed çawa jêre gotîye wusa dike. Keça piçuk pê iyê îr hîlnade. Lê dema pîrê jê re dibêje, “ji kesera dilê xwe” tu vê tasa îr hildî û vexwi. Ew dem, gotina wî ye ku dema gustilka xwe dabû Mîrze Mihemed dikeve bîra wê. Ji bo xatirê vê gotinê keça piçuk tasa îr digire û vedixwe. Wextê îr xelas dibe, gustilka dabû Mîrze Mihemed di binê tasê de dibiriqe. Ew çax rih pêde tê, rûyê wî dikene û qenc dibe. Padî ah ku dibîne keça piçuk ba bûye, ferman dide her derî û zîyafetek mezin dide amadekirin. Her kes tê zîyafetê. Birayê mezin û yê navîn jî tên. Mîrze Mihemed dema ku herkes li wê derê top dibe, derdikeve holê û xwe dide nasîn. Padî ah û herkes matmayî dimînin. Mîrze Mihemed, çi kiriye, birayên wî çi anîne serê wî yeko yeko ji herkesî re dibêje. Her sê keçên ku birayên Mîrze Mihemed wan tirsandibûn ji ber ku ti teki nebêjin, ew jî rastiye dibêjin. Pa e padî ahê bavê wî gazî Mîrze Mihemed dike û jê re dibêje:

— Tu kurê minî hêrî ba , bêtirs û camêrî. Ji vir pê ve ev dewlemendîya min, ev saltanata min ya te ye. Destê xwe bi xwîna birayên pîs, pîs neke!

Padî ah bangî her du birayên mezin dike, ji wan re dibêje:

— Ji vir waha hunê ber destê Mîrze Mihemed de bin! Ewî çi gotiye hunê gotina wî bikin.

Ew jî kirinên xwe po man dibin. Mîrze Mihemed wan dibex îne û ef dike.

Pa ê Mîrze Mihemed û keça piçuk digihîjine hev û dizewicin bi hev re. Heft roj û heft ev daweta wan dibe û berdewam dike.

Ew dighejin mirazê hev, em jî bighejin mirazê xwe. Çîroka me firiya çû diyaran, rihmet li dê û bavê guhdaran.

### **Der barê vebêjêran de agahî**

Berhevkar : Mehmet Yıldırım – Bedrettin Kırka aç

Nav û pa nav : Sakîne YILDIRIM

Cihê jidayîkbûnê û temen : Gundê Qeremêlik/ 64

Asta perwerdehiyê : Bêperwerde

Navnê an : gundê Qeremêlkê/Erdî / Wan

Çavkaniya wî : Mezinên gund

Dever : Erdî

Mêjûya berhevkirinê : 2012



### 3. ÇÎROKA SEYEMÎN

Hebû tinebû, pîrek heft hev jî kurê wê hebûne. Navê kurê wê mezin Mîrze Mihembûye. Ciya Mîrze Miheme hemle bûye. Bavê wî miribûye. Nêzîkî razana ciya wan Mîrze Miheme karê nêçîrê dike. Ji ciya xwe ra dibêje:

— Em ê herine nêçîrê, belkî em egle bûn, dereng man, ku tu razayî zara te kur be ber derî ûr mertala darda ke, heke ku qîz be te î kuliya darda ke!

Isa dibêje, birayê xwe dide rex xwe radibe diçe nêçîre. Çend roja li nêçîrê dimînin. Ciya wan jî dikeve ber razanê, jineke ji razanê fehm dike tê ber ciya wan, ciya wan radizê jê ra keçîkek dibe. Mîrze Miheme jî son xariye, gotiye ciya xwe ku tu keçîkekî bînî ez ê birayê xwe hemûya bime cem xwe, serê xwe hildim herim. Ciya wî jî gava keçîk jê ra dibe ji bona vê a pa dibe derê malê ûr mertala darda dike. Ewê rojê jî Mîrze Miheme bi birayên xwe va ji nêçîrê dizivirin tên. Tên derê malê dêna xwe dinê wê ûr mertal darda kirîne, a dibin dikevîne hundur, diçine cem ciya xwe. Selam, kêfxa iyê dine hev. Mîrze Miheme:

— Dayê derbasî be. Tu razayî ji te ra çi bû?

Ciya wî serê xwe ber bi aliyê dinê dizivirîne, hinek jî bi tirs dibê:

— Keçîkek ji mi ra bû, mi bi a î ber derî ûr mertal darda kirin.

— Mi son xaribû ku te ra keçîkek bibe, ez ê serê xwe hildim herim.

Ciya wî pêda dikeve, seva neçe dibêje:

— Kurê mi ew jî xû ka we ye, tu çima ber direvî, çi zirara wê ji we ra heye.

Mîrze Miheme:

— Mi son xaribû, ez ser sonda xwe nikarim bizivirim.

Radibe, her e birayê xwe dide rex xwe bi rêdikeve, diçe. Li iherekî dinê xwe ra ko kekî dibînin, tê da rûdinên. Vî qaydeyî bi sala wext derbas dibe.

Ewana li cîkî, ciya wan bi xû ka wan va jî li cîkî heyata xwe dewam dikin. Xû ka wan li cem ciya xwe mezin dibe. Ciya wan navê xû ka wan lêdike Bîblîcan. Rojekî Bîblîcan bi keçîkê taxê va li cem hev rûni tibûne, nav keçîka da deng bi yekî

dikeve. Keçik hemû davêjine istiyê hev, yek dibê bi serê bavê xwe kim, yek dibê bi serê birê xwe kim, yek dibê niza bi serê kê bikim, Bîblîcan jî dibê:

— Ez bi serê golikê be kim ya deng pê ket ez nebûm.

Ji wan keçika yek destê xwe lêdixê dibê:

— Bela negirtê heft birê te hene mîna heft pelevana, mîna heft wezîra, tu çima serê wan son naxwî?

Bîblîcan gava vê gotinê dibihêze radibe, rasterast diçe cem ciya xwe. Dibê:

— Hal mesele iha. Keçikê hevalê mi digotin heft birayê te hene. Ka rastiya vê ji mi ra bêje, birayê mi hene yan tinene, hebin çima haja mi pê tine?

— Erê law ez çî ji te ve êrim çî ji xwedê ve êrim, heft birayê te hene, lê gava ez bi te razam birê te son xarin, xeyîdîn lêdan çûn.

Bîblîcan vana dibihêze xwe dide ‘erdê dibê:

— Ça be ça nebe ez ê herime ce birayê xwe. Heta niha haja mi bi hebûna wan tinebû, lê îro e pê hisiyam, idî e nasekinim.

Ciya wê çîqa pê da dikeve ewê îqna nake. Mecbûr dimîne dibê:

— Temam here ce birayên xwe, lê ez nizanim li kuderê ne. Tê wana ça bibînê. ‘Alimek, zanekî nasê mi heye ez ê te bi înime cem wî, bira ew ji te ra bêje tê wana ça bibînê.

Bîblîcan karê xwe dike, hebanekî çêdike, tijî xarin vexarin dike, dikeve rê diçe ce nasê ciya xwe. Selamê ciya xwe jê ra dibêje, di bê hal hikyet iha. Nasê ciya wê kalekî zane bûye. Bîblîcanê rojekî bal xwe dide sekinandin, heta sibetirê hespekî re bi heriyê jê ra çêdike. Bîblîcanê lê siyar dike, dibêjê:

— Keça mi li vî hespê siyar be, tu kuderê dixazî bêje hespê mi bibe vir, zêde tevî ti tekî nebe, hespê te rasterast hilde bibe wir.

Bîblîcan guh dide kalê, dibêje hespê:

— Min bibe ce heft birê mi?

Hesp berê xwe dide alîkî, orxe dibe, diçe. Gava hesp diçe, qasekî ûnda tê bira kalê ku ti tek bîr kiriye ne gotiye Bîblîcanê.

Bîblîcan ser hespê qederekî diçe, dêna xwe didê kanîk ava wê isa xa diki e, tî jî bûye, hespê dide sekinandin diçe ser kaniye avê têr duxe. Dizivire ku li hespê siyar be, dêna xwe didê wê hespê wê dewsa xwe da bûye xalî. Difikire, ça bikim ça nekim. Dibê ez ê mejbûrî dîsa bizivirim herime ce kalê ka hesp çima bû xalî, bira çarekî jê ra bibîne. Rêdikeve dîsa tê ce kalê dibê:

— Ez hinekî rê da çûm, ji hespê peya bûm, heta mi av vexar e zivirîm hesp bibû xalî.

Kalê jê ra dibêje:

— Keça mi min bîr kiribû ji te ra negotibû. Tû ça li hespê siyar bûyî gereki qe lê peya nebî. Tu gava tî bûyî jî ava xwe se pi ta hespê bixwe, hine av jî ser pi ta hespê da ke, hespê te yê e q bigre, orxe be, tê zûtir herî.

Ba , ser çeva. Bîblîcan xatirê xwe dixaze, li hespê xweyê teze siyar dibe, bi rêdikeve. Diçe nivê rê da tî dibe, ava xwe se pi ta hespê vedixwe, hinekî jî se pi ta hespê da dike, hesp hênik dibe, orxe dibe isa diçe mîna çivîk.

Çendekî diçe diçe, ko kek xûyan dike, hesp diçe li ber wê ko kê disekine. Bîblîcan fehm dike ku eva ko ka biraye wê wan e. Ji hespê peya dibe, ça peya dibe hespê wê dewsa xwe da dibe xalî. Ber bi ko kê diçe, ji xwe ra dibê ez ê derê pi tê ra, dizîkava bikevime hundur ka kê heye kê tineye. Deriyê ko kê yê pi tê ra dikeve hundur, dêna xwe didê kesek ko kê da nayê xûyan, lê li ser masekî di tasê da birincekî germ hulm jê radibe li wire. Ew li rêwîtiyê hatiye birçî bûye. Bi wê birçîbûnê destekî xwe dixê nav birinc, çengekî jê hildide dixê devê xwe. Hê birinc nexaribûye dengêk tê. Derdorê xwe dinihêre, dolavek li wir bûye, diçe dikeve dolavê xwe vedi êre. Qasek ûnda mêrîvekî genç, xurt dikeve hundur. Ewa jî birê Bîblîcanê yê piçûk bûye. Navê wî jî Çako bûye. Çako dêna xwe didê wê birinc kê m bûye, dewsa lepekî di tasa birinc da heye. Derdorê xwe dinihêre kesek tine. Qulç milça dinihêre dîsa kesek tine. Ber bi dolavê diçe dibê:

— Tu kê bî derê ez ti tekî te nakim netirse.

Dengekî du denga dîsa gazî dike. Tê ber dolavê ku dolavê veke, Bîblîcan dêna xwe didê wê xilaz bûna wê tine derê dolavê vedike, derdikeve. Çako dibêje:

— Tu kê yî, çi derdê te heye, te çima xwe ve artiyê di vir da?

Bîblîcan idî hatiye girtin, rûdinê hal hikayatê xwe jê ra dibêje, dibê:

— Min bihîst ku hûn hene ez hatim we bibînim, naz bikim.

Bîblîcan bi Çako va xwe davêjine hemêza hev, hev paç dikin, bi hev a dibin. Heta êvarê behsa xwe, ciya xwe, piçûktaya xwe dikin. Ber bi êvarê Çako dibê:

— Qasekî ûnda birayên me yê dinê jî yê werin. Bîblîcan:

— Ku ji mi hiz nekin, ku ji mi ‘aciz bin? Ji ber mi, ez ciya mi hî tin, li ber mi revîn hatine vir. Ez hê xwe nî an wan nedim belkî çêtir be. Heta çend roja hêdî hêdî ji wan ra bêje. Heger ku ji mi hiz bikin ez ê derêm xwe nî anê wan dim.

Çako jî isa qebûl dike. Dibêje:

— Tu rast dibêjî. Mîrze Miheme birayê meyê mezin e. Zehf jî bi hêrs e, ku hatina te xa a wî neçe, yê serê mi jî serê te jî jêke. Yê pirtikê teyê mezin di guhê te yê piçûk ra dexe. Ez ê te odekî da ve êrim, tu qe dengê xwe neke. Çaxê ku hatin, me nan xar ez ê pi tî nan be’sa te ji wan ra bikim, ber wan ra bavêjim ka qe çi dibêjin.

Ser çeva. Çako Bîblîcanê dixwe odekî. Qasek ûnda birayê wan hemû tên. Selam, kefxa î... Mîrze Miheme derdora dinihêre, dibêje:

— Çako bêna nêvana li malê tê. Kê hatiye?

Çako:

— Heyran nêvanê çi, serê vî çiyayî nêvan çi digerin?

Mîrze Miheme bihar nake, dibê:

— Kuro rast bêje, ez dizanim, bêna merivê xerîb ji malê tê. Tu nebêjî em ê bigerin ew kê be jî em ê bibînin. Rastiya vî î î bêje ka kê li mal e?

— Birayo tê bîra te, wextekî xû keke me hebû, ciya me hebû. Me ciya xwe xû ka xwe ci da hî t em lêdan hatin. Qe em lê nebûne xuyî, qe em ser da neçûn, me ew nepirsîn...

— Rast e Çako, me a î kir, xeta kir me ewna cî da hî tin em hatin, me xeta duduya jî kir ku em neçûn li wan nepirsîn.

Çako gava van gotina dibihêze kêfê wî xa dibin, a dibe ku birayê wî yê mezin ti tekî xirab negot. Dibê:

— Em neçûne dîtînya wan, xû ka me hate dîtînya me. Mêvan jî ew e.

Gava Çako isa dibêje Mîrze Miheme jî ew birê wan yê din jî zehf a dibin.

Dibê:

— Ka xû ka me ku derê ye, bîne nî anê me xe.

Çako diçe Bîblîcanê tîne. Mîrze Miheme Bîblîcanê hemêz dike, Bîblîcan bi birayê xwe yê dinê jî hev hemêz dikin, pîr kêf xa dibin, bi hev a dibin. Bi ev heta dereng rûdinên, behsa xwe halê xwe dikin. Radibin radizên. Sibetirê radibin. Mîrze Miheme dibê:

— Bîblîcan, em ê îro Çako jî hildin herine nêçîrê. Tu ber malê bimîne. Ji me ra nan, xarinê çêke. Pi îkeke me jî heye. Te çi xurek çêkir tê pê iye bidî pi îkê, pa ê te'm ki bixwî. Ku tu pê iyê bixwî pa ê bidî pi îkê, pi îkê bixeyîde, hêrs be here se agir da bimîze, ça bike ça neke yê wî agirî bitemirîne. Li serê vî çiyayî jî agir nayê dîtîn, bê îmkan e.

— Temam tu ça dibêjî ez ê isa bikim.

Bîblîcan, birayê xwe hemûya bi rê dike, ewan diçine nêçîrê, Bîblîcan jî dizivire tê ko kê. Hundurê malê paxi dike, virda wêda dibe nîvro. Radibe ku xurek çê ke. Xwe jêhatî dike dibê ez ê hine birincê mewûja çêkim. Mewûja bi birinc va tîne, çend hev mewûja davêje devê xwe, pa ê pi îk dikeve bîra vê. Heta pê dihise pi îk dixeyîde diçe agirê hindik maye bitemire ser da dimîze agir ditemirîne. Li çoka dixê, ji xwe ra dibê ka serê vî çiyayî ez ê agir ji kuderê bibînim. Bê çare derdikeve derva derdorê xwe dinihêre, dêna xwe didê ji cîkî dûr dûkî zirav bilind dibe. Satilokekî hildide, xwe bi wî dûyî digre diçe. Diçe dêna xwe didê dû ji xanîkî radibe. Diçe dikeve hundurê xanî dêna xwe didê heft keçik rûni tinê tevnê çêdikin. Sîtil li ser tendûrê dikelin. Hineka da go t, hineka da denî, hineka da xurekê dinê dikelin. Ji wan keçika yek radibe bilez pê va tê dibêjê:

— Xû ka mi tu serê vî çiyayî çi dikî? Ku pîra sêr were yê serê te jî lêxe serê me jî lêxe.

— Ez hatime hine agir, hine agir bide mi e zûtirê herim, bira pîrê nebe bela serê mi, serê we.

Keçik hine agir dixê satila wê, hine denî jî dixê pê a wê, Bîblîcanê zû di îne ku hê pîrê nehatiye. Bîblîcan rêdikeve, waxtê diçe binê satila wê qul bûye, xalî hema isa rodibe heta ber derê ko ka birayê wê.

Pîra sêrê jî diçe xaniyê xwe, derî vedike li keçika dinihêre, tabî bi sêrê dizanibûye ku yek hatiye xaniyê wê. Li keçika dipirse:

— Waxtê ez li malê nebûm, kê hate vir ka ji mi ra bêjin! Bêna xerîba, bêna însanê îrê xav ji vir tê.

Keçik ji tirsê vedi êrin, dibêjin me kes nedîtiye. Ji pîrê ra nabêjin.

Pîrê derdikeve derva dêna xwe didê wê hema isa xalî robûye. Pîrê xwe li wê xaliyê digre, teqîb dike, diçe. Diçe ber ko ka Mîrze Miheme wana. Pîrê diçe ber derê ko kê, li derî dixê. Gazî dike:

— Bîblîcan! Tu hatî te bê destûra mi agir ji mala mi dexist bir. Ez ti tê isa qebûl nakim. Yan ez ê heft birê te bixwim, yan jî tê tiliya xwe ber derî ra dexî ez ê xûna te bimijim bixum.

Bîblîcan difikire, xwe ra dibêje ez ê ça bihêlim ev pîra heft birayê mi buxe. Dêna xwe didê wê xilaz bûna wê jî ji pîrê tine. Gazî pîrê dike:

— Pîrê hinekî derva bisekine, ez ê qasekî ûnda tiliya xwe dexim, tiliya mi bimije.

Pîrê li derva disekine, Bîblîcan jî bilez xurek ji birayê xwe ra çêdike, hazir dike. Tiliya xwe ji ber derî ra derdixê, gazî pîrê dike. Pîrê tê derzîkî tiliya Bîblîcanê dixê, devê xwe dixê dimije. Xuna Bîblîcanê isa zehf duxe, Bîblîcan li wir dikeve xwe va diçe.

Mîrze Miheme bi e birayê xwe va tîn, li derî dixin kesek nayê derî venake. Carekî, du cara, sê cara li derî dixin Bîblîcan pa ê ser hemdê xwe da tê diçe derî li wan vedike. Lê dipirsin:

— Te çima derî isa dereng vekir, ti tekî xirab, neba hebû?

— Na ti tekî neba tinebû. Ez kêlêrê bûm, deng dereng hate mi, loma mi derî dereng vekir.

Derbasî hundur dibin. Rojek, du roj, sê roj kê gavê tên, ber derî dimînin, Bîblîcan derî dereng vedike. Mîrze Miheme rojekî dibêje Çako:

— Tu îro li malê bimîne, xwe cîkî da ve êre ka ev keçik derî çima dereng vedike, çi dike, çi tê sêrî?

Ba , ser çeva. Çako ewê rojê xwe cîkî da vedi êre, bendewariya Bîblîcanê dikeve. Dêna xwe didê Bîblîcan rabû mal da hev, herder paxî kir, kinc û tin, xûrek çêkir. Rûni t ku bêna xwe bistîne. Dêna xwe didê wê pîrek hate ber derî gazî Bîblîcanê kir, Bîblîcanê destê xwe ber derî ra derxist, pîrê tiliya wê mêt, xûna wê xar, gava Bîblîcan xwe va çû pîrê jî lêxist çû.

Mîrze Miheme wana êvarê tên, Çako dizîkava hal hikyet jê ra dibêje. Mîrze Miheme virda wêda difikire, sibetirê birayê xwe di îne, herkes diçe karê xwe, ew jî li malê dimîne. Bîblîcanê jî îret dike. Li hêviya pîrê disekinîn. Wext derbas dibe, dibe pi tî nîvro. Dêna xwe dinê pîrê hat derî da. Mîrze Miheme derê pi tê ra dertê xwe li pîrê vedi êre, Bîblîcan jî ber derî ra destê xwe derdixe. Pîrê gava derziyê tîne tiliya Bîblîcanê xe qul ke Mîrze Miheme xwe digihîne, pîrê heta pê dihise dike bireve Mîrze Miheme ûrê xwe li serê wê dixê, serê wê ji bedena wê diqetîne. Tîne pîrê qet qetî dike, parçê wê dide ser hev agir berdidê di ewitîne. Xaliya wê jî dixê satilekî, dide Bîblîcanê dibêje:

— Bîblîcan eva pîra sêrê ye, xaliya wê bibe zehf dûr ro ke, ji hev bela ke seva ku dîsa ranebe.

Bîblîcan satilê hildide bi rêdikeve, lê satil ya cara din bûye, ew satila qul bûye. Bîblîcan çiqê diçe xalî heqa isa dirije. Dewsa wê xaliyê jî hemû dibe pincar. Heta diçe cîkî dûr ku birêjîne ‘hevke xalî tenê satilê da mabûye. Bîblîcan bi satilê û rijandina xaliyê nehisiyabûye. Wê xaliya mayî dirêjîne, li hev bela dike, bi dilekî rihet ber bi ko kê dizivire.

Gava Bîblîcan wê da tê, ew pincara dewsa xaliyê hê îne bûye ji xwe ra dibê “Ev çi pincareke xa tê xûyan, ez ê wê pincarê bibim ji birayê xwe ra texime girar.” Çiqê rê da tê heqas pincarê diçine, dixê pê a xwe, tê ko ke. Pincarê dikelîne dixê girar. Êvarê birayê wê hemû tên, mirina pîrê ra zehf a dibin. Bîblîcan ji wan ra nan, xarinê datîne. Ji hemûya ra girarê tijî dike. Gava girarê dixun, qasek ûnda her yekî dibe tebakî, dibe heywanekî. Bîblîcan a metel dimîne, ti tek jî ji testê wê nayê.

Dertê derva ser do kê rûdinê halê xwe birayê xwe ra digirî. Hinekî li wir disekine dinihêre merivek ji dûr va ber bi wê tê. Tê cem disekine. Dibê:

— Çi derdê te heye tu çima iha digirî?

Bîblîcan, çî bûye ji wî merivî ra dibêje. Dibê:

— Her birakî mi bûye tebakî, ez bê çare ma me, nizanim ez ê çî bikim.

— Ku ez heft birê te dîsa têxime meriv, tê mi bikî, bibî jina mi?

Bîblîcan son dixwe dibê:

— We'd be, ku tu birê mi têxi meriv ez ê te bikim.

— Ba e. Em ê herine çiyayê hanê, tê di newalê da bisekinî, guhê xwe bigirî, ez ê her yekî qamçîkî lêxim, ku dengê qamçî were te dora kîjan birê te be ew nabe meriv, ku deng neyê te yê bibe meriv.

Radibin lê dixin diçine wî çiyayî. Bîblîcan guhê xwe digre ew meriva e hev birê wê dixê meriv, gava dora Çako tê mêrik qamçî lêdixê dengê qamçî diçe Bîblîcanê. Çako nabe meriv, mîna berê bi berantiya xwe dimîne. Mêrik dibêje:

— Idi merivbûna Çako hêviya Xwedê va maye, Xwedê kingê lê were rehmê yê wî çaxî bibe meriv, yan jî qe nabe meriv.

Hemû li hev kom dibin, li serê çiyê berjêr dibin diçine ko ke. Bîblîcan her ti tî ji birayê xwe ra dibêje. Behsa sozê xwe, sonda xwe dike. Birayê wê jî qebûl dikin, Bîblîcan sonda xwe tîne dewşê, mêrik dike, dibe jina wî.

Bîblîcan diçe mala mêrê xwe, dibê bira Çako jî ce mi bimîne ser guhê minê çêtir ser be. Çako jî dine ce Bîblîcanê.

Mehek, du meh, sê meh derbas dibe Bîblîcan ducanî dibe, hemle dimîne. Mêrê wê jê ra berdestîkî digire, tîne malê. Lê berdestî qe hij Bîblîcanê nake, dexesiyê jê dike. Rojek, du roj, sê roj Bîblîcan tam giran dibe, rojê razana wê nêzîk dibe. Rojekî ji van roja Bîblîcan li derê malê bûye, berdestiya wê jî kinc di û tibûye. Dibêje Bîblîcanê:

— Xatûnê destê mi nava kinca da ne, tu dikarî ji bîrê satile av dexî berdî ber destê mi?



Bîblîcan satilê davêje bîrê, satil tijê dibe, gava xwe xar dike ku satilê derxe berdestiya wê tê yekî lêdixe, wê ser serî davêje bîrê. Dêna xwe didê beran çako van kirinê wê dibîne.

Berdestî diçe hine kincê xatûna xwe derdixe li xwe dike, hine pîne paçik jî dixê ber kirasê xwe, zikê xwe pê mezin dike seva ku mêrê Bîblîcanê jê ik nebe, bê eva Bîblîcan e hemle ye.

Dibe êvar mêrê Bîblîcanê derî va tê hal xatir, virda wêda. Dibêje:

— Pitê berdestiya me kû da çûye qe nayê xûyan!

— Îro malbavana wê hatibûne vir, ew jî gihê te wan, bi wan ra lêxist çû.

Dibe derengî radizên. Çend ro disa derbas dibin. Jinik xwe vedi êre, xwe nade dest, xwe belî nake. Bîblîcan jî di bîrê da radizê du hev kur jê ra dibin. Navê wan jî datîne Hesên, Huseyn. Berdestî dêna xwe didê beran hema isa dora bîrê diçe tê dixê kale kal. Dizane ev beran birayê Bîblîcanê ye jî. Jinik dibê “Ev ê mi bide dest, yê haja millet pê xe ku mi Bîblîcan avêtiye bîrê.” Difikire ez çî bikim çî nekim. Ji xwe ra dibê “Ez ê vî beranî bi me erjêkirin seva ez jê xilaz bim.”

Gazî mêrik dike, gazî mêrê Bîblîcanê, zaten xwe jî xistiye dewsa Bîblîcanê. Dibêje:

— Îro me’de mi isa diçe go tê beran, ku ez go t nexum ez ê ber bavêjim. Eva çend mehe Çako nebû meriv, îro ûndatîr jî nabe meriv, idî baweriya mi nema. Qe nebe Çako erjê ke, bira hinekî kêrî xû ka xwe were.

— Ewa birayê te ye belkî ni kava bû meriv em çî dizanin. Dîsa jî tu dizanî, tu bêjî illahim em erjê kin, ez ê erjê kim.

— erjê ke, tu umûda mi nema, qe nebe bira hinekî bi kêr bimire.

Mêrik çibike, hinekî bi upe diçe kêrê tîne, tê cem beran Çako, dorê diçe tê ku bigire erjê ke. Çako dêna xwe didê wê eva ciddî ye, yê wî erjê ke, xû ka wî jî yê bê heyf here. Direve, dora bîrê diçe tê. Zabê wî dide pey ew direve, ni kava dibê bekî hema ji devê mi, ji dengê mi fehm kir ez jî xilaz bûm, Bîblîcan jî xilaz bû. Dixê kalinî, dixê qarinî dibê:

— Bîblîcan di bîrê da Hesên Huseyn pê ê da.

Bîblîcan jî di hundurê bîrê da gazî dike:

— Bîblîcan di bîrê da Hesên Huseyn pê ê da.

Carek du cara hum deng ji beran tê hum jî ji bîrê tê. Mêrik dibê vî î î da î ek heye, merivekî xwe tîne werîsekî davêje navtenga wî, dadixe bîrê. Merivê wî berjêrê bîrê dibe dêna didê wê Bîblîcan bi du hev zaroka va wê di bînê bîrê da nin. Ew meriva pê iyê herdu zaroka pa ê Bîblîcanê derdixe rûyê dinê. Herkes a metel dimîne. Bîblîcan bi mêrê xwe va xwe davêjine pêşîra hev. BeranÇako jî tê ce wan. Bîblîcan ça beran hemêz dike beran dibe meriv, Çako digihêje merivtaya xwe. abûna wan du car heqa mezin dibe. Mêrê Bîblîcanê dibê:

— Ev çend roje tu di bîrêdanî, çi hate serê te, ewa ketibû dewsa te ew kê bû?

Bîblîcan hal hikayetê xwe ji hemûya ra dibêje. Dibê:

— Çi anî serê mi, berdestiya mi anî serê mi. Ewa ketiya dewsa mi jî ew e.

Mêrê Bîblîcanê xwe bi berdestiyê ra digihîne, nahêle bireve, digre tîne ji ‘ulûmata ra serê wê ber çevê herkesî lêdixe.

Birayê Bîblîcanê jî van ti ta dibihêzin rêdikevin têne mala Bîblîcanê. Bîblîcan dibêje:

— Hinde bela serê me ra derbasbûn, em ji van bela hemû xilaz bûn, lê kesera ciya mi di dilê mi da ye. Em hinde ji hev dûr ketin, idî bese. Herin ciya me jî bînin, heta ‘emrê me hebe idî em ji hev neqetin!

Mîrze Miheme diçe ciya xwe jî hildide tîne, Bîblîcan bi zar û mêrê wê jî hildide dibe ko ka xwe. Hemû tev di ko ka Mîrze Miheme da heta axiriya ‘emrê xwe di kêf û xa iyê da dimînin, isa dewam dikin.

Sê sêv hatin ji cinnetê. Yek para gotî, du hev jî para cima’etê!

### **Der bareyê vebêjer de agahî**

Berhevkar : Ebubekir KU ÇU

Nav û pa nav : Nuran KU ÇU

Cihê jidayikbûnê û temen : Gundê Nanparêz/ 27

Asta perwerdehiyê : Dibistana seretayî  
Navnî an : Gundê Nanparêz/Ebexe  
Çavkaniya wê : Diya wê(Huri ÇOBAN)  
Dever : Ebexe  
Mêjûya berhevkirinê : 2013



#### 4. ÇÎROKA ÇAREMÎN

Rojek ji roja merivek, sê hev jî kurê wî hebûne. Ev her sê kurê wî mezin dibin, rojekî digihêjine hev dibêjin em ê herin bigerin xwe ra keçika bibînin, bi wan ra bizewicin. Radibin diçin digerin, virda wêda yê mezin dibêje:

— Ez bi qîza pa ê qayîl bûm, ez ê ew ê xwe ra bixazim.

Yê ji yê mezin piçûktir jî dibêje:

— Mi jî qîza wezîr ji xwe ra dît, ez ê jî ew ê xwe ra bixazim.

Yê ji wan piçûktir jî navê wî Mîrze Miheme bûye, ew jî dibê:

— Mi ji xwe ra keçikek nedît, ez ê jî hema ûrê xwe bavêjim, ûrê mi çûye ber kê ketiye ez ê jî ew ê ji xwe ra bixazim.

Radibe ûrê xwe ba dike, kewkîtî dike davêje. Ew ciyê ku ew lê li wir jî kanîk hebûye. Pey ûrê xwe dikeve diçe dêna xwe didê ûrê wî di nav hinde meriv, hinde keçik da çûye ber beqekî ketiye. Ça bikim, ça nekim? Difikire dibê “Qey qedera mi jî serê vê beqê ye, ez ê vê beqê xwe ra hildim herim.” Hildide diçe.

Herdu birê Mîrze Miheme dizewicin, dewata wan dikin. Herkes diçe mala xwe, Mîrze Miheme jî beqa xwe tîne datîne pencerê, ji xwe ra dibê “Bira li vir be heta ka ça dibe.”

Radizê, sibêzû radibe karê xwe dike diçe nêçîrê. Êvarê tê dêna xwe didê herderê mala wî paxî kirîye, xurek jê ra hatiye çêkirin, herti tê malê di tedbîra xwe dane. a dimîne ji xwe ra dibê:

— Gelo ev kê ye hatiye mal paxî kiriye?( Hinekî difikire) Qey jinbirê min in tîn paxî dikin, dizanin ciya mi tine, kesek tine mala mi hilde dayne, ez jî nezewûcî me ji bona wê tîn xarinê mi ra çêdikin diçin.

Rojek, dudu, sisê kê gavê tê malê tertemîz dibîne. Rojekî qirarê xwe dide, dibê:

— Eva iha nabe, ev kê be tê malê gerek ez bizanibim. Jinbirê mi bin jî gerek e bizanibim ku qenciya wana bi êkirînim.

Mîrze Miheme qîrarê xwe dide, sibetirê ji malê dertê lê naçe nêçîrê, xwe ciyekî da vedi êre hundurê malê dinihêre. Dêna xwe didê ew beqa pencerê da bû qizekî rabû kete wan dera, herder paxî kir. Mîrze Miheme nerme nerm derî vedike dikeve hundur, parava destê xwe davêje milê keçîkê. Keçîk vediciniqe li pi t xwe dinihêre, Mîrze Miheme dêna xwe didê, ev keçîk nîne meriv dibê qey milyaket e, ji ber rindbûna wê. Heta niha rindbûneke isa nedîtibûye. Mîrze Miheme bi dilekî na bi hezar dilê dibe dilketiyê keçîkê. Dibêje:

— Ka bêje tu çî isnî, çî cîsnî?

Keçîk dibêje:

— Tu çî bî ez jî ew im, ez meriv im.

— Lê tu çîma isa xwe vedi êrî? Xelq, jinbirê mi hemû tiranê xwe bi min dikin, dibêjin te çûye beqek aniye tu dibêjî jina min e. Hema ez kurkê te name te, seva idî nebî beq, seva herkes jî bizanibe jineke mi heye!

— Ez jî hiz dikim nebime beq. Lê bavê te merivekî saxlem nîne, ew çev bedewbûna mi keve dilê wî yê bikeve mi, yê ti tê xirab bîne serê te, yê te bi îne rêya hatin nehatinê.

— Ew bavê mi ne, yê ça ti tekî isa bike? Fîkrê iha xirab ser guhê xwe bavêje, tu idî nabî beq!

Mîrze Miheme kurkê keçîkê yanê kurkê beqê dibe di ewûtîne, keçîk idî dibe jina wî, dibe bermaliya wî.

Bavê Mîrze Miheme derdikeve, li malê kurê xwe digere, diçe mala herduyê mezin, pa ê tê mala Mîrze Miheme. Tê malê rûdinê ça çev keçîkê dikeve, hi ê wî serê wî diçe. Dilê wî dikeve keçîkê. Qasekî rûdinê radibe diçe mala xwe. Diranê wî hev duxun ez ça bikim, ça nekim? Xwe ra dibê “Ez ê Mîrze Miheme bi înime rêyeke isa ku idî neyê, seva ew dimire ez jina wî ji xwe ra dixazim.” Bi van fikrê xayînetiyê radibe sibetirê diçe mala Mîrze Miheme. Rûdinê ji Mîrze Miheme ra dibêje:

— Kurê mi kumekî mi hebû weke dinyakî bi qîmet bû. Ez li wî kumê xwe digirim nagerim nabînim. Tê herî ce ciya xwe ka kumê mi ça kiriye, bira ji te ra ciyê wî bêje yan jî ku ew ê biribe bira bide te, hilde lêxe were!

Mîrze Miheme ecêbmayî dibe, dibê:

— Heyran ciya mi wê miriye çûye, ka ez ê herim kumê te ça ce ciya xwe bînim?

Bavê wî xwe dide erdê dibê:

— Tê herî, tu ça dikî bike lê here ce ciya xwe ka kumê mi ça bûye. Heger tu neçî, e heqê xwe li te helal nakim, tu evê jî bizanibî!

Wî wextî jî li cem wan edet bûye, kaniyek hebû ye miriyê xwe hemû û tine avîtine wê kaniyê, mirî di wê kaniyê da inda bûne.

Mîrze Miheme bê çare, mecbûrî radibe diçe ser kaniyê, takel Xudê xwe davêje kaniyê. Hinekî nav avê da dimîne, bêna wî diçike, qasekî ûnda derîk vedibe, keçîkek ber derî destê wî digire ewî diki îne hundur, dîsa derî digire. Keçîk dibêje:

— Tu kê yî, van dera çi digerî?

Mîrze Miheme hal hikayetê xwe jê ra dibêje. Keçîk dibêje:

— Isa be tu zabê min î, ez xû ka beqê me. Were ez ê yaliyê te bikim, ez ê rê nî anî te xim, te bi înim ce ciya te.

Keçîk ewî dibe, iverêkî nî an dixê, dibê:

— Tu di vê rêyê da here, pi tî çend meriva tê bigihêjî ce ciya xwe. Lê zêde egle nebe bira ti tek neyê serê jina te, zehf zehf jî selamê mi ji ciya xwe ra jî ji xû ka mi ra jî bêje.

Mîrze Miheme xatirê xwe ji baltûza xwe dixaze, rêdikeve diçe.

Gelekî diçe rastî derîkî tê, dêna xwe didê ciyekî isa xa e, meriv hiznake jê biqete, du meriv jî tê da bûne. Li wan meriva dipirse:

— Ev çî ye, ciyekî çîqa xa e?

— Gava em mirin, em bêgune bûn, bona vê eva ciyê xa dane me. Em ê heta qiyametê di vir da bin.

Mîrze Miheme xatirê xwe dixaze, ji wir derbas dibe, hinekî diçe tarî dikeve erdê. Diçe derîk rast tê, dêna xwe didê merivek hundur da razayî ye. Diçe ber derî ew meriva hi yar dibe, dibêje Mîrze Miheme:

— Were were, ka tê kuda herî?

— Ez ê herime ce ciya xwe. Lê tarî kete erdê ez nikarim herim. Tu nêvana xayî dikî ez î ev li cem te bimînîm.

— Erê kurê mi, î ev li ce mi bimîne.

Mîrze Miheme diçe hundur da xwe ra rûdinê, mêrik jî serê xwe datîne ku razê lê hema isa xirtexirtek ji dîwêr tê. Mîrze Miheme dêna xwe didê ev denga nasekine, li mêrikî dipirse:

— Xalo ev dengê çiyê tê, nahêle ne ez razêm ne tu razêyî?

— Tu îro nêvanî, tê sibê herî. Hema jê vegere, qe î ê te bi vî î î tine.

— Na weleh, heta ji mi ra nebêjî, e naçim. Tê îlakî mi ra bêjî!

— E çî te ra bêjim, bavê mi wê dinê serê wî ji mêvana nexa bû, hiznedikir mevan werine malê. Niha jî miriye gora wî rex mine. Di odeke tariye bê derî dane. Kesek nikare here cem were. Kê gavê mêvanê mi jî tèn hema isa dixê xirexir nahêle mêvan tu rihetiye bibînîn heta sibê. Yanê ew bavê min e.

— E çî bêjim Xudê lê were rehmê, hatiye gorê da jî hê rihet nasekine.

Virîda wêda dibe sibe, Mîrze Miheme radibe xatirê xwe dixaze, dîsa dikeve rê diçe. Hinekî diçe derîk dertê pê iyê, li hundur dinihêre, dêna xwe didê ciya wî nav kulîlka da rûnî tiye, mekanê wê isa xa e, meriv hijheyrane dêna xwe bidê. Ciya wî dêna xwe didê eva kurê wê ye. Radibe xwe davêje pêsrê, zehf bîra kurê xwe kiribûye. Mîrze Miheme jî zehf bîra ciya xwe kiribûye. Ciya wî dibê:

— Kurê mi, çî ji te bûye, çî hate serê te, tu li van dera çidikî?

Mîrze Miheme dibêje:

— Wele hal hikyetê mi bavê mi iha, bavê mi ez andim go here ce ciya xwe, ka kumê mi li cem e yan li cem nîne, çakiriye çî nekiriye.

— Ê kurê mi ez mirime, hatime vir. Ka mi kumê bavê te kura anî ye, ez ê çî ji kumê bavê te kim. Rabe here bavê te tu xapandiyî, çev berdaye jîna te, tu andî vir ku tu dîsa venegerî seva ku jîna te ji xwe ra bixaze. Madem bavê te ev xayînetiya te ra kiriye, idî her ti tî heq dike. Ez ê kumekî bime te, tê cima'etekî kom kî gazî bavê xwe jî kî, vî kumî bi destê xwe bidî serê bavê xwe. Ku bavê te kum ji te bistîne

bixwe bide serê xwe tê bimirî, ku tu kum bidî serê bavê xwe ew ê bimire. Tu bide serê wî, bira ew bimire were vira ez ê dêla wî bigirim, ceza yê wî bimê.

Mîrze Miheme ewê evê jî cem ciya xwe dimîne, sibetirê radibe, xatirê xwe ji ciya xwe dixaze bi rêdikeve. Diçe, diçe heta mala xwe nasekine. Derî dide, jina wî derî vedike, jina wî zehf kêfxa dibe. Hev hemêz dikin, derbasî hundur dibin. Mîrze Miheme behsa çûyîn hatina xwe dike, virda wêda jinik dibêje Mîrze Miheme:

— Madem ciya te isa gotiyê, sibê here bêje bavê xwe bira ew bi milletê gundê xwe hemû bibine nêvanê me. Pa ê jî here ser kaniyê selamê mi ji xû ka mi ra bêje, bira ji mi ra qû xana piçûk, qa ika rûnhelkê bi îne. Mi ra hilde bîne!

Mîrze Miheme sibetirê diçe ce bavê xwe, ji wî milletê gundê wî ra dibêje, ji wira radibe diçe ser kaniyê. Selamê dide kaniyê, gazî baltûza xwe dike. Baltûza wî dertê kêfxa î, virda wêda... Mîrze Miheme qû xanê bi qa ikê va hildide diçe malê. Jina wî di wê qo xane û qa ika piçûk da xurekê welatekî çêdike. Evana bi sêrê bûne. Xurek çiqas xilaz dibe dîsa bixwe tijî dibe. Hinde millet tê xarinê duxe, xurek têra wan dike, hê zêde jî dimîne.

Cima'et pi tî xarinê rûdinên, virda wêda xever didin, çîroka, meseleya ji hev ra dibêjin. Bavê Mîrze Miheme dizanibûye ku Mîrze Miheme kum bide serê wî yê bimire. Dibê "Ez ê kum bixwe bime serê xwe bira Mîrze Miheme bimire ez jê xilaz bim." Dibêje:

— Kurê mi tu hinde çuyî riya dûr, te kum anî, îja bide ez bime serê xwe!

Mîrze Miheme dibê:

— Na bavo, mi çûye ji te ra hinde bi zorî, bi zehmetekî mezin ji te ra aniye ez ê bime serê te. Tû qe 'aciz nebe!

Bavê wî qebûl nake, ew bavê xwe hev dibin tînin, Mîrze Miheme fersendê ji bavê xwe distîne kum dixwe serê bavê xwe. Kum ça dikeve serê bavê wî bavê wî nava cima'etê da dikeve, dirêjî erdê dibe, dimire. Cima'et li hev diçe tê ça bû, ça nebû? Mîrze Miheme dibêje wan:

— Bisekinin, ez ê ji we ra libo libo bêjim.



Mîrze Miheme hal hikyetê xwe bavê xwe ji millet ra dibêje. Millet jî heq dide Mîrze Miheme. Dibin bavê wî davêjine kaniya miriya. Bira ew here gorê jina wî, yanê ciya Mîrze Miheme ceza bidê, Mîrze Miheme bi jina xwe va jî digihêjine mirazê xwe, heyata xwe bi xa î û hizûrê dewam dikin.

### **Der bareyê vebêjer de agahî**

Berhevkar : Ebubekir KU ÇU  
Nav û pa nav : Huri ÇOBAN  
Cihê jidayîkbûnê û temen : Gundê Nanparêz/ 55  
Asta perwerdehiyê : Bêperwerde  
Navnî an : Gundê Nanparêz/Ebexe  
Çavkaniya wê : ‘Eliyê Efo(Ali AVCI)  
Dever : Ebexe  
Mêjûya berhevkirinê : 2013

## 5. ÇÎROKA PËNCEMÎN

Rojekî sê heval diçin nêçîrê û her yek ji wan kevokekê dîkuje. Li wan dibe berf û zeber. Kortik, newal û mesîl tije dibin berf û tu der ji berfê xuya nake. Dikevine ikeftêkê kevokê xwe bi berfê di on di zikê ikeftê de bi êzingan agir dikin û kevokê xwe li ser agir sor dikin, pa î kevokê xwe û cixara xwe datînin ber xwe. Hê dest bi xwarinê nekirine ku hûtek piyê xwe dixê ikeftê û kevirekî çil mêrî dixê pi t derî. Tê her sê kevokê wan, nanê wan dixwe û her sê cixarê wan jî dik ine. Dêstê xwe li pi ta her sê ya dixê dibêje:

Yek ta têya min yek firavîna min yek jî îva min e. Hût î ikê di agir de sor dike û di nava yekî radikê dide ser agir kelekizûrî dike û wî dixwe. Careke din î ikê dixê agir di nava ê din jî radike ew jî kelekuzûrî dike wî jî dixwo. Êdî hût têr dibe, xwêdan dide û radizê.

Mîrze Miheme radibe û li der û dora xwe dinehêre, radike î ikê ji agir derdixê û diçavê hût de diçikîne. î ik buhistek di erdê de diçe xwarê, borin ji hût diçe û li karçiyên ikeftê dikeve. Hût dibêje: Ez rabim ez ê te bikim gepekî û li hev diçe û tê, radibe di nav pezê xwe de li Mîrze Miheme digere.

Navê beranekî hût jî tîto ye Mîrze Miheme tîto serjê dike û xwe dixê postê wî, hût radibe derê ikeftê vedike kevir ji pi t deri derdixê piyekî xwe dide vî alî piyekî xwe jî dide wî alî derdikeve û gazî pezê xwe dike. Pezê wî di nava piyê wî de derbas dibe Mîrze Miheme bi postê tîto xwe di nav pez de derbas dike hût destê xwe li pi ta Tîto dixê dibêje:

— Tîto çima tu li pa mayî wisa? Çawa ku Mîrze Miheme ji nav piyê hût derbas dibe postê tîto ji xwe dike davêje nav çavê dêw dibêje ha ji te re tîtoyê te hingê hût bi carekê re dikeve û dimire.

Mîrze Miheme diçe diçe û diçe rastî hûtekî din dibe, darek di destê wî de heyê û ser darê tije teyr û tirûdin hût ji Mîrze Miheme dipirse:

— Navê te çî ye? Mîrze Miheme navê xwe jê re dibêje. Hût ji Mîrze Mihemere dibêje: were tu bibe kurê min ez ji bibim bavê te, tu qebûl nakî? Mîrze Miheme qîma xwe tîne. Hût dibêje: Mîrze Miheme ez ê her roj herim nêçîrê, ez ê nêçîrê bînim û tu

jî bipijîne em dê bi hev re bixwin. Rojekî cereba Mîrze Miheme dike û xwe dirêj dike, dibêje:

— Kurê min were li nava riyê min binêre. Di riyê hût de jî kilîtên çil odeyan ve artîne. M. Miheme li nava riyê wî dinêre kilit di nav de ne, hêdîka kilîta derdixe. Hût jî xwe li xewê daniye lê iyare. Mîrze Miheme kilîta dibe diçe ber deriyê çil odeyan, derîkî vedike ku çi bibîne! Ode tije teyr û tirudin, yeka din vedike tije jinin bi porê xwe ve dalekandîne, yeka diji vedike ew jî tije mirovin ku î li nava wan xistiye wan daleqandiye. Diçe yeka din jî vedike du hesp û du êr têdene ku hût kayê danêye ber êr go t jî danîye ber hespê Mîrze Miheme tîne go t dide ber êr kayê jî dide ber hespê û diçe derîkî din vedike di vê odê de jîkaniyekezêr û yeke zîv heyê. Tîne piçîya xwe li kaniya zîv û zêr dixê û derdikeve tê. Dike nake zîv û zêr ji destê wî naçe tîne paçîkekî li girê dide û hêdîka radike kilîta diçe serê hût dide ser çoka xwe kilîta hêdîka dixê nava riyê wî, hût îyar dibe dibêje:

— Çi bûye ji pêçîka te Mîrze Miheme? MîrzeMiheme dibêje:

— Kêr li destê min ketiye. Hût dibêje: Kêrikê tu çima li destê MîrzeMiheme ketiyî kêr dibeje:

— Ne ez lê ketime jilêt lê ketiye. Hût dibêje:

— Mîrze Miheme kurê min pêçîka xwe veke ez dizanim çibuye, tu careke din ti tekî wisa nekî ez ê te bikujim.

Roj di nav de derbas dibin M. Miheme her roj diçe go t dide ber êra giyayê jî dide ber hespan wa xurt dike ji kaniya zîv û zêr jî destek cil ji xwe re çêdike rojekî hût diçe nêçîrê MîrzeMiheme radike xurçîka zîv û zêr davêje ser êra çiqas teyr û trûdên di hundir de hene berdide, jinên daleqandi jî tevan vedike, cilê zîv û zêr li xwe dike li hespa xwe siwar dibe, her du êra dixê kêlaka xwe. Qalibekê sabûn, ekî û cêrekî avê bi xwe re dibe û diçe. Hût li çolê dinere ser serê wî tev bû sî serê xwe radike ku çi bibîne tev teyr û tirûdên wî ne, bazdide û tê malê dinere ku derî tev vekirine MîrzeMiheme êr û hespan tev biriye û çûye. Radibe û bi du dikeve nezîkî pêdixê Mîrze Miheme e davêje pi t xwe li pe iya hût dibe dahl û devî û gurnik. Hût xwe ji wan xelas dike, dişa nêzîkayî pêdixê. Mîrze Mihemed ev car sabûnê davêje

pê iya wî ev car. Pê î dibe emetok ew xwe ji ematokê jî xilas dike, disa nêzîkayi pêdixê MîrzeMiheme cêrê avê davêje û li pê iya wî dibe çemekî mezin. Hût gazi dike dibêje:

— Mîrze Miheme kurê min ez ti tekî bi te nakim ji bavê xwe re bibêje ka tu çewa derbas bûyî? Mîrze Miheme dibêje:

— Derpiye xwe ji xwe ke alîkî tije bike kevir bavêje ser milê xwe tu yê derbas bibi. Hût çewa li avê dixê weha têde dixeniqe. Mîrze Miheme disa diçe û diçe rastî ivanekî tê, ivan ji ber radibe dibêje:

— ivano! Tu vê berxika xwe yî pîsik nadî min? ivan dibêje:

— Ya xelkêye ez nikarim bidim te ez ivan im. Mîrze Miheme tîne sê çar zêr dide wî ez ê tenê ûrê wê ji xwe re bibim, go tê wê bila ji te re be. Bêje xediyê wê ew nexwe bû min ew serjêkir, ûrê wê ji xwe re bir, go tê wê jî ji were ma. ivan qebûl dike Mîrze Miheme berxikê serjê dike ûrê wê ji xwe re dibe, go t jî dide ivan. Ûrdibe devê çem têr ew di o, tê cilê xwe yî zîv û zêr ji xwe dike. Mûyekî ji nava eniya hespê yek jî nava eniya êr radike û dibêje hesp û êrê xwe gava ku min her du mûya li hev da ez li ku bim hunê werin cem min. MîrzeMiheme cilê zîv û zêr dixê xurçikê xwe û davêje ser pi ta êrê xwe û dibêje herin. Mîrze Miheme wî ûrê ku u tiye dixê serê xwe û diçe bajêr diçe nav civatekî dibêje ez ji xwe re li karekî digirim. Xelk jê dipêrse:

— Tu çî karî dikî? Mîrze Miheme dibêje

— Ez her kari dikim. Jê dipêrsin:

— Tu dikarî ivanêyê bikî? Mîrze Miheme dibêje:

— ivanî bi min nabe. Dîsa dipirsin:

— Tu karî gavanêyê bikî?

Dibêje ew jî bi min nebe. Dibêjin:

— Nexwe çî kar bi te dibe? MîrzeMiheme disa dibêje:

— Her kar bi min dibe. Yek ji wan jê re dibêje:

— Sê qazên keçên kral hene tu naçî qazvaniya wan nakî? MîrzeMiheme dibêje:

— Belê ez karim herim û diçe ba kral. Dibe ivanê kazên keçên kral. Her roj wan dibe û diçêrîne. Qaza keça kral ya biçûk bi çavekî ye. Roj bi roj qaza wê bêxir dibe. Ew rojekê meraq dike, diçe ba MîrzeMiheme ku navê wî bûye keçelokê qazvan jê re dibêje:

— Keçelokê qazvan çima qaza min weha bixêr dibe? Keçelok dibêje:

— Ma ez çi bikim ji qaza te, ez wan dibim ber çem ew ji xwe re diçêrin û ez jî dikevî avê. Rojekê keçik bi dizîka li du diçe, dinêre ku keçelok çû ber çem du mû ji berîka xwe derxist û li hev da. Her du êrê wî û her du hespê wî hatin balê û keçelok wî postî ji serê xwe derxist, cilê xwe yî zîv û zêr li xwe kir û li hespê xwe siwar bû. Serikî çû wî aliyê çem û serikî vî aliyê çem. Dit ku her du qazên xweyê wê bi çavekî diçêrên û bi çavekî jî li keçelok dinêrin. Qaza wê jî bi çavekî ye û bi wî çavî jî li keçelok dinêre. Keçik fahm dike ku çima qaz bêxir dibe. Keçik tê malê sê heb sêv di îne oda bavê xwe kral dibêje: Wan sêvan bînin ba min sêvekî di kînin her du aliyê wê jî pûç bûne, ya dudoya jî di kînin ew jî alikê wê pûç e, ya sêsêyan jî di kînin her du aliyê wê jî sor e. Kral dibêje:

— Kî mana van sêvan zanibe bila bêje? Yek radibe dibêje:

— Ez ê mana van sêvan ji were bibêjim. Dibêje: Sêva pûç ya keça mezin e. Dibêje bavo ez pîr bûme, sêva alikî pûç jî ya keça navin e. Ew jî dibêje emrê min nivî çûyiye nivî mayiye. Ew sêva sor jî ya keça biçûk e. Dibêje bavo ez di gula xwe de me wexta min e. Kral dibêje:

— Bila sibê delîlî derkeve gazî bike. Serê sêbê delîlî derdikeve û gazî dike dibêje bila sibê hemû kes li ber derê kral de derbas bibe keçên kral sêva xwe li kî bixin ew ê bi wan re bizewicin. Herkes radibe heywanê xwe difro e, didin bi cila li xwe dikin û diçin di ber derê kral de derbas dibin. Keçên kral derdikevin tên ber camê keça mezin sêva xwe li kurê kazî dixê, keça navî jî li kurê muftî dixê. Xelk tev derbas dibe a biçûk sêva xwe li tu kesî naxe. Deng diçe kral ku keça wî ya biçûk

sêva xwe li tu kesî nexistiye. Kral dibêje bila xelk cardin derbas bibin. Xort disa derbas dibin lê keçik disa sêvê li kesî naxe kral dibêje: Kes ma ku derbas nebû? Dibêjin: Kes nemaye ji keçelokên qazvan pê tir. Qral dibêje: gazi wî jî bikin bila ew jî were keçelok tê û çewa derbas dibe keçik sêva xwe lê dixê. Deng bi kral ve diçe dibêjin:

— Keça te sêva xwe li keçelok xist. Kral dibêje:

— Keça min a e, bila cardin derbas bibin. Xelk sê carên din jî derbas dibin. Her sê caran jî sêva xwe li keçelok dixê. Vê carê kral dibêje:

— Serê xwe bixor bi ser keçelok de wê têxin koxa qaza ba keçelok. Her du keçên xwe yî din jî çil ev û çil roja daweta wan dike. Keça biçûk ku keçelok dike tê ba keçelok nav koxa qazan. Ji re dibêje:

— Keçelok wî hûrî ji serê xwe derxe, min tu dîtîye, tu ne ev keçelokî. Ew jî dibêje:

— Ê ku te sêva xwe lêxist ez bûm. Ma kes dikare postê canê xwe jêke.

Meh tê de derbas dibin, çiqas keçik jê re dibêje tu ne keçelokî min tu ditiye ka wî postî ji serê xwe ke. Lê keçelok li xwe danayne. Êvarekê keçelok ji keçikê re dibêje:

— Ez ê nifirekî li bave te bikim û tu jî bêje amin. Dibêje heviya min ji xwedê em sibehê rabin ku ê ek li bavê te ketiye ku dermanê wî îrê êr di eyarê êr de êr bajo êr bine. Serê sibehê radibin ku bavê wê bi ê eke giran ketiye. Diya wê tê ber deriyê koxê ji qiza xwe re dibêje:

— Tu kur bibî bi ser keçelok de kurê qazi û kurê mifti ji bavê te re çûne dermana ma keçelok çi dike? Keçelok radibe dibêje ka hespekî, extekî avê û ûrekî zengarî bidin min. Extê avê li pi ta xwe giredide û keçelok berepa kî li hespê siwar dibe û diçe pi ta benderan ji hespê xwe peya dibe Her du mûyan ji berîka xwe derdixê û li hev dixê her du êr û hespên wî tîn balê, cilê xwe yê zîv û zêr derdixê li xwe dike û li hespê xwe siwar dibe diçe. Dinihêre ku kurê qazî û kurê miftî xwe li

wan deran mijûl dikin. Wextê ku çav pê dikevin dibêjin vaye Xocê Xizir hat. Keçelok ji wan dipirse:

— Hûn li vir çi dikin? Dibêjin xezûrê me nexwe e, em jê re diçin dermanan. Keçelok jê dibêje:

— Xezûrê min jê nexwe e, ez jê re diçim dermana. Dibêjin: ji kerema xwe re ku te anî hinekî bide me jê em ê li vê derê li hêviya te biminin. Keçelok diçe û pir dût diçe, diçe ber avekî xwe vedi êre, dinêre ku tamamê êra hatin li ser avê û avê vedixwin, derbas dibin êreka seqet ji wir ve tê ser avê. Keçelok tîr û kevanê xwe li piyê wê yî seqet digire û berdide li piyê wê dixê. Ew edaba piyê wê hemû derdikeve der. Qutiyekê dide ber edaba piyê wê. Êr gazi dike dibeje:

— Tu kî yî, tu insî tu cinsî? Derkeve! Tu çi li dinyayê bixwazî ez ê bidim te. Keçelok dibêje:

— Ez ti tekî ji te naxwazim tenê îrê êr, di eyar êr de, êr bajo û êr bine. Ez wî ji te dixwazim. Êr dibêje:

— Îsal heft sale piyê min seqet bûye, ji xêra xwedê re heft salê din jê piyê min wusa bûna û te vê yekê ji min nexwestibûna. Here filan derê wa sê heb têtjikê min hene, here yekî bifetisîne ku dengê wê jê were min ez ê te bixwim. Wê li ber çem ba bi o ez ê wê bîn bikim heke ku bîna wê jê were min ez ê te perçe perçe bikim. Keçelok diçe têtjika wê difetisîne û dibe ber çem postê wê bi silekanê têr di o, tîne ba êr, êr wê bîn dike bîn jê nayê. Êr îrê xwe diguvi îne tije dike û dide keçelok. Keçelok li ser hespê xwe siwar dibe û vedigere tê. Dibîne ku wa hê kurê qazî û mufî li ciyê xwe ne. Dibêjin:

— Vaye Xocê Xizir hat. Gelo te ji me re jê derman anî ye? Keçelok tîne wê edaba piyê êr dide wan û dibêje ka ez ê mora xwe li pi ta qarçika we bixim û mora xwe li wan dixê dure Keçelok tê cilê xwe yî zîv û zêr ji xwe dike û li hespê xwe siwar dibe û tê. Kurê kazî û mifî jê wê edabê tînin û didin xezûrê xwe. Ku xezûrê wan ew edab dixwe pê hîn xerabtir dibe. Keçelok jê îrê êr dide jina xwe û dibêje: Vaye min ji bavê te re derman aniye. Jina wî diçe ba bavê xwe dibêje:

— Bavo va keçelok ji te re derman aniye. Bavê wê ji re dibêje:

— De here keçelok serê te bixwe. Ez dermanê keçelok naxwim. Keça wî pir hêvî û lave lav dike, dibêje pêçekî bixwe qey wê çi bibe? Bavê wê bi zorê piçekî dixwe çewa ku dixwe bîna wê dertê. Dibêje:

— Ka piçekî din jî bidin min. Hinekî din jî didinê û pê ba dibe.

Çend roj ûn de diya keçikê tê ji keçelok re dibêje:

— Kral bi dermanê ku kurê qazî û kurê miftî anîbûn kral ba bûye. Çend roj derbas dibin evekî disa keçelok dibêje jina xwe:

— Ez ê nifirekî li bavê te bikim û dibêje: Hêvîya min ji xwedê ku serê sibê bavê te ji xew rabe derdora mala wî tije le ker û neyar bin. Nifira wî qebûl dibe. Serê sibê ji xew radibin ku dora xaniyê kral tije le ker û neyarin. Kral derdikeve derve ku çi bibine der û dor tije le ker in. Qidumên wî di ikên, diçe hundir. Kurê qazî û miftî ku çav bi le kera dikevin ji tirsan xwe vedi êrin.

Keçelok radibe wî ûrî ji serê xwe derdixe, mûyê xwe ji berika xwe derdixe û li hev dixê û hespê wî têne balê li hespê xwe siwar dibe, her du êrê wî dikevin kêleka wî. Ew li alîkî er dike, êrê wî jî li alîkî er dikin. ûr li destê keçelok dikeve qral desmala xwe ji berîka xwe derdixe li destê keçelok girê dide. Temamê le keran ji hev bela dike ê ku dikuje. Radibe tê ber derê kurê qazî û miftî hin jî hundur derdikevin.

Jina kral tê ber koxa keçelok ku bêje keça xwe va kurê qazî û kurê miftî ewqas herp kirin. Lê dinêre ku ew hesp û êr li ber derê koxê ne, serê xwe xwar dike û li hundirê koxê dinêre ku ewê er dikir di koxê de rûni tiye. Diya keçikê vedigere tê ba kral jê re dibêje ku ê ku wî erî dikir keçelok bû waye li koxê runi tiye. Qral dibêje: Gazikinê bila were vê derê Keçelok tê kral, dinêre ku desmala ku li destê wî pêçabû hin girêdaye. Kral pir kêfxwe dibe û tîne daweta Mirze Miheme û keça xwe çil roj û çil evî dike.

**Berhevkar: Rukiye ZC**

**Gelêri**



## 6. Ç ROKA E EM N

Carik cara bî rehmel dê babê hazira bî yê me jî yê hewe jî milyaketên dora me jî hey he bî hey tine bî kes ji xudê meztir tine bî meznê filha se bî derê mala me bî. Carik bî go gencik bî pê dîbab bî. Ti kesê wî tine bî ew tinê bî. Go ez genc im halê betal der kesê mi tine divê ez î kî ji xwe re bikim, xwe xweykim halê çênabê. Ew jî radibê ser xwe dikevê rê diçê. Dibêjê ez ê herim ji xwe re î . Dikevê rê diçê diçê diçê û bajarkî re derdikevê. Pirsê mala pa ê dikê. Dibêjê ez ê herim nuhû ew ê î kî ji mi re bibînê. Radibê diçê pirsê mala pa ê dikê. Yêk jê re dibêje ve vêdêye. Eve mala wî. Diçê mala pa ê. Pane xortkî delale, spehîye. Diçê xarê rutnê, dirênê civata pa ê tejîye. Pa a dibêjê:

— Xortê delal de were vêda jorî. Dibêjê:

— Pa ayê mi hema ez ê vêdêbim. Dibêjê:

— Wileh zehf keyfa mi ji te re hat divê ti werî vêdê ber rexê mi. Tê, diçê jorê ber rexê pa ê. Dibêjê:

— Ti kîyî, çi kesî, navê te çiyê? Dibêjê:

— Wileh navê mi Mîrza Mihemeye ez jî vada ve terîqîme hatime. Ez jî tineme, kesê mi tine. Ez jî hatime ka ji xwêre î kî bibînim, ji xwe re î kî bikim, xwe xweykim. Vêca ti ji mi re î kî bibînê û bidî mi ba e. Ew jî radibê ser xwe dibêjê:

— Nexwe ba mi be zehf keyfa mi ji tere hat, mi hej te kir xwina te mi kerizî ba mi be û hema ti çayê misafirê mi re binî bidî wa hildî dênî, pêlavê wa rastkî û ezê mia ê te bidim te. Dibêjê:

— Belê ser serê xwe. Radibê ser xwe misafirê wî tene çayê ji wa re çedikê hiltînê dêtênê ber wa, pêlavê wa rast dikê î ê wî jî eve. Zehf keyfa pa ê jê re hatîye, balêye, zehf hejê dikê. Rojkî roja Mîrza Mihemed ber pencerêye dirênê zilamke tepsîkî xwarin ser serê wîye ber pencera pa ê re burand badikê hey hê kî berge a tiam tiam dibê hemama xirabe de. Mîrza Miheme dibêjê:

— Ev çi dibêjê pa ayê mi? Dibêjê:

— Kurê mi bela xwe jê veke ew ne ti î e kî ew berge birî hemama xirabe de sax derneketîye. Dibêjê:

— Temam. Guhe xwe didîye û diborê diçê ber pencerê re. Radibê ser xwe eynî wê roja dî ew berge a xwarinê ser serê wî zilamîye ber pencerê re diborê. Dibêjê:

— Hey hê kî vê berge ê dibê hemama xirabe. Dîsa dibêjê:

— Pa ayê mi ti izna mi bidî ez ê bibim herim. Dibêjê:

— Mîrza Miheme guhê xwe bide mi nebe. Nebe kî birî têde jê derneketîye dilê mi te veye, ti nabî. Dibêjê:

— Temam. Wê carê jî guhê xwe didîyê. Cara sisîya dîsa tê eynî ew zilame, ber wê pencerêre diborê. Badikê hey hê kî vê berge a xwarinê dibê hemama xirabe de. Wileh Mîrza Miheme hêdî her ser mila de çû, divîya bibê. Go pa ayê mi ez ê bibim herim. Pa a dibêjê:

— Nebe. Ew dibêjê:

— Ez ê bibim. Axirkê guhê xwe nadê pa ê derî didê diçê. Diçê dibêjê:

— Ka bide mi ez ê bibim herim. Dibêjê: Ha ji te re bibe here. Didîye dibê diçê. Însanê herê têde mirî derdikevê nekû xirabeye ji xwe navê wê kirne hemama xirabe. Hemamî zehf xwe e. Derî vedikê berge a xwarnê dêtênê ser wêdê. Dibêjê ev hemama he kudê xirabeye. Ew jî radibê ser xwe. Cilkê xwe têxê dibêjê ka ez tê serê xwe bi um. Radibê ser xwe. Xwe tazî dikê. Xwe di û di û di û hemd û hi ê xwe. Her ti t heye têde. Tê serê xwe di û tê û çilkê xwe wedigirê. Rutnê ser wê xwarnê. Pane her tiam wê berge ê de heye. Ew jî rutnê ser xwarnê qene xwarnê bixwê û xwarnê xwe jî ter dixwê. Radibê dest tavêjê berge ê qene werê. Dirênê yekî — Pane kî çûyî têde derneketîye ew jî kerkî xwe re dibê. Dibêjê bila ba mi hebê— milê wî re girt. Dirênê destkî spî, spehîye halê lê dirênê kekçî welêye mu bixwê vexwê husn û cemala wê birênê. Dibêjê:

— Mîrza Miheme. Dibêjê:

— Çiye? Dibêjê:

— Birêne mi qedrê te girt. Dilê mi zehf teveye, mi zehf hej te kir lewma mi ti neku tî. Heyne kî hatî hirde û mi nehi tîye derkevê. Lêbelê ve mi hi t ti serê xwe bi u mi hi t ti xwarinê jî bixwî û hadê oxirbê ji tere. Lêbelê ti cardî newî têde. Ve mi ti tî li te nekir. Go hema halê hê xeberdana kekçê deva de, dibêjê req hema kerka xwe dertêxê vêda destê wê didê. Bîlezik destadeye kitê bîlezikê wê dibêjê fir diçê dera he û keçî winda dibê. Ew jî diçê dest tavêjê kitê bîlezikê wê derdikevê. Derdikevê tê diçê çewa pa a dibînê, pa a dimînê a . Dibêjê:

— Mîrza Miheme! Dibêjê:

— Çi? Dibêjê:

— Aferim an ti zilamî tazeyî. Ti çewa derketî ji we hemamê. Dibêjê:

— Wileh pa ayê mi ve hal meselê mi eve. Hîn bawer nekin ha ve kitê bîlezikê keçkê jî. Lê dirênê, dibêjê xudê raste. Dibêjê:

— Mîrza Miheme. Dibêjê:

— Çiye? Dibêjê:

— Ez çil roja izna te didim, ti herî kitê havala vî bîlezikî ji mi re bînî. Dibêjê:

— Ê çi bikim, xwelî neyarê xwe bikim, ez ê ji ku bînim kitê vî bîlezikî? Dibêjê:

— Temam pa ayê mi. Radibê ser xwe çil roja izna Mîrza Miheme didê. Mîrza Mihemeyê gew dikevê rê diçê. Diçê diçê diçê diçê ber avkî dirênê gemîke û ber kevîya avê sekinî, teji insanin ne tê ne diçê dibêjê hala hala. Dibêjê wa zilama, dibêjê çire an hin navin an hin naçin hin peyar nabin? Dibêjê:

— Wileh xortê delal em nikarî herî. Hema em gemîyê dilepitênî em dirênî destî spî nav vê avê derdikevê dest tavêjê kevîya gemîyê qene qulbênê. Dibêjê ka kî rastêye, kudêre derdikevê? Dibêjê ha vê rasta here derdikevê. Ew jî dikevê têde kêrka xwe dikê destê xwe de. Dibêjê de bajû. Dîsa gemîya gew heraket dikê dirênin destî spî wê dêre derdikevê. Dest tavêjê kevîya gemîyê qulbênê. Ew jî dibêjê req heta xudê

qewet didîyê lê didê. Bîlezik destadeye. Bîlezik dibêjê zip diçê wî milê avê. Diçê wî milê avê keçka gew winda dibê. Diçin wî milê avê dibêjin hey xudê ji te razîbê te me xilas kir ji vê tengîyê. Diçê dest tavêjê kitê bîlezikê di jî têxê kurka xwe de. Dibêjê her ve izna mi zehfe ez ê turkî bidim xwe, ez ê ji xwe re bigerim heta izna mi xilas bibê ez ê pa ayê xwe fitilim. Radibê diçê. Diçê diçê diçê cêhkî de dirênê jinkîke hema kuça dêtênê ser hev dikê xanî ji xwe re. Dibêjê:

— Wey Mîrza Miheme xer û silamet ti hafî ser sera ser çava ne e te nas dikim ez û dîya te babê te em dost û birayê hev bîn em havalê hev bîn e zehf hewe nas dikim. Ev ti ji kuve têyî xêr û silamet, filan. Dibêjê:

— Wileh ez te nas nakim. Dibêjê:

— Ne ti kiçkuk bî ti mi nas nakî lêbelê dîya te babê te me zehf havaletî hevre kirye em hev nas dikî. Dibêjê zehmet nebê ji te re ti werî ser pi ta mi ez ê vî kuçî bidim te dêne ser diwêr. Destê mi nakîyê. Dibêjê estexfîrilah ti were ser pi ta mi e nawime ser pi ta te ti were ser pi ta mi ti dêne. Dibêjê tamam. Ew jî radibê ser xwe û xwe xwehr dikê Mîrza Mihemeyê gew. Jinika gew diçê ser pi ta wî heta xudê qewet didîyê pêncutkî, pehînkî pi tê didê. Dibêjê Mîrza Meheme heft tebeqe erdêde çû xarê. Dîsa dest avêt çeplê wî ser se rê xwere dizivirînê dizivirînê dizivirînê tavêjê ber qesra xwe de. Mîrza Mehemeyê gew dimînê ber wê qesrê de. Heta di sê roja hi ê wî tîn ser çevê xwe vedikê dirênê ber qesrikê spîdeye. Dibêjê hey lo evê çi ji mi kir te dît? Wê çi hîla xwe mi kir. E çewa çêkim. Qesrikî spîye hêdîyûka diçê ber pencerê dirênê kes naxweyê. Ew jî li derî digerê hêdîyûka diçê dirênê ti kes mal de tine. Qesrikî zehf xwe e, dere ew jî hema diçê xwe mal de xef dikê. Xwe derkî de xef dikê kes nebînê. Dirênê heta dibê ev sê keçî tîn malde. Hersê xwêhkê hevin ji hevre dibêjin: Xwehê ka were îro me çi kirye. Ya hemama xirabe de ya nav avê de û ya Mîrza Miheme kirî bin erdê de hersê xwêhê hevin. Hersê jî sêhrin. Ya hemamê de dibêjê: Ez hemamkî xirabede bîm zehf çêhê mi xwe bî, mi nedihî ta kes werê tède. Gava yêk tehta tède mi sax dernetêxista mi wa dîku ta mi nedihî ta derkevin. Zehf çêhê mi xwe bî. Rojkî navê yêkî Mîrza Miheme — Mîrza Miheme jî guhê xwe didê wa— dilê mi zehf pêvebî hat tède mi hi t serê xwe bi u mi hi t xwarnê jî bixwe mi go bila pêbela herê mi nedivîya e bîku im ji ku mi hejê dikira. Çû mi milê wî re girt mi go hêdî newe tède. Zehf keyfa mi ji te re tê mi navê te bikujim here hêdî newe û

mi hingê rênê dîtina mi dîtî ûrê xwe danê destê mi. Kitê bîlezikê mi jî hey hîn bawer nakin nê ana wê. Ya nav avê re dibêjê xwêhê ti ta wî li te kirî mi jî kirye. Eynê ez jî nav avkîde bîn zehf çêhê mi xwe bî mi nahi ta kes ser wê avê re herê werê. Mi dest tavê ta gemîye diqulbanda avê de mi nedihî ta kes ser mi re herê. Eynê wel te kirye wel mi jî kirye. Eyni Mîrza Miheme dilê mi jî zef pêve bî mi zehf hejê dikira mi dikarîya ez bikujim jî mi neku t. Ewî wel mi jî kirye. Hin bawer nekin ve nê ana destê mi de jî. Xwêhka wa ya mezine wel Mîrza meheme kirî. Dibêjê hîn saxbin wileh Mîrza Miheme xude zanê kuve çûye, mi ku tîye xudê zanê ka kudêye û mi zanîya wel hewe kirye mi jî kê ewda hewe devê wî re derxistîye. Çewa welê gotê herdu xwêha xwe neavêtê! Herdu xwêha xwe avêtê lêdan lêdan lêdan go bêje te çi jê kirye. Go wileh mi avêtîye xudê zanê kuve çûye, mi rêkir bin heft tebeqe erdê de û mi hilanê disa ser serê xwe re zivirandîye mi avêtîye xudê zanê ka kuve çûye. E nizamim. Go bêje ê ti derêxî. Ti tî li wî hatibê em ê te bikujî. Lêdan lêdan lêdan. – Mîrza Miheme jî darî wa dikê— Axirkê ji ku lêdan xwêhka xwe ber ku tinê ve anîn sep Mîrza Miheme. Gotin de welêbe. Go qey me nikarîya em bikujî te ku tîye. Mîrza Miheme rênê xwêka xwe ê bikujin hema pi t perdê dertkevê. Dibêjê ez kilê çevê heve me ve ez vêdê me. Çewa Mîrza Miheme dibînin xwe tavêjinê dibêjin ti saxî, maçu dikin. Dibêjin ti kure halê hatî vêdê. Dibêjê wileh xwêha hewe mi ser serê xwere avêt. Ez ber vê qesrê derketibîm. Mi rênê hînê xwêhka xwe bikujin mi xwe e kere kir. Dibêjê ti çive hatbî heta avê heta hal te hat. Dibêjê: Wileh hal meselê pa ê eve kitê bîlezikê heve ve ez hatime. Dibêjinê bîlezikê heyne deh bîlezik qurbana te bibin. Bîlezik çiyê. Ew jî radibin ser xwe herdu keç dibêjin: Emê herdu rex te werî ti kuve herî em herdu ba tene. Lê didin xwêhka xwe dikujin. Malê wa çi heyî hildidin dikevin rê. Hertka jî xwe re tîne tê ba pa ê. Mîrza Mihemê gew tê hêca izna pa ê dayîye heye. Dibêjê: Ti hatî hê rojên te hê izna te heyî. Dibêjê: E wileh ez hatim hem di jinave jî hem zêrê te xwestîve jî ez hatim. Pa pa a ji ku keyfa wî tê. Dibêjê: Wileh Mîrza Miheme ti zilamê yêkê hem ti herdu jinavejî hatî hem te bîlezik anî. Radibê ser xwe pa ayê gew yêkê lê meh dikê yêkê jî kê kurê xwe meh dikê û Mîrza Miheme jî dimînê ba pa ê. Axirkê dibê wek malîyê wa. Çîroka me çû de tê dibabê me çûn bihi tê.

**Berhevkar: Rukiye ZC**

**Gelêri**



## 7. ÇÎROKA HEFTEMÎN

Hebû tunebû, dibêjin: Sê bira hebûne. Hersê jî pir bi hêz û qewet bûn. Dibêjin yek ji bêrê re pir bi qewet bû, yek di bazdana xwe de pir bi qewet bû, yek jî di navê de pir bi qewet bû ku kesekî tu carê pi ta wî danetanî erdê.

Hersê bira çûn bajarekî ku lê ne ins hebûn, ne cin hebûn û ne pîr, kal, zarok û malî hebûn. Li wir xanî hebûn û derî tev vekirî bûn; tê de firaq, nifq, debra wan, her ti t di hindur de hebû, lê kes li berê tune bû. Tu nabêjî, ejderhayekî ew dixwarin û wenda dikirin.

Hersê bira ji hevûdu re gotin: Madem ku ev bajar vala ye, em ê ji xwe re biparêzin.

Pir hindik hersê bira di bajêr de man, roj û wextê xwe bi seyde derbas dikirin; xezal diku tin, kew diku tin, kero k diku tin, rovî diku tin û seyda xwe dianîn malê, bi hevûdu re îva xwe çêdikirin û dixwarin. Lê her roj birayek li malê dima û du bira jî diçûn seyde.

Rojekê dora birayê wan ê mezin bû ku li ber malê bisekine û îvê çêbike. Birayê nêvî û yê piçûk jî rabûn çûn seyde. Birayê ku li malê mabû, rabû çend berx û kar erjê kirin û sê kîs birinc anîn, ji her yekê wan re sîtilek, di sê sîtilan de pijandin. Wî hêj agir di binê sîtilên xwarinê de dadida, ha ku dît zilamekî kal ku bejna wî bi qasê bihostekê dirêj û rihê wî jî du qat ji bejna wî dirêjtir hate cem. Lê rihê Kalo li nava lingên wî pahn bûye û bi erdê ve diki e. Kalo got:

— Selamu eleykim.

— Eleykime selam.

— Hûn çi kes in, çi teba ne ku hûn hatine ketine bajarê min? Ma qey hûn min nasnakî ku ez kî me? Min vî bajarî tev mehû kir; xelkê wî tevde ku tine û xwarine!

— Erê, rast e, peyva te were ye. Lê îro em hakimê vî bajarî ne.

— Ka hinek xwarin bide min.

— Ez nadim te.

— Çawa tu nadî?

— Wisa nadim.

Peyvek ji Kalo, peyvek ji birayê mezin û terp û rep li hevûdu xistin, Kalo zora birayê mezin bir û wî li erdê kire term. Pi tre Kalo çû kete ser wan hersê sîtilan û xwar, xwar heta ku hersê qedandin, pi tre binê sîtilan jî alast û pehîn li wan xist her yekê bi aliyekî ve ferqizand û riha xwe li nava xwe pêçe, da rê û çû.

Êvarê gava herdu birayên din ji seydê hatin, lê nerîn ku sîtil vala ne, birayê wan li erdê term e û her derê wî birîn in, li wê navê veketî ye erdê û hal lê tune. Jê pirsîn:

— Keko, çer bû ji te?

— Wele, vê sibê min agirê îvê dadida, ha ku min dît zilamekî kal ku bejna wî bi qasê bihostekê dirêj û rihê wî jî du qat ji bejna wî dirêjtir bi min ve derket. Lê rih li nava lingên wî pahn bûbû û bi erdê ve diki iya. Pê î got ku ev bajar yê wî ye, pi tre xwarin ji min xwest, lê min nedayê. Îcar li min xist û ez kirim vî halî.

Roja din birayê navîn gote herduyên din:

— Îro hûn herin seydê, ez ê jî li ber malê bim û xwarin çêbikim.

Birayê mezin û yê piçûk rabûn çûn seydê, birayê navîn jî dest bi haziriya îvê kir û kar, barx erjê kirin, çend telîs birinc anîn û di sê sîtilan de xwarin pijand. Wî jî xwarina xwe weha çêdikir, ha ku dît ew Kalê kin yê rihdirêj hate cem û gotê:

— Hûn çî kes in, çî teba ne ku hûn hatine ketine bajarê min? Ma qey hûn min nasnakin ku ez kî me? Min vî bajarî tev mehû kir, xelkê wî tevde xwarine. Lê ka hinek xwarin bide min, ez birçî me.

Birayê navîn gotê:

— Ez xwarinê nadim te.

Kalo rabû lê xist, lê xist heta ku ew li erdê kire term. Pi tre Kalo çû kete ser wan hersê sîtilan û xwar, xwar heta ku hersê jî qedandin, pi tre binê sîtilan jî alast û



pehîn li wan xist her yekê bi aliyekî ve ferqizand û riha xwe li nava xwe pêçe û da rê ji wir çû.

Êvarê gava birayê mezin û yê piçûk ji seydê hatin, lê nerîn ku sîtil vala ne, birayê wan li erdê term e, kûr dinale û her derê wî birîn in, li wê navê veketî ye û hal lê nemaye. Jê pirsîn:

— Bira, çer bû ji te?

— Wele, vê sibê pi tî ku hûn çûn seydê, min karê îvê dikir, min agir dadabû, ha ku min dît zilamekî kal ku bejna wî bi qasê bihostekê dirêj û rihê wî jî du qat ji bejna wî dirêjtir bi min ve derket. Pê î got ku ev bajar yê wî ye, lê pi tre xwarin ji min xwest û min nedayê. Vêca rabû li min xist, wî ez kirim vî halî û xwarina me jî tev xwar.

Birayê piçûk gote herdu birayên xwe:

— Sibê hûn herin seydê û vî î î bispêrin min.

Roja din sibe birayê navî û yê mezin rabûn çûn seydê, birayê piçûk jî weke herdu birayên xwe di herdu rojên pê î de, rabû karê îvê kir; sê sîtil danîne ser êgir û agir di binê wan de dada. Agirê xwe hêdî hêdî dadida û li hawîdorê xwe jî dinerî ha Kalo were, ha were. Xwarina li ser êgir pijiya, lê nerî eh! wa ew kal hat û got:

— Selamû eleykim.

— Ne eleykim selam!

— Haaa! "Ne eleykime selam" çawa? Qey tu nizanî ez kî me?

— Tu kî yî? Tu kî be, ez jî ew im!

Yek ji vî, yek ji wî, ber bi hev hatin. Kalo got:

— Ka xwarin bide min.

— Ez nadim.

Herdu hilperikîne hev û li hevûdu xistin, li ber hev dan û hevûdu pir betilandin. Birayê piçûk fersend dît hema bi kêra go t girt û li Kalo xist. Kalo birîn bû hema go xir û bi rev çû wendabû.

Êvarê gava herdu bira ji seydê hatin, nerîn ku sîtil tije xwarin in, birinca wan tê de û go t li serê, ji birayê piçûk pirsîn:

— Te îro çer kir?

— Wele Kalo hat, min û wî li hev xist û min kêrek lê xist ew birîn kir. Min xwarin jî nedayê û ew reviya çû. Lê ez dev ji viya bera nadim! Gereke ez wî Kalî bikujim.

— Çawa tu dev jê bera nadî?

— Ebed, ez dev jê bera nadin; yan gere ew min bikuje, yan ez ê wî bikujim.

Hersê bira ketin ser xwarina xwe û xwarin. Pi tre rabûn xencerên xwe xistin ber xwe û opa xwîna Kalo gerrandin, gerrandin, li nav qî an gerrandin, li nav newalan gerrandin, dîtin opa xwînê çû ket bîrekê. Ji hevûdu re gotin: "Heye tune ye, ew di vê bîrê de ye." Birayê piçûk gote herdu birayên xwe:

— Serê heft irîtan bi hevûdu ve girêbidin û bavêjin nava min, min dahêlin bîrê. Lê wexmeke pir germ ji binê bîrê tê. Her ku min got "Haho! ez ewitîm" jî, hûn min berdî, her ku min got "Haho! ez ewitîm", hûn min berjêr berdî û bila gunê we bi min neyê. Ez ê xwe feda bikim û wî Kaloyî bikujim.

erîtê li nava birayê piçûk girêdan û herdu birayên din wî dahi tine binê bîrê. Wexma germ li birayê piçûk xist û wî ewitand, gazî kir:

— Haho! Ez ewitîm.

Lê wî berjêr beradan. Çiqas wî got: "Haho! ez peritîm" û ew berjêr beradan, beradan heta ku her heft kindîr daketin jêrê. Birayê piçûk kindîrê leqand ku bisekinin anoka ew gihaye binî.

Birayê Piçûk li hawîdorê xwe nerî, bavooo! binê bîrê fireh e, tev lembe, ampûl û frolansa di hindur de vêketî ne, heyhût û helahela! Çi ti tên xwe ik hene, tev di wir

de ne. Çi ti tèn delal î nazik hene, tev di wir de ne; zêr, micewherat, hevirmê , pir ti tèn xwe ik... Ew bi vir ve çû, bi wir ve çû, dît ku sê qîz derketin, lê yek ji yekê xwe iktir e; tê bê viya û ne viya, vêya û ne wiya! Lê ya piçûk ji herduyên din jî spehîtir e.

Keçikan bala xwe dayê ku ev xort jî weke wan wisa delal e; devê wî, pozê wî, destên wî, her ti tèn wî weke yên wan in. Jê pirsîn:

— Gidî, tu çi li van deran digerrî?

— Ez xelasokê we me, ez ê we ji vir xelas bikim. Xêr e, ev çi mesele ye ku hûn di vir de ne?

Keçikan gotê:

— Ew bajarê mezin gi bira, bav û xweyên me bûn. Vî Kaloyî em hersê niqandine û ji xwe re anîne vir, yên din gi ku tine. Kalo ne dest bi me dide û ne ti kî bi me dike, lê rojê sê caran em xwe dixemilînin û ew tê awa di ber me re derbasdibe, têr li me dinere û pi tre diçe ser ciyê xwe vedikeve û em jî diçin ser ciyê xwe vedikevin. Lê belê Kalo niha birîndar e, tu pir dengê xwe raneke. Eger ew rabe, wê me û te tevde bixwe û qenim nabê "ay" jî.

— Yê ew birîn kiriye, ez im. Yê ku xwîna wî rijandiye, ez im.

Keçikan gotê:

— Heyfa me bi te tê. Heke tu bi ya me bikê, hema bila dîsa te biki inin jorê û derkeve dîsa here.

— Na wele ez naçim. Gereke ez wî bikujim, yan ew min bikuje, hêj ez ê herim.

— De madem ku were ye, em ê tebîetê wî ji te re bêjin: Ha wa li dera han veketî ye û dinale. Lê belê ûrekî wî yê kalanî di serdera wî re li nava be tan daleqandî ye û cilkirî ye. Îcar heta te xwe gîyand wî ûrî, tenê derbekê lê bixe. Heke mir, jixwe mir. Lê tu derbê, neke didu. Eger tu du derb lêxî, wê rabe haaa!

Her sê keçik hilki iyane ser pi ta hev, ew jî hilki iya ser pi ta wan û ûrê Kalo anî xwarê, çû li ser serê Kalo sekinî û ûr bilind kir ku lê bixe, Kalo çavên xwe vekirin û gotê:

— Gidî, min bi te kir, qenî tu bi min neke.

Birayê piçûk got "xurp" û ûr lê xist. Kalo birîn bû, xwîn jê ki iya û gotê:

— Derba mêran, didu— sisê ne!

— Na. Derba me yek e.

Kalo kir û nekir, birayê piçûk derbeke din lê nexist. Kalo di wî halê xwe de naliya, kaliya û mir.

Pi tî mirina Kalo, birayê piçûk gazî hersê qîzikan kir û berê xwe da ya mezin, gotê: "Tu ji birayê min ê mezin re yî", gote ya navîn: "Tu ji birayê min ê navîn re yî" û gote ya piçûk: "Tu jî ji min re yî."

Ew û hersê keçik çûne binê bîrê û irîtê li nava keçika mezin girêda, ba birayê xwe yê mezin jî kir:

— Keko. Ha vê keçikê bik înin. Ev ji te re ye, hah!

Herdu birayên mezin irîtê ki andin, lê nerîn ku qîzek derket û mîna sitêrkan diçirise. Keçikê mesela binê bîrê ji wan re got ku du keçikên din jî li wir hene. Herdu bira dîsa irîtê bera binê bîrê dan. Mîr Mihemed irîtê li nava keçika navî girêda û gazî birayê xwe yê navîn kir, got:

— Keko, ev keçik jî ya te ye.

Herdu bira wê keçikê jî ki andin jorê, lê nerîn ku ev jî mînaye hîva çarde evî pirî ku delal û bedew e.

Dîsa irîtê bera binê bîrê dan. Mîr Mihemed got keçika xwe:

— De tu jî were, ez irîtê bavê nava te û bila birayên min te hilki înin jorê. Li pey te ez ê jî werim.

Keçikê got:

— Mîr Mihemed. Ez gelekî xwe ik û sipehî me. Heke tu bi ya min dikê, bila birayên te pê î te bik înin jorê û li pey te ez ê hêj werim. Lewra timatiya dinyê heye! Bextre î heye; tavil birayên te xayintiyekê bi te re bikin! Lê heke tu berî min herî û li wir bî, ti t nabe.

Mîr Mihemed got:

— Waaa! Ev çî gotin e? Birayên min çilo xayintî bi min re dikin? Birayên min, ne ew kes in ku xayintî yan bextre î û xirabî bikin!

Keçikê kir û nekir, ti tekî nexist serê Mîr Mihemed. Pi tre gotê:

— Madem tu bi ya min nakî û dibe dibeku birayên te hawakî bi te bikin û tu di binê bîrê de bimînî. Tu yê herî wê sindoqa li ber serê Kalo vekî, tê de du perik hene; yek sipî ye û yek re e. Tu yê wan perikan heft caran li hevûdu bixî. Wê du beran derkevin ber te; yek re î qîr e, yek jî sipî— boz, qey dibê ji nava berfê derketiye. Tu yê xwe bavêjî ser pi ta beranê sipî û ”terq” wê te derxe ser ruyê erdê û bi xatirê te, de ka irîtê bavêje nava min. Lê de ka vê hingulîska min jî têxe tiliya xwe.

Keçikê hingulîsk ji tiliya xwe deranî û xist tiliya Mîr Mihemed. Mîr irîtê li nava wê girêda û herdu birayên wî ew hilki andin jorê.

Herdu bira gava kindîrê ki andin, dîtî ku devê bîrê hin bi hin ruhî dibe, her wekî rojek ji binê bîrê derdikeve û ne î ê keçikan e. Gava keçikê derxistin jorê û delaliya wê dîtî, jê re lal man û ji hevûdu re gotin:

— Dêmek ev bira wisan bi me re bê bext e, bê wijdan e heta ku vê qîzika delal ji xwe re hildaye.

Herdu bira irîtê ji nava keçika delal vekirin û bera binê bîrê dan. Mîr Mihemed irîtê li nava xwe girêda û wî hilki andin jorê. Gava wî gihandin nêzî devê bîrê, yekî ji wan kêr da irîtê û birrî. Mîr Mihemed jî berjêr çû, ha li vî alê dîwarê bîrê ket, ha li aliyê din ket û got terreep! çû li binê ket. Ew heya sê rojan bi hi ê xwe ve nehat. Gava çavên xwe vekirin, xwe bi xwe got: ”Ez li kû me? Ev xewn e, ev lewn e?” Tevde birîn, tevde selixî ye, la ê wî tevde î bûye, ne kes li dorê heye, ne ins hene û ne cin... Pi tî demekê peyva keçikê hat bîra wî û xwe bi xwe got: ”Gilîzarê ji min re

peyvîk weha kiribû. Ka ez herim sindoqê vekim.” û rabû çû wê sindoqa li ber ciyê Kalo vekir, bira ye wa perikek sipî û yek re du pirtik tê de ne. Pir kêfa wî hat û xwe bi xwe got: ”Temam. Peyva wê rast e û dirust e.”

Mîr Mihemed ew perik hildan û li hevûdu xistin, ha ku dît beranekî re û yekî sipî li ber wî hazir bûn. Mîr hema got gurg û bi a î xwe avête ser pi ta beranê re . Beranê re wî bire binê heft tebeqên erdê û li wir danî. Mîr lê nerî ku welatekî ên, dinyayeke xerîb; mirovên wan tev de ecêb, digirîn û tevde ol in. Xwe bi xwe got: ”Ev çi teba bû? Ez bi kû ve hatim? Ez ê çi bikim?” Mîr berê xwe da malekê û çû. Lê nerî ku pîreke tenê li malê ye û tenê diranek di dev de maye, gotê:

— Pîrê, merheba ji te re.

— Ehlen, we sehlen, kurê min.

— Tu mêhvanan xwedî dikî?

— Waaa! Ma ez ne mirov im! Qey me dinya nedîtiye! Em mêvanperwer in, keremke were yabo.

Pîrê xwarin danî ber Mîr Mihemed. Mîr lê nerî ku av tune, got Pîrê:

— Bi kerema xwe tasek av bide min.

Pîrê çû tasek av anî û da Mîr Mihemed. Gava Mîr qulpek lê xist, lê nerî ku tahmeke ne xwe jê tê; or, pîs û genî ye, jê pirsî:

— Pîrê. Ev çi av e ku te ji min re anî?

— Lawo, wele ruyê min ji te re e, ava me tune, min qêmî ê te nekir ku ez dilê te bi kînim. Ew, mîza vê jinê ye.

— Çima? Qey kanî li vir tunin? Av li vir naherikê, çem tune ne?

— Yabooo, mesela me gelkî dûr û dirêj e. Kaniyeka me hebû, ji binê vî çiyayê han derdiket. Lê ejderhakî mezin — markî mezin, ziyakî mezin— ketiye devê kaniyê û avê bernade. Her roj, her hor û her roj em ê keçîkekê bi zêr, hingulîsk, guhar, bazin û xî r bixemilînin û jê re bibin, bidin ber devê wî. Mar gava xwe ji ber devê kaniyê

dide alî û keçikê dixwe, hingê av jî tê û em ji bo vexwarina xwe derdan dadigirin, heya dawiya heftiyê dîsa xelas dibe. Ha wisa em dîsa keçeke din dixemilînin û dibin didine devê wî, her hefte, her hefte karê me ev e. Lê niha qîz nemane, hew qîza axê maye. Em ê wê jî bibin têxin devê wî. Îcar bê ka pi tre wê kalên me bixwo, pîrên me bixwo, zarûkên me bixwo... Ha wisa wê me gi an bixwo heya ku em tev xilas dibin.

Mîr Mihemed rabû da xwe, ûrê Kaloyê ku ku tibû jî hilda û got Pîrê:

— Bi xatirê te, va ez diçim.

Mîr Mihemed ji cem Pîrê rabû da rê û çû nav qerebalixê. Î û ecêbeke mezin bû. Mîr Mihemed nerî, ew keçika ku ji ziya re hazir kirine diricife û digirî. Mîr Mihemed ji yekî pirsî:

— Hûnê vê keçikê bi mar din?

— Erê.

— Ji bo Xwedêvê keçika bi destên min din, ez ê ji mar re bibim. Hûn qenî ji xwe re avê dagirin.

— Lawo, tu xort î, heyf î, wê mar te jî bixwe.

— Î ê we çî jê ye? Gava mar min bixwo, bila bixwo. Heke bi min vede, wê vede. Keçik hey, ya xwarinê ye? Ew mar îro yan wê min bixwo, yan jî ez keçikê pê nadime xwarin.

Kêfa xelkê hat, lê ji hev re gotin: "Gidî, vî xorta! Wele ti t jê nakeve serê me, lê belê belkî jî bike."

Gava keçikê dane destên Mîr Mihemed, Mîr jê re got:

— Xwakê, tu netirse. Ebed [hîç] netirse! Mar heya min nexwo, te naxwo.

Mar, de berê devê wî li xwînê ketiye. Gava Mîr Mihemed keçikê bir nêzî mar û reyê wî da, mar serê xwe bi pê ve anî, zimanê xwe derxist ku devê xwe bavêje keçikê, lê Mîr Mihemed keçikê bi ûnde vekî and. Mar gava xwe bi ûnde vekî and, Mîr dîsa keçikê ber pê ve bir û mar dîsa devê xwe vekir û serê xwe bi pê ve hanî.

De, de, de mar heya singê xwe derxist derve û devê xwe avêt keçikê, Mîr Mihemed jî hema ûrê xwe li serê wî xist û serî ji gewde qetand. Bi jêkirina serê wî re, avê jî got "gu" û weke çemê Dicle û Firat berjêr herikî.

Keça axê gelek bi aqil bû û xwe bi xwe got: "Wê gelek daw û doz li ser vî hawî çêbibin, divê ez ti kî bikim. Hema destekê xwe di xwîna mar dakir û ji pa ve got "erp" li ser gomlekê [î ilk] Mîr Mihemed di binê çakêt [saqo] de xist.

Mîr Mihemed pi tî ku wî marî ku t, bi bez hate mala Pîrê û rûni t, nehêla ku kes wî bibîne yan jî nasbike.

Xelkê bi kêf û ahî keçik birin û çûn mala bavê wê. Pi tre kêf û xwe î ket nava xelkê; her kes beziya ser avê û derdanên xwe tije kirin...

Ku tina marê ku avê ji ser bajêr girtibû, deng da û li welatan belavbû.

Axê bajêr fermanekê belavkir û got:

— Ew zîlamê ku wî marê mezin ku tiye, bila bê cem min, da ez diyariyeke mezin bidimê.

Xortên bajêr û yên derûdor tevek, ji bo ku xwe li ba Axê bi rûmet bikin û diyariyekê jê bistînin, rabû hatin ba Axê û her yekê got:

— Axayê min. Min wî marî ku tiye.

Çaxê wisan qerebalix çêbû, keça Axê hate cem bavê xwe û got:

— Yabo. Kî dibê ku min mar ku tiye, bila were ez lê binerim. Ewê ku mar ku tiye, ez wî nasdikim.

Xortên ku digotin yanî wan ew mar ku tiye tevek hatin û ketin rêzê, keça Axê jî li pê ta gomlekê [î ilk] wan nerî ku xwîn pê ve tune, gote bavê xwe:

— Ne yek ji van e jî.

Axê pirsî:

— Hin xort mane ku nehatine vêrê?



Yekî got:

— Li filan taxê Pîrek heye, mêvanekî wê yekî xort heye. Bi aqilê min hema bê ew tenê maye ku nehatiye vêrê.

Axê got:

— Herin bakinê, bila ew jî were vêrê.

Çend zilam çûn mala Pîrê û Mîr Mihemed hanîn ba Axê. Keça Axê çû li pi ta gomlekê wî nerî, dît ku ûna destekî bi xwîn li serê ye û ew xwîn pê ve hi k jî bûye, got bavê xwe:

— Ha ev xort e yê ku mar ku tiye.

Axê got:

— Keça min. Eseh ev eee?

— Erê yabo!

Axê Mîr Mihemed bire odê, bi hurmet û xwarin û qîmet û rûmet... Pi tre jê pirsî:

— Navê te bi xwêr?

— Mîr Mihemed.

— Mîr Mihemed. Wadeka min li cem Xwedê hebû.

— Çi ye?

— Keçika min li ber dilê min pir êrîn e, lê ez ê wê li te mar bikim. Wada min ev e.

— Axayê min. Ez nabêjim ku keça te ne xwe ik e, yan ez pê qayîl nabim, yan jî ha ayê ji hizûra te û ha a ji wechê [rû] te ku ez kêmaniyekê ji te re çêdikim. Keçika te hezarsalî be, ji xwediye xwe re bi xêr û selamet be. Lê ji min re nabe.

— Lê tu daxwaza çi dikî?

— Ez dixwazim ku tu min derxî ser rûkê dinyayê.

Axê gotiye Mîr Mihemed: Xwezî te malê dinyayê tev ji min bixwestina, lê te vê daxwazê li min nekiribûna ye. Teyrekî me yê pir mezin hebû, di zemanê xwe de xelk pir dibirin ser ruyê dinyayê. Lê belê di van salana da pir extiyar bûye. Here cem wî. Eger gunê wî bi te hat û te bir, mesrefa te û wî tev li ser min.

Mîr Mihemed çû binê wê dara ku axê reyê wî daye. Mîr Mihemed li binê darê ma, ma lê nerî ku marekî wek ecêbekê bi darê ve çû ku here çêçikan bixwe. Mîr Mihemed bi darê ve rapelikî û mar di cih de ku t û daket jêrê. Dîsa li binê darê veket ku îstirehet bike û carekê di xew re çû.

Teyr hate ba çêçikên xwe, nerî ku yek li binê darê veketî ye, hema xîj berjêr bû ku here wî hilde û bibe bavêje dereke dûr û bikuje, lê çêlikan perîkên xwe rakirin, kirin çîvçîv û çîzeçîz... Diya wan têgiha ku ti tek tê de heye, vegeriya ba çêçikan û ji wan pirsî, got:

— Hûn çi dibêjin? Ne, ev heft salên min in ku ez bûme kurdûnda. Ev ê li binê darê her sal dihat çêçikên min dixwarin. Ez ê wî bibim li bilindayîyekê bera erdê bidim û bikujim, we jê xilas bikim.

Çêçikan gote diya xwe:

— Na, naaa! Mar, mar dikira em bixwarina. Lê wî me jê xelas kir û mar ku t.

— Birraaa?

— Erê!

— Ihhhiiiiimm!..

Teyr li bendê ma heya ku Mîr Mihemed ji xew iyarbû û xwe bera jêrê da, çû cem, gotê:

— Madem ku te çêçikên min ji vî marê han xelas kirine, îcar tu çi dixwazî, ji min bixwaze.

Mîr Mihemed got:

— Ez ti kî ji te naxwazim, tenê tu yê min bi ser ruyê dinya gewr bixî.

— Xwezî heft salên din jî mar çîçikên min bixwarina, lê te ev ti t ji min nexwestibûna! Lewra ez êdî pîr bûme, extiyar bûme, ji qewet ketime û zeîf im. Eger di orta rê de ez bikevim, ez û tu, em ê perçe perçe bibin. Lê madem were ye, tu yê heft tenûr nan hazir bikî û heft kun av, heft la ên beranan hazir bikî. Di rê de her ku min got ”qiiiixx!”, tu yê la ekî go t di devê min xî, tenûrek nan di devê min xînê û kunek av jî bera nava nikulê min dî.

— Birabe.

— De here, wan ti tan hazir bike û zû were vêrê.

Mîr çû ba Axê bajêr û got:

— Teyrê heft tenûr nan, heft kun av û heft la ên beranan xwestiye û got: ”Gava te ew ti t hazir kirin, were vêrê, ez ê te bibim ser ruyê dinyayê.”

Axê got:

— Ev û ne ti kî din.

Axê bajêr rabû heft tenûr nan da hazir kirin, heft kun tije av kirin û heft beran da erjêkirin û la ên wan qelandin. Tevek dane Mîr Mihemed û birin çû binê darê. Teyr hat li erdê kumi î, Mîr ew bar tev danîne ser pi ta wê, ew jî li ser pi ta wê siwar bû û Teyr firiya, bi hewa ket û çû...

Teyr her firiya û perwaz dane xwe, miqdarekê çû, got ”qiiiixx!” û Mîr Mihemed tenûrek nan, la ek go t avêtin devê wê û kunek av bera ser da. Ha bi wî hawayî Teyrê e caran got ”qiiiixx!” û Mîr her carê tenûrek nan û la ek go t avêtin devê wê û kunek av jî bera ser dîda. Lê cara heftan gava Teyrê got ”Qiiiixx!” û Mîr Mihemed ew tenûrek nanê ku mabû avêt devê wê, rahi te la ê go t jî ku bavêje devê wê, hema ew la got ” erq” û ji destên wî ket. Îcar Mîr ji fediyar hema bi ûr go tê çîpekî xwe jê kir û avêt devê Teyrê. Lê Teyrê ew go t danequrtand û di binê zimanê xwe de hi t.

Riya dinyayê jî hindik mabû. Teyr çûn di wê qula devê bîrê re "xirp" û derkete ser ruyê dinyayê, Mîr Mihemed li wir danî erdê û gotê:

— De bime e here. Oxir be ji te re.

Lê Mîr birîndar e û nikare bime e, got:

— Ez hinekî qerimî me. Tu vegere bi riya xwe ve here, pi tre ez ê herim.

— Na. Gereke tu herî, pi tre ez ê ji vir vegerim.

Mîr Mihemed me iya, lê dikuliya û nikaribû here. Teyrê bakirê, got:

— Wer, wer.

Mîr Mihemed vegeriya hate ba teyrê. Teyrê ew go tê ku Mîr ji ranê xwe kiribû û avêtibû devê wê, ji binê zimanê xwe derxist û pê ve danî, tûka xwe tê da û bi hevûdu ve keliya, weke berê sax bû. Mîr û Teyrê careke din xatir ji hevûdu xwestin, Mîr me iya û çû ku here ba birayên xwe, Teyrê jî bi ûnde vegeriya û çû ba çêçikên xwe.

Mîr Mihemed çû giha bajêr, lê nerî ku dawet, lîlandin, tembûr, def, zirne, heytûhût û î e. Çû mala pîrekê, pîrsî:

— Pîrê. Gidîkê, ev xêr e, çi mesele ye, çi borîn e tê?

Pîrê got:

— Lawo, wele te dît me nedîtiye, lê dibêjin: Berî heft salan sê birayên hevûdu hebûne. Du bira bi birayê xwe yê piçûk re xayîn ketine û niha yek dike ku jina wî mar bike. Îcar ev çel roj û çel ev in ku def û zirne ye, keçik jî di hidur de rûni tiye û rahi tiye û a jehriyê, dibêje: Hema hûn nêzîkê min bibin, ez ê vexwim û xwe bikujin. Ji keçikê re go t dibin naxwe, jê re mergê dibin naxwe, jê re çi dibin jî naxwe.

— Pîrê. Ka tu jî mergakê, xwarinekê jê re bibe, hema belkî bixwe.

— Lawo, xwarin ji destên kesî nagire, îcar wê ji destên min bigire?

— Pîrê rabe pelûrekê [Pelor] çêbike û here cem, bi dizî di guhên wê de bêje: Tu bi hesreta wiyê dûr kî ku nêz bûye vê pelorê bixwe, wê ji destên te bigire. Îcar gava ku girt, bi dizîka bêjê: Destê xwe li navê bigerrîne. Hingê wê fam bike, îcar î ê te jê tune.

Pîrê rabû pelûr çêkir. Mîr Mihemed ew hingulîska ku keçikê di binê bîrê de xistibû tiliya wî, ji tiliya xwe derxist û xiste nava pelûrê. Gava Pîrê ew pelûr bire ba bûkê, xelkê henek pê kir û her kes pê keniya. Werhasil Pîrê çû xwe gihande cem wê û gotê:

— Ha vê pelûrê bixwe.

Bûkê hema û a jehriyê bire ber devê xwe û got:

— Pîrê. Nêzî min nebe, ez ê xwe bikujim ha!

Pîrê got:

— Keça min. Tu bi hesreta wî yê ku dûr bû, niha jî nêz bûye, tu vê pelûrê bixwe. Lê pê î tiliya xwe li navê bigerrîne, hêj bixwe.

Gulîzarê fam kir ku ti tek tê de heye û sêniya pelûrê ji destên pîrê gir, tiliya xwe li nava pelûrê gerrand, ti tekî ji navê derxist û alast, lê nerî ku ew hingulîska di binê bîrê de gava ku dabû Mîr Mihemed bi xwe ye û got:

— Wey gidîî! Dayê Pîrê, ka xwediyê vê hingulîskê li kur e?

Pîrê got:

— Wa li mala min e.

Bûkê ew jar venexwar (û got ku bila xelk belav bibe, ez jahrê venaxwim. Gava xelk belavbû, hema) Mîr Mihemed jî rabû ûrê Kalo hilda û çû kete nava wan, ew hemû taromaro kirin û ku tin. Pi tre daweta xwe û Gulîzarê ji nû ve kir, herdu bi hev re zewicîn û bi mirazê xwe a bûn.

**Berhevkar: Rukiye ZC**

**Gelêri**

## 8. ÇÎROKA HE TEMÎN

Pa ek sê kure vî heye. Kure vî mezin nave vî Bozo ye, ya din nave vî Ozo ye, evî herî piçûk nave vî Mîrza Mihemed e. Digo naw van da Mîrza Mihemed jêhatî buye. Gava biçuna nêçîrê Mîrza Mihemed nêçîra rind fikir, birayên din neyrebûn xwe nedidan zorê. Digo pa e jî guhe vî ser Mîrza Mihemed buye. Evana jî lê dinêrin pa e zef Mîrza Mihemed hezdike dexesî vî dikin. Odeka pa e hebuye dere vî jî hemêsa girtî buye. Axte zemanê pa êda dile pa ê ketîye qîzekê, xwestîye keçik nedane vî. Pa e ancax fotoxrafe vî daye çêkirin camekan kiriye anîye odêda dardakiriye dere odê jî kilîtikiye. Rojekê Mîrza Mihemed pey dide bavê xwe dêje bavo ev odame çima dere vî kilîtikiye? Bav dêje lavo bo bide. Dike nake yaxa xwe Mîrza Mihemed xelas nake jê jî hezdike bêfikra vî jî nake. Mîrza Mihemed dêje te vê derî min bidî vekirinê, ez ê bibinim. Dêçe derî vedike fotoxafê dîwarda dibine. Pa e çav fotoxafê dikeve off dik îne. Mîrza Mihemed dêje bavo xêre te çima ev of a ki and? Bav dêje hiç nepirse kurê min. Mîrza Mihemed dêje na îlla te mena vî minra bêjî, çima ev of a te da ki andinê. Pa e yaxa xwe kure xwe xelas nake dêje kure min axte tu dipirsî eze bejim lê tu kesîra nebêje. Bav dêje min gençîya xwe da ev keçika hezkiriye lê nedane min. Eskere bavê vî zefun ancax min eva fotoxrafa daye çêkirin. Mîrza Mihemed dêje tamam. Rojekê gazî birayê xwe dike van ra dêje kuro hal mede bavê me eve. Orê em ê herin vê keçikê bavê xwe ra bînin. Birayên vî dêjen ka em dikarin keçikê bînin? Mîrza Mihemed dêje eme bikarin bînin. Mîrza Mihemed rojekê kilîtê bavê xwe distîne derî vedike birayê xwe jî dibe vê fotoxafê vana jî nî andide. Dêje keçik eva ye. Em ê hînbikin keçik çîye çî nîne, kêderê ye. Dêjin tamam. Rojekê bavê xwa ra dêjin bavo bire xatire xwedê qîza te lê hezkiriye li kêderê ye? Bav dêje kuremin qe behs neke îda vegere bo bide. Mîrza Mihemed dêje na te îlla minra bêjî, te minra kiriye meraq, derdekê, nexa îya min lê çêbuye. Bav dêje kurem eva îmkana xwedê tine çiqas esker, le ker lê da qirê tu fayda lê nedît bo bide. Mîrza qebul nake dêje te îlla minra bêjî. Kurem dêje eva dêwe re heye, dêwe sor heye, dêwe spî heye. Sê dêw ser rêne, ne gulle pê dikare ne ti te pê dikare. Min çiqas esker lê da qirînê nebu. Heralde dêje eva sêhrane. Mîrza Mihemed dêje tamam. Mîrza Mihemed radibe diçe cem birayê xwe evan hevdi di êrin dêjin em çî bikin? Bira dêjin em herin. Evan radibin karê xwe dikin, hespe xwe sîyardibin rê dikevin. Evan tîn ser rêkê lê dinêrin rê dibe sê rêya. Hersêk ber disekinîn dêjin sê rê hene, bira Bozo rêya mezinda here,

Ozo rêya ortê da here, Mîrza Mihemed jî rêya piçûk da here. Dêjin tamam. Mîrza Mihemed dêje yalnız eme gustîle xwe tixne bin vî zindare orta her sê rêya da. Kî hatiye yê bine vî zindarê binêre kî hatiye kî nehatiye, dêjin tamam. Hersêk hevdi diqetin diçin. Bira evana rêya xwe devam bikin herin, em Mîrza Mihemed xebêrdin. Mîrza Mihemed qederekê diçe lê dinêre kaleke reben, çîl qerqa ser rê ye. Kale belengaz xwe ra ser deve rê kolikek çêkiriye nale nale kalê ye. Selam eleykim, eleykim selam kurem. Dêje te xêre, te ku da herî? Mîrza Mihemed dêje eze herim Belqizê bavê xwe ra bînim. Kalê a dimine. Dêje kurem lavo tu cinnî buyî, tu har buyî, tu nehe î buyî? Emrem hate he tê salî ez li ser rêya Belqizê me, eva rêya hate nehatiye, kê çuye nezivirîye. Mîrza Mihemed dêje çî bibe bira bibe ez ê herim. Kurem dêje madem te herî tu emanete xwedêyî, valle î e te zore. Eva rêya, rêya hate nehatiye, kê çuye yek nehatiye. Mîrza Mihemed dêje valle de bavo minra dia bike. Mêrike kal dêje ez vê temê jî bidim te. Zamanek tê, te Belqiz bavê xwe ra hilda anî lê gotî tu Belqizê min ni an bîdi, tu kefene min jî bîni tu min vir da defên biki. Ez isa diayê xwedê dixazim, ez Belqizê bibînim xwedê jî emanetem hilde. Mîrza Mihemed dêje serçavêmin. Mîrza Mihemed hespe xwe sîyardibe rê dikeve. Bere xwe dide vî kesenî lê dinêre erdeke re , bircaka re , avaka re . Hespe xwe peyadibe diçe ser kanîyê, ser çavê xwe di o pe kek ava xwe dixwe, dejmêj digre du rikat sinnet dike vedileze paldide. Jina dêw lê dinêre ser kanîyê benî însanek paldide. Dêje vallehî xwedê ev ecele vî hatiye, dêw niha lê bihese pirtike vî mezin guhe vî bimine. Radibe jê ra hinek xwarin hazirdike, hinek pere dide ser sênîyê hildide dibe. Lê dinêre paldayî ye pa va pîye xwe penîya Mîrza Mihemed dixwe. Mîrza Mihemed radibe ser xwe. Jinik dêje tu birçîyî eva ji te re xwarin, xerçlixê te tineye ji te ra xerçlik, van hilde here, niha mêremin orê te bihese pirtiketeyî mezin guhe te bimine. Mîrza Mihemed dêje tu eskî etek nebiyayî mine ji tera ti tek bigota lê tu jinî ez te ra ti tekê nabêjim, ez sa mêtê te hatim. Jinik dêje tu sa qetla xwe hatiyî. Mîrza Mihemed radibe lê dinêre pi tî esrê toz duman erd û ezmana ketîye lîva lîva dêye re e. Tê nêzîkê bircê dibe. Mîrza Mihemed dibine dêje ez li esmin geriyam têjke misilmana min tu erdê dîtî ez daha te berdidim. Mîrza Mihemed lê dinêre du heb bele a a a ser mile vî ye. Dêw dêje doramine yan dora te ye? Mîrza Mihemed dêje berêda malame dor daye kafira bira dora te be. Eva her du bela a a a davije erdê toz duman serdikeve. Eva dêje însan îre xam mêtîye, pirtikek nema min ber diranê xwe ra

bikira bira jana dilemin danîya. Mîrza Mihemed nawa toz dumanê derdikeve xwe dad îne, e eda xwe dîne, dêje kafir dora te ye dora mîne? Dêw dêje vallehî dora te ye. Cem Mîrza Mihemed tîrkevan û ûr hebîye. Eva ça tîrkevanê davîje dêw, dêw difire erdê dikeve. Mîrza Mihemed xwe digihînê pê ûra xwe dêw qet qetî dike vî dikûje. Jina dêw direve tê. Jina dêw jî misilmanye. Tê neyse evî hildide dibe malê nane vî dide, kince vî dide u tinê. Dêje te mêre min kû t te îda min jî xwe ra bibi. Mîrza Mihemed dêje na ertemin hene. Jinik dêje erte te çi ne? Dêje ez ê herim Belqizê bînim. Jinik dêje tu cinnîyî, tu har buyî, kê dikare here Belqizê? Dêwe sor pî ya te ye, dêwe spî pî ya te ye. Eva ya re e. Mîrza Mihemed dêje ez hatime yan evana min bikûjin yan jî ez vana bikûjim. Mîrza Mihemed dêje eva yê mezine an yê piçuke? Jinik dêje eva ya herî mezine, yê sor yê ortê ye, yê spî jî birayên piçûke. Mîrza Mihemed dêje ez jî van digirim. Sibê zu radibe hespe xwe sîyar dibe bere xwe dide Belqizê. Diçe lê dinêre erdekê sor, birceka sor, avaka sore. Hespe xwe peya dibe diçe ser kanîyê, ser çavê xwe di o, ava xwe dixwe, dejmêj digre du rikat sinnet dike vedikeve paldide. Jina dêw lê dinêre benî însanek ser kanîyê paldide. Dêje vallehî eva a buye, eva ça ser dêwe re da derbazbuye hatîye vir, ev çi qaydî hatîye dêwe re pê nehesîya ye? Eva radibe jê ra xwarin çêdike dide ser sênîyê, hinek jî pere dide ser diçe hinda vî. Lê dinêre eva pal dide. Pa va pîye xwe panîya vî dixwe. Mîrza Mihemed radibe ser xwe. Jinik dêje bira tu tî yî yan birçî yî, eva tera non eva jî tera xerçlik rêkeve here hê mêmêmin nehatîye te nehesîya ye. Dêje te bihese pirtikete yî mezin guhe te bimine. Mîrza Mihemed dêje tu eskî etek nebiyayî mine ji tera ti tek bigota lê tu jinî ez te ra ti tekê nabêjim, ez sa mêmê te hatime, pi ta xwe dide jinikê diçe. Ser esrê lê dinêre lîve lîv ketîye van bestana, xure xure, qîre qîre. Sere xwe bilind dike lê dinêre dêwe sor du heb dara spingdarê daye ser mile xwe qîra qîra vî ye tê. Dêw çav Mîrza Mihemed dikeve dêje he hey tijke misilmana min tu esmîn gerîya min tu erdê dîtî, çend sale diranê min sa pirtike go te misilmana dixure. Dêje ka dora min e yan dora te ye? Mîrza Mihemed dêje berî dora te ye. Dêw her du dare spingdarê davîje. Toz duman serdikeve. Mîrza Mihemed radibe xwe dad îne, dêje kafir dora min e yan dora te ye? Dêw dêje vê carê dora te ye. Mîrza Mihemed tîrkevanekê davîje dêw dikeve erdê, pê ûra xwe dêw qet qetî dike. Eva radibe jina dêw tê Mîrza Mihemed hildide dibe malê. Êvarê jinik nivîne xwe vî va tev dadine. Mîrza Mihemed ure xwe dadine ortê dêje ertekê min heye, heta ertê xwe nînim



yêrê ez nikarim ti tekê bêjim. Jinik ra dêje tu jina dêwe piçûkî? Jinik dêje na ez jina yê ortê me. Mîrza Mihemed dêje axte ez zivîrîm ez ve gi ka temîz bikim xwe ra bibim. Jinik dêje te niha ku da herî? Dêje eze herim Belqizê. Jinik dêje tu harî, tu cinnîyî, dêwe spî du serî ye jere tu pê nikarî. Mîrza Mihemed dêje xwedê firsat daye min ez ê vî bikûjim. Jinik dêje eze temekê bidim te tema min rind guhe xwe bide. Dêje dêwe spî du serî ye, ney ney tu berî serê mezin dixî, berî sere piçûk jêke heta sere mezin hereket bike tune vî jî bikûjî, xwe a neke ev benzemî î dêwe din nabe. Mîrza Mihemed dêje tamam radibe hespe xwe sîyar dibe bere xwe dide memlekete dêwe spî. Lê dinêre erdeke çîl qerka , xwelîya vî, ava vî, gi k spîye. Hespe xwe peya dibe diçe ser kanîyê ser çave xwe di o, ava xwe dixwe, dejmêja xwe digre du rikat sinnet dike xwe ra radikeve pal dide. Jina dêw lê dinêre benî însanek ser kanîyêye. Dêje eva a buye dêw niha lê bihese ye vî parçe parçe bike. Jinik radibe jira non hazir dike hinek pere dîne dide ser sênîyê diçe hinda vî. Lê dênire pal dide. Pa va pîye xwe panîya vî dixê vî he yar dike. Dêje rabe nane xwe bixwe, xerçlixê xwe hilde here. Mère min te bihese ye te parçe parçe bike. Mîrza Mihemed dêje tu eskî etek nebiyayî mine ji tera ti tek bigota lê tu jinî ez te ra ti tekê nabêjim, ez sa mêrê te hatim. Jinik dêje mère min benzemî î dêwê din nabe, yê te parçe parçe bike, eva du seriye tu pê nikarî. Mîrza Mihemed dêje li çi jinik çi dêji çi bikim? Jinik dêje vare eze te ve êrim. Eva dêje te mîn ku da ve êrî? Jinik dêje dêw palnede tu lînexî akî din tu nikarî vî bikujî. Mîrza Mihemed gotina jinikê dike, dide pey diçe. Jinik vî dibe malê qutîka vî heye bin mala van da dibe Mîrza Mihemed dixê qutyê vir da ved êre. Dibe êvar dêwe spî tê, ber derî nakeve hindir. Dêje bihna tijke misilmana tê. Jinik dêje du heb birayê te hene kê dikare ser vanra derbasbibe? Dêw derbasî hindir dibe, jinik nane vî dide pa ê radibe xure xur dike pal dide. Mîrza Mihemed cihe xwe ve artîye derdikeve ura xwe hildide dêje ya allah ya xwedê sere piçûk jêdike. Heta sere mezin radibe ser xwe lê dixê vî jî parçe parçe dike. Eva xwînêda dimîne. Jinik kince vî di o, ev roj dibe mêvane jinikê. Jinik dêje te evana ku tin em ê niha ça bibin? Mîrza Mihemed dêje ertemin heye ez vê erte xwe bînim yêrê ez ê ve gi ka bibim. Dêje em jî sê birane. Tu jina dêwyê piçûkî eze te xwera hildim, jina dêwe ortê birayê xwe ortê ra hildim, jina dêwe mezin jî birayê xwe mezinra hildim. Jinik dêje soz didî? Eva dêje soz. Jinik dêje define me, xezine me hene. Mîrza Mihemed dêje î e me define, xezina neketîye, heçîye me biriye heçîye me hê tîye. Jinik dêje te niha

ku da herî? Dêje ez ê herim Belqizê. Jinik dêje tu dînî, tu çi dikî? Dêje xwedê xwedêkim heçîye çûne Belqizê yek ne hatiye, kê diçe dibe kevir eva sêrane tu nikaî. Mîrza Mihemed dêje sera vî çîye? Jinik dêje te niha herî çemeke derkeve pi ya te, ava vî çemî kê m û xwîne tu dile xwe hevne hinek ava vî bixwe te bêji elhamdilillah çox i kir eva aveka ça xwe e eva çema rê bide te, tu ne derbas bibi, eva yek. Dêje te herî deveka tî, gureka birçî ye. Ber deve pezek heye, ber gur jî av heye. Te pez hildî bidî pê iya gur, te avê jî hildi bidî pê iya devê, ev jî rêya te derbas dike. Pi tî vî heft dergê girtî, heft dergê vekirî hene. Te derge girtî vekî, yên vekirî jî bigrî, ev jî rê bide te derbas bibi. Te herî kanîke derkeve pi ya te. Here ser kanîyê namekê binivîse bavîje kanîyê. Sed heb carîye Belqizê hene, carîye werin ser kanîyê vî nameyi hildin bibin bidin Belqizê. Belqize gazî te bike, ye bêje can ha can. Evî go can te bêjî kule can, ney ney tu dêji can. Gava te got can te bibi kevir. Dêje dixuna Belqizê çil gillêne te sih û neha vekî, yeke bimine. Gava te eva jî vekir te dîsa bibî kevir. Te çar cara Belqizê paç bikî, carek çenêda, carek netiqêda yek jî her surete vî de. Çar heb xale tikevîn cihe te paçkiriye. Tu ancax vî qaydê bikarî Beqizê bînî, van gotinemin bîraneke. Mîrza Mihemed sibê radîbe hespe xwe sîyar dibe rê dikeve. Diçe diçe tê ser çem, lê dinêre ava çem tim kê m u xwîne. Peya dibe diçe ser çave xwe di o kulmek av hildide dixwe dêje elhamdilillah çox i kir ça avaka xwe e. Çem rê dide derbas dibe. Tê lê dinêre dekek gurekêva ye, her du girêdayêne. Ber devê pez heye, ber gur jî av heye. Hildide pez dide ber gur, avê jî dide ber devê, evana jî rê didinê derbas dibe. Tê dinêre heft derî girtîne, heft derî vekirîne. Derîyê girtî vedike, yê vekirî jî digre, vê jî derbas dibe. Diçe ser kanîyê namekê dinivîse davîje avê. Cariye tèn vê namê hildidin dibin didin Belqizê. Belqiz xwe êst qelemê dinex îne sere xwe pencerê da derdixe. Eva ça çav Belqizê dikeve xwe diçe. Axtekê ser xwe da tê Belqiz gazî dike dêje can Mîrza Mihemed ser çavêminra hatî. Mîrza Mihemed dêje vay kul can ka heyranete? Dêje zingînî ket van çîyana, ev kevre van bestena gi k bune însan herek cihekêde çu. Gazî carîye xwe dike dêje herin vê mervê min ra bînin. Mîrza Mihemed tê ev ev dibe mêvane Belqizê. Axte Belqiz paldide radibe çil gillêda sih û nehê vedike yekî dihêle, pa ê diçe çar cara Belqizê paç dike, cihe paç dike xal dikevinê. Belqiz sibê radibe lê dinire sêhra vî çuye, îda nahêle carîye ser van da bènê. Tê Mîrza Mihemed ra dêje çarekê bike, gotî tu îdî min li vir bibî, tu min nebî yê te bikujin. Mîrza Mihemed dêje tamam ez jî zaten hatime te bibim. Evana

